Arşîva Bîra Kurdan: Ji Roland-Pierre Paringaux: "Di navbera Iraq û Îranê de heştsed hezar rehîne" ('89) û ji Kendal Nezan: "Êrîşa bêperwa ya li ser Kurdistanê" ('95) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Adar 2012 - Hejmar 28 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Laurent Carroué
Çîn çawa bû hêza yekemîn ya endustrîyel a cîhanê û dawî li hegemonîya amerîkî ya sedsalî anî? Brezîlya çawa bû hêza aborî ya şeşemîn a dinyayê û welatek wek Fransa li dû xwe hişt?
▶ R. 6

Jean-Arnault Dérens
Xirwatistana ku dê di 1ê tîrmeha 2013ê de bibe endama bîst û heştê ya Yekîtîya Ewropî çima ewqas bêşewq û bêperoş e? Perspektîfa ewropî çima li welatên Balkan cazîbeya xwe wenda dike?
▶ R. 14

Michael Klare
Dewletên Yekgirtî bi pirsgirêkên wek sekna aborîyê, nepixîna deynên neteweyî, gefên Îran, Koreya Bakur û Çînê ve mijûl e. Li hember van xetereyan stratejîya nû ya Pentagonê çi ye?
▶ R. 18

Michel Imbert
Li hember seranserî cîhanê berbelavbûna film û malên çînî, li ser wêjeya çînî zêde tişt nayên zanîn. Koreografîyên şer yên Bruce Lee û Jacky Chan gelekî tesîr li sînemaya rojavayî kirin…
▶ R. 19

Gary Sick
Heger şerek li dij Îranê rû bide, dê herkes wenda bike û di siberojê de dê ji bo hemû cîhanê berdêlên qirase yên siyasî, aborî û stratejîk biafirîne ku pêşîlêgirtina wan ne mumkin be…
▶ R. 20

ETNÎSÎTE Û ŞOREŞ

Helwêsta kurdan û şoreşgerîya li Sûrîyeyê

PROF. DR. FERHAD ÎBRAHÎM *

Kurtedema berîya mirina xwe, nêrîna serekê Tevgera Dahatû ya Kurd **Mîşel Temo** (Mash´al Tamo) ew bû ku her çiqas ew xwe ji alîyê siyasî ve baş bi rêxistin kirine jî, lê dîsa di serhildana Suriyeyê de li gor rewşa pêwîst, têrker, cîyê xwe nestandine, sedem jî; ji ber ku rejîma **Beşar Esad** di çarçîta stratejîya xwe ya zeximbar de "jîrane livîyaye" û partîyên kurd jî biryardar ne ji bo serhildanê bûne. (1) Vê rewşê heta roja me jî hema bêje xwe neguhertiye. Tiştê zelal ew e ku partîyên kurd wê hîsê didin ku ew ji bo hemû alîyan vekirî ne. Dibe ku sê sedemên vê yekê hebin: nezelalîya gelo dê di dawîya vê krîzê de çi bibe, bêtewanbarîya muxalefetê di derbarê ronkirina armancên zelal de ji bo serhildanê û neyekbûna partîyên kurd hema bêje di hemû pirsên girîng de. Etnîze û ayînzayîkirina arîşeyê, dîmeneke din e ku hêmanên siyaseta Suriyeyê tevlîhev kiriye. Kurd ne bi tenê etnîsîteyek in ku daxwazan pêşberîyê girsejimara ereban dikin. Kurd komek in ku dikarin gelek koman pêk bînin.

Etnîsîte û ayînzayî wek alavên siyasî li Rojhilatê Navîn ne nû ne. Li Suriyeyê jî wek li Iraqê bijarteyên desthilatdar ayînzayî û etnîsiteyê ji gengeşîya siyasî qewitandine. Lê îronî ew e ku ayînzayî di her du dewletan de jî bingeha zexmîya desthilatdarîyê bû.

Sê sal berîya şerê navxweyî li Libnanê, zanayê siyasî yê amerîkî-libnanî **Iliya Harik** bal kişandibû ser etnîzekirina pêvajoyên civakî û siyasî yên li Rojhilatê Navîn. (2) Di demekê de ku projeyên geşepêdanê yên mezin (sosyalîzma ereb û yekîtîya ereb) têk çûbûn, wî çavnêrîya paşvegera nasname û wefadarîyên piçûk dikir. Vê meylê hertim xwe bi pêş ve bir. Rejîmên zordar li Sûrîyeyê û Iraqê, li Behreyn, Yemen û hema bêje li hemû Rojhilatê Navîn xwe berdidin ser nasnameyên etnîk, ayînzayî û herêmî. Dîsa îronî ew e ku hemû jî, xwe ber bi der ve bi gelek alavên nasnameyî rewadar dibînin (Îslam, erebîtî, pêşketî û şoreş). Helbet zordarî bi ayînzayî û etnîsite ne heman tişt e. Lê ev nasname dikarin zordaran xurt bikin. Ji xwe şerê navxweyî li Libnanê (1975-1990) û serhildana niha ya ereb şanî didin ku etnîsîte û ayînzayî guhêrbarîyeke demokratîk dixin zehmetîyê.

Di dijberîya îro de hêmanên etnîk, ayînzayî, herêmî û navneteweyî xwe zêde dikin. Îro hîn bêtir tê xuya kirin ku avahîyên etnîk-ayînzayî yên li Sûrîyeyê, cuda ji welatên yekxudayî wek Misir, Tûnis û beşekî Lîbyayê, serfirazîya tevgera têkoşer dixin zehmetîyê.

Rewşa di bûyera Sûrîyeyê de xuya dibe ew e ku gelek aktor, berîya hemûyan rejîma **Beşar Esad** bi xwe, ayînzayî kiribû mijar û ev yek demeke gelek dirêj berîya dîyarbûna etnîk û ayînzayîkirin bibe heyameke hevgir a tevgera têkoşîner. Bi dirûşma *"wahid, wahid, wahid, Sûrîye wahid"* (yek, yek, yek, Suriyeya yek) dijberan dîtina xwe li ser yekîtîya gel îfade dikir.

Beşar Esed hindikahîyan bi hatina Birayên Misilman ditirsîne

Beşar Esad hîn di her du axaftinên xwe yên li pêşîya Meclîsa Gel a bihara 2011ê de hewl dida ku xetera ayînzayî bike stratejîyeke giring a parastina civakî. Wî û medyayên wî yên ragihandinê herdem têgeha ayînzayî bi kar dianîn ku ji alîyekî ve tevgera têkoşîner reş bikin û ji alîyê din jî hindikahîyên etnîk û ayînzayî bi rejîmê ve girê bidin. Ji ber ku ayînzayî ûyd. bi nêrîna hindikahîyên sûriyeyî bi wê dîtinê ve girêdayî ye

▶ R. 3

Ayub Raoof Mahmood: **Bênav 11**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, (Detay)

Pirsa kurdî û raperîna sîvîl

VAHAP COŞKUN *

"Bikarneanîna şidetê hîma bingehîn a bawerîya min e. Ew herweha hîma dawîn a îtîqada min e jî."
Mahatma Gandhi

Dema ku em behsa meseleya kurdî dikin, em behsa arîşeyeke weha tevlihev dikin, ku xwedî dîrokeke dirêj e û gelek alîyên wê yên civakî, aborî û çandî hene. Mesele, xwedî paşxaneyeke dîrokî û struktureke weha ye ku bandorê li ser gelek enîyên jîyanê dike. Ji ber vê yekê çaresernekirina meseleya kurdî dibe sedema encamên gelek giran. Ev encam dikarin, li jêr sê serenavan werin kom kirin:

Encama yekem, rûxandina manewî ye

Mirina ciwanan, ku dilê mirov pê dişewite, dibin sedem ku him di raya giştî ya tirkan û him jî di ya kurdan de siyaseta neteweperestîyê pîj bibe. Ji ber ku xwîn dirijê, nasnameyên civakî tên dijberî hev. Xelk -bi darê zorê û bi rêbazên bêrehm- ji cih û warên xwe hatin rakirin û naçar man ku koçî varoşên bajarên mezin bikin, ku lê bûne mehkûmên jîyaneke weha ku tê de nikarin hewcedarîyên bingehîn ên mirovatî yê bi dest bixin. Ji alîyekî ve, ev yek navbera koçber û niştecihên wan deran ku ew lê bi cih, dibe sedema pevçûnan û ji alîyê din de jî bawerîyên mirovan a ji bo sîstemê tê keritandin. Ev wêrankirina manewî, li cem her du alîyan neteweperestîyê tûjtir dike û peywendîyên civakî, ku pê mirov dikarin bi hev re bijîn, qels dike.

Encama duyem, peydabûna neheqî û derhuqûqîyê ye

Peydabûna derhuqûqîyê xwe weha nîşan dide:

a.Çêkirina "qanûnên" weha ku bi maf û azadîyên mirovan re bi hev nakin, wan didin rawestandin, yan jî bikaranîna wan nemumkin dikin.

b.Bi gelemperî, ewên ku hêza dewletê bi kar tînin -nemaze leşker û polîs- tên parastin û çalakîyên wan ên derhuqûqê li derveyî çavdêrîyê tên hiştin.

c. Carna jî, ewên ku hewlê didin û dixwazin qaîdeyên huqûqa navneteweyî bisepînin, bi xwe zirarê dibînin.

Bi vî awayî qadên azadîyan tên teng kirin, derfetên gotûbêjkirina demokratîk tên asê kirin û pergala huqûqî di warê çareserkirina pirsgirêkan de qels dimîne. Encama wê ya axir jî ew e ku meseleya kurdî her ku diçe dikeve rewşeke girantir.

Encama sêyem rûxîna maddî ye

Ji ber ku meseleya kurdî nagihîje çareserîyeke demokratîk, pareke girîng a çavkanîyên aborî yên welêt tarûmar dibin. Serdemên berê li alîyekî, herkes pê dizane ka di domahîya sî salên bi şer û pevçûn de barekî çiqas giran li ser şanên aborîya welêt de hat kirin. Lê belê, meblaxên ku tên bi lêv kirin -ji 400 mîlyon dolaran heta 1 mîlyar dolaran- dide xuya kirin ku ev mesele di rêjeyeke gelek girîng de çavkanîyên welêt dadiqurtîne û pêşî li pêşketina aborî û seqemgîrîyê digire.

Bi kurtasî, meseleya kurdî him çavkanîyên însanî, him jî yên aborî yên welêt berhewa dike, dibe sedema derengketina pêşdeçûyîna demokrasîyê û aştîya civakî namumkin dike. Yek ji sedemên sereke, ku pirsgirêk weha mezin dibe, encamên weha giran tîne û her ku diçe çareserî dijwartir dibe, bikaranîna şidetê ye.

Şidet divê bi du alîyan were fikirîn. Yek, şideta ku dewlet bi kar tîne. Komara Tirkîyeyê, ji rabûrdûyê heta îro, di şûna bersivdana daxwazên kurdan a bi rê û rêbazên demokratîk û sîyasî de hertim rêya tepisandina bi şidetê hilbijart. Helbet, wê carna serî li tedbîrên siyasî û aborî jî da, lê belê pêşekî hertim di bin navê "tedbîrên ewlekarîyê" de ji şidetê re hat dayîn û li ser navê "parastina yekitî û yekparebûna welêt" ev şidet biheq hat nîşan dan. Ya din jî, şideta PKKê ye. PKKê şidet ku wekî "şideta şoreşger" biheq nîşan dide, him li dij

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

EDITO

Cezanebirîna li Suûdîyê

SERGE HALIMI

Rêzgirtina mafên mirovan li Erebistana Suûdîyê ji rêzgirtina mafên mirovan a li Îranê ne baştir e. DYA bi qasî ku ji ti dewleteke din nakire, ji vê dewleta hevalbend petrolê dikire, gelo dibe ku ev yek sedema sereke ye ku qralîyeta wahabî, bi awayekî ecêb, ji ber binpêkirinên mafên mirovan pêrgî nerazîbûnên "civata navneteweyî" nayê. Erebistana Suûdîyê li gor kêfa xwe dikare dest werde Bahreynê, li wê derê xwepêşandaneke demokratîk biperçiqîne, şêst û şeş kesan di 2011ê de înfaz bike (yek ji xwepêşanderên jin bi "sihêrbazîyê" hat sûcbar kirin), bi heman cezakirinê li blogvanekî înternetê yê ku li ser hesabê xwe yê Twitterê dîyalogeke xeyalî li gel Pêxember belav kiriye, gefan bixwe, dikare cezayê destjêkirinê bide dizan û destdirêjî, zina, cinshezî, bazirganîya narkotîkê û olguhertinê bi îdamê ceza bike, bêyî ku, ji bilî Komîserîya Bilind a NY a mafên mirovan, ti kes, an jî hema hema ti kes li himberî van pêkanînên wê ti nerazîbûnekê nîşan bide. Ne Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî, ne G20 ku Erebistana Suûdîyê jî endameke wê ye, ne jî Fona Diravî ya Navneteweyî ku midûrîyeta wê berî demeke nêz rêzdarîya xwe nîşan da ji bo *"rola girîng"* a ku Riyadê di warê aramkirina aborîya cîhanê de bi cih anîye.

Heman qralîyet ji ya xwe qet nayê xwar û li jinan –ku nikarin bêyî mêrê xwe, an jî şofêrê xwe bi erebeyê bigerin– qedexe dike ku tevlî Lîstikên Olîmpîk bibin? Ev binpêkirina dawîyê ya herî hindik a du xalên Peymana Werzişî (1) jî rastî nerazîbûnên zêde nehat. Ferz bikin ku Îran ji ber sûcekî weke apartheida cinsî sûcdar hatiba dîtin, kampanyayeke navneteweyî ya şermezarkirinê wê ji zû ve hatiba dest pê kirin û hê kampanyayek xilas nebûya, wê yeke din li şûna wê cih bigirta.

Ev muameleya erênî ya hertimî ya beramberî qralîyeta wahabî berî demeke nêz bi daxuyanîyên serokwezîrê tûnisî, Hammadî Al-Jebalî gihîşt asteke nû. Ev kesayetê tevgera ku bi awayekî hovane ji alîyê Zeynel Abidîn ve hatibû perçiqandin, ango Hammadî El Jebalî di serdanên xwe yên pêşî yên ji bo welatên din, pir pesnê mazûvanên xwe yên suûdî da. Halbû ku Riyada ku heta dawîyê destek da qebîleya Ben Alî, niha qebûl nake ku wî dersînor bike û dibe stargehek ji bo serweta wî ya heram. Pereyê welatên Kendavê jî bi xwedîkirina kanalên televizyonê yên ku li welêt propagandaya îslama wan a aîdî çerxa navîn dibe sedemê gurkirina provokasyonên selefîstên tunusî.

Di çileya 2008ê de, serokkomarê fransî Nicolas Sarkozy îdia dikir ku, *"bi pêşengîya hezretê qral Abdullah"*, Erebistana Suûdîyê, *"siyaseteke şaristanîyê"*, bi pêş dixist. Piştî çar salan, ev welatê ku lê gendelî bûye desthilatdar, li cîhana erebî bûye mîna hestîyê piştê yê sunîtîya kevneperest. Riyada ku pêşî li himberî jitextketina zordarên tûnisî û misirî bi ferhê ket, berî demeke nêz mafê gelan keşf kir da ku berê wan bide ser rejîmên "radîkal", an jî şiî yên ku li herêmê dijberîya wê dikin. Qralîyetê weke ku bi xwe dabe bawer kirin ku ji ber parvekirina beşek petrola xwe li civakê, ji ber ku sunî, şiîyên li rojhilatê welêt yên ku ji sedî 10 heta 20ê nifûsê pêk tînin, piçûk dibînin, şiî pir aciz û nerazî bûn û dîsa ji ber tirsa Îranê, ew ê nekeve ber pêlên tofan û serhildanên gelan. Îmtiyaza navneteweyî ya ku Qralîyeta Suûdîyê jê sûdê werdigire, mertaleke din jî dide destê wê.

1 Xala 4ê ya Peymana Olîmpîk a ferz dike ku "*her takekes divê bibe xwedî derfeta werzişkirinê bêyî ku rastî ti muameleyeke cihêkar were*". Xala 6ê jî dest nîşan dike ku "*li himberî kê dibe bila bibe, her cure cihêkarîya ku xwe dispêre palpiştên qewmî, olî, siyasî, cinsî, li dijî şertên tevlîbûna Tevgera Olîmpîk e*".

Wergera ji fransî: Baran Nebar



JI ÇAPEMENÎYÊ



Rewşa Sûrîyeyê û Tirkîye

Rojnameya brîtanî *Daily Telegraph* di 2ê adarê de li ser rewşa Sûrîyeyê nivîsî. Rojname dibêje *"Piştî serkeftina li Humusê, bi hezaran li ber bextê yekîneyên **Esad** hatin hiştin"* û rojname herweha fikaran radigihîne ku sîvîl dê ji alîyê rejîmê ve werin ceza kirin.

Di sernivîsa rojnameyê de herweha ev pirs jî tê kirin: *"Gelo Sûrîye dê bibe Bosnaya duyemîn?"* Nivîs weha berdewam dike: *"Rastîya tahl ew e ku Sûrîye niha, wekî li Bosnayê bûbû, li ber şerekî navxweyî yê demdirêj e ku alîgir çekan dişînin wê derê û cîhan jî bêyî tiştekî bike, lê temaşe dike. Lê belê hîna jî pir dereng nîne ku pêşî li karesatekê were girtin. Lê divê mirov rastbîn be. Heger em nikarin li dij **Esad** şer bikin -ku ev rê nayê hilbijartin- bi tenê yek tişt dimîne ku em dikarin bikin; şidet were kêm kirin û dawîya rejîmê zûtir were anîn. Ev yek jî bi riya vekirina rêyên alîkarîya mirovî û fişareke aborî pêkan e".*

Di derbarê helwêsta Rûsya û Çînê de jî rojname weha dinivîsîne: *"Rûsya û Çîn, ku di Konseyê de bi awayekî sosret biryara Sûrîyeyê veto kir, weha xuya ye ku poşman bûne. Niha ev herdu welat jî dixwazin ku Sûrîye bihêle ku berpirsîyarê alîkarîya însanî ya Neteweyên Yekgirtî bikaribe here wê derê. Heger Konsey niha biryareke destûrdayîna alîkarîya însanî bike, dikare Moskova û Pekîn jî piştgirîya wê biryarê bike".*

*"Her weha, fişara aborî dikare dijwartir bibe. Iraq û Lubnan dikarin li dij Sûrîyeyê ablukayekê bimeşînin. Hetta Tirkîye jî, ku hêjayî pesindayînê ye, dikare jê pirtir jî bike. Bi vî awayî zexta li ser **Esad** dê girantir be û zirar dê negihije asteke dijwartir. Lê belê xeterek heye ku trajedîya Bosnayê xwe li Sûrîyeyê dubare bike".*

Têkilîyên Tirkîye û Îranê

Di 14ê sibatê de rojnameya amerîkî *New York Times* gotarek li ser têkilîya Îran û Tirkîyeyê weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê Soner Cagaptay ve hatiye nivîsandin, ku li Washingtonê di Enstîtîya Siyaseta Rojhilatê Nêzîk de dixebite, bal li ser gefên Îranê yên Tirkîye tê kişandin. Cagaptay dinivîse ku herçend reqabeta navbera îranî û tirkan xwedî dîrokeke kevin be jî, têkilîya herdu welatan piştî deshilatdarîya AKPyê baştir bû û gelek berjewendîyên hevpar jî, an ku meseleya Filistînê, şerê hevbeş li dij gêrîlayên kurd, **PKK** û **PJAK**, pêş de çû. Herdu welatan bi tevkarî herêmên serhildêrên kurd bombebaran kirin.

Lê belê piştî bihara erebî rêyên du welatan careke din ji hev dûr ketin. Tirkîyeyê piştgirî da serhildanên ji bo demokrasîyê û Îran jî piştgirîya rejîma Esad dike. Nivîskar îdîa dike, ji ber ku Enqere piştgirî û çek dide muxalifên li Sûrîyeyê, Îran jî wekî bersiv piştgirîya PKKê dike. Herweha Îran piştgirîya partîya şiî ya li Iraqê an ku piştgirîya **al-Malikî** dike, Tirkîye jî piştgirîya partîya sekuler a **Allawî**. Di vê têkoşîna de Malikî an ku Îran bi ser ket û piştî hilbijartinên 2010ê hikûmeta Malikî hat ava kirin. Hevdem kurdên Iraqê jî li hember hikûmeta Malikî digel Tirkîyeyê re tevkarîyê dikin da ku pêşî li bandora Îranê ya li ser karên navxweyî yên Iraqê bigirin. Ji alîyê din de jî Tirkîye hişt ku li ser axên wê sîstema berevanîya mûşekan were saz kirin.

Gotar wekî din gefxwarina generalê îranî **Yahya Rahim Safavî** bi bîr tîne ku digot: *"Tirkîye divê bi giştî li ser siyaseta xwe ya Sûrîyeyê, mertala mûşekan a NATOyê û sekularîzma li cîhana erebî bifikire. Yan jî ew dê him ji gelê xwe, him jî ji cîranên xwe bela xwe bibîne".*

Gotar weha bi dawî dibe: *"Dibe ku Îran agresîftir bibe. Hin bispor îdîa dikin ku Hêzên Qudsê, ku hêzên taybet ên Pasdarên Îranê ne, digel PKKê nav têkilîyê de ne û ji Bakurê Iraqê him Tirkîye û him jî kurdên Iraqê ji xwe re dikin hedef".*

"Li Rojhilatê Navîn cih bi tenê, yan ji bo sultan, yan jî şah heye, ji bo herduyan nîne".

Li Tirkîyeyê têkoşîna navxweyî ya siyasî

Di 24ê sibatê de kovara Economist têkoşîna siyasî ya nav Tirkîyeyê ji xwe re kir mijar. Kovar dibêje serokwezîr **Erdoğan** him li nav, him jî li derveyî welêt bi neyarên nû re tê ber hev. Nivîs herweha dinivîsîne ku di 9 salên dawîyê de **Erdoğan** gelek serkeftin bi dest xistine, krîza aborî pir zirar nedaye welêt, herçend têkilîyên digel Yekîtîya Ewropî cemidîne jî, têkilîyên digel Amerîkayê, bi qewlê **Davutoğlu**, serdema xwe ya zêrîn dijî.

Ji alîyê din de jî *Economist* balê dikişîne ser têkoşîna deshilatdarîyê ya navbera serokwezîr **Erdoğan** û **Gülen** û dibêje hew ewqas jî çik sayî nîne. Gotar weha berdewam dike: *"Xwedê giravî alîgirên **Gülen** ketine nav dadwerî û polês û wan herweha MIT ji xwe re kiriye armanc. Dozgerê ku tê îdîa kirin ku alîgirê Gülen e, şêwirmendê MITê, ku di hîmayeya **Erdoğan** de ye, ji ber hevdîtinên digel PKK gazî kir ku were îfadeyê bide. Erdoğan jî wekî bersiv hema qanûnek derxist û hêz girt destê xwe ku ji bo darizandina endamên MITê divê serokwezîr destûrê bide. Wekî din endamên emnîyetê û dozgerê ku tev li lêpirsînê bûne, ji kar hatin dûr xistin."*

Lê belê *Economist* dibêje herçend **Erdoğan** di tûra pêşîn de bi ser ket jî, ev yek dikare li ser aqûbeta wî ya siyasî bandoreke mezin bike; ji ber ku alîgirên **Gülen** dikarin êdî nema deng bidin wî. Kovar herweha nexweşîya **Erdoğan** jî bi bîr tîne û dibêje xelefên pêkan ên **Erdoğan** derbasî alîyê **Gülen** dibin û li hev hatinek dê li gor berjewendîya her du alîyan bibe. Lê ev yek li gor hin kesan cudatîyên siyasî radixe ber çavan.

Kovar wekî din radigihîne ku serokwezîr ji destgirkirina wan rojnamegeran, ku rexne li **Gülen** digirin, fikaran dike, lê belê ew bi xwe jî xwedî sîcîleke pur û pak nîne. Tiştê ku dibe sedema fikaran ew e ku Erdoğan di warê destûrê de hîna jî bi qasî ku soz dabû, gav neavêtin.

Nivîs weha bi dawî dibe: *"Tirkîye fikaran jê dike ku li cîrana wê Sûrîyeyê şerekî navxweyî rû bide. Herweha aborî jî. Lê belê dîsa jî li gor cîrana xwe Yûnanistanê, Tirkîye dibiriqe. Dîsa jî aborîya Tirkîyeyê her ku diçe hêdî dibe û ev yek dikare dijwarîya herî mezin be li pêşîya Erdoğan."*

Albûma nû ya Ciwan Haco "Veger" ji pelrecordsê derket!
pelrecords

Li market û platformên dîjîtal yên muzîkê!
Ji bo daxwazên ji Ewropa: www.pelrecords.com

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

Helwêsta kurdan û şoreşgerîya li Sûrîyeyê (Dewama rûpela 1)

ku girsehejmara sunî dixwaze bibe desthilatdar û dewleteke îslamî ava bike. Ji ber ku komika herî xurt a sunî ya ***Birayên Misilman*** e, rejîm, hindikahîyan bi pîreboka dewleta îslamî ditirsîne. Encama vê yekê ew e ku komikên ne-misilman û heterodoks divê hebûneke binejêr (ne-misilman, an kafir) li welatê xwe bidomînin. Di rastîyê de jî hindikahîyên sûriyeyî xiristîyan, drûzî, îsmaîlî gelek kêm di tevgera têkoşer de beşdar dibin. Elewî, yanî komika ayînzayî ya **Esad**, li Sûrîyeyê û dervayê welat wek komika desthilatdar derbas dibe. Ger bi peyvên hîn berbiçav bê gotin, bijarteyên desthilatdar ji nav refên elewîyan e. Ev yek jî zelal e ku qebîleya Esad gelek kesên ji civata elewîyan di noqteyên girîng ên dewletê de bi cîh kirine. Gelek endamên girîng ên serbazên artêşa Sûrîyeyê, fermandarên rayedar ên muxabaratê ji nav refên hindikahîya elewîyan tên. Gelek kesên elewî bi payedarîyan ve bûne hevkarîyên gendel; kesên din jî rêyeke din a dervayê xizmeta rejîmê bikin, nedîtine. Ew windakirina desthilatdarîyê ne bi tenê wek xirabûna rewşa xwe ya şexsî û civakî dibînin. Herwiha tirsa gelek ji wan ji zordarîyên kujerane heye, eger malbata Esad desthilatdarîyê winda bike. Ev yek ne bi tenê ji bo elewîyan wisa ye, herwiha ji bo hindikahîya (3) xiristîyan û drûzan (4) jî wiha ye.

Ji ber vê sedema gelek girift, guhêzbarîya desthilatdarîyê li Sûrîyeyê vebijareke dervayê pirsê ye. Ji ber ku her cûreya guhêzbarîyê dikare rejîmê têxe xeterê û di *encama dawîyê* de tê maneya windakirina desthilatîya elewîyan. Di vê pevgirêkê de, kêlîyên psîkolojîk û bûyerên kujerî bi motivên etnîk wek li Bosna, Ruanda-Burundî, Darfur ûyd. di dema û piştî şerên hundirî de dibin xwedîmane. Dewleta Suriyeyê, di salên dûredirêj ên desthilatdarîya xanedana Esad de xwe ber bêmanetîyê ve veguhast. Komika rêveber a desthilatdar, piranî ji wan elewî ne, wan dewlet hilgirt nav destê xwe. Cuda ji rewşa Tûnis û Misirê, ew serdestê dewlet û muxaberata wê ne. Artêş artêşa wê ye û nikare di qonaxa derbasbar de wek li Tûnis û Misirê roleke erênî bilîze.

Lê di vê qonaxa heyî ya arîşedar û girift a şoreşa Sûrîyeyê de kurd bi rolekê radibin? Tê zanîn ku ji destpêka salên 1960ê şûn ve kurd hedefa cihêwazî û dorlêtengîyeke tund a partîya ***Baasê*** bûn. Gava **Hafiz Esad** di sala 1970yê de desthilatî xiste destê xwe, ev tedbîr tundtir kirin. Peyhatîyê wî **Beşar Esad** ev siyaset berdewam kir. Belkî jî mebesta qanûna hejmar 49 ew bû ku nasnameya kurdî ji bingehê ve ji hev bixîne. (5) Li gor vê qanûnê, li ser sînorên Tirkîye û Îraqê, kurdan mafê xwe yê xwedî malûmilkbûnê winda dikir.

Piştî fişara bi navê "Bihara Şamê" di salên 2001 û 2002yê de, bi tenê çalakvanên kurd di bîr û raya giştî de komikeke balkêş bûn. Di sala 2004ê de rejîmê li bajarê Qamişlo û li deverên din ên kurdan rikberîyeke tund û zordar şanî da. Lê dîsa jî, berxwedana li dijî siyaseta cihêwazîyê ya hikumeta **Beşar Esad** ranewestiya.

Parçebûna muxalefeta kurd cîyê herî qels (Pahnîya Aşîles) a muxalefeta kurd bû û hîn jî wisa ye. (6) Ku niha jî hebûna 20 partîyên kurd ên hema bêje bi armancên wekhev, ne bê sedem e. Ji alîyekî ve hikumet piştgirîya parçebûna jîyana siyasî li ba kurdan dikir û heman tişt hikumetê li ba nasirî û komunîstan jî dikir. Di jîyana siyasî ya kurdên Sûrîyeyê de faktoreke ne kêm girîng ya atomîzekirina muxalefeta siyasî jî, mudaxeleya partîyên mezin ên Kurdistana Îraqê û ya PKKê ye. Ev faktor meyla komikên kurd ên herêmî derdixe pêş ku xwe ji alîyê siyasî ve serbixwe bikin.

Tirsonekîya helwêsta partîyên kurdî

Gava di sibata 2011ê de tevgera berxwedana li Sûrîyeyê bi rêya xwepêşandanan bal kişand ser xwe, partîyên kurd jî, ji hêzên ereb ên siyasî ne cuda, ji berxwadana jixweber ve man ecêbmayî. Ne partîyên muxalif ên siyasî bûn ku di bin rêxistina gelemper a ***Daxuyanîya Şamê*** de berxwedan dimeşand, lê niştevanên deverên herêma -Horan, Idlib û kembera hawirdora Şamê a ji alîyê civakî ve marjînal bûn.

Rikeberîya deverên kurd ên navçeya Hesekîyê ji nişkê ve dest pê kir. Hema bêje li giş deverên kurdan, berîya hemûyan li bajarê ***Qamişlo***yê ku bi giranî kurd tê de niştecî ne, li pey hev xwepêşandanên dijber çêbûn û çêdibin. Herçiqas piranî partîyên kurd xwe wek muxalif bi nav dikin jî, bi tenê sê partî; ***Yekîtî, Azadî*** û ***Partîya Pêşerojê*** li gor daxwaza tevgera protestoyê ya Sûrîyeyê nasdar in. Parêzî û lihevhatina armancan, bi armancên Lijneya Kordînasyonê (lijne al-tansiq), ya xwe li hemû bajarên kurdan bi rêkxistin kiriye, li hev tên.

Rewşa partîyên kurd ji destpêka tevgera protestoyê ya Sûrîyeyê, hîn di serê mehên pêşî de gelek cudahî şanî dida. Hikumeta Sûrîyeyê ji alîyê xwe ve hewl dide ku kurdan ji hêla siyasî ve bê alî bihêle. Wisa dixuyê ku divê şidet bi tenê wek tanzîma dawî (ultima Ration) sînordar bi kar bê. Bi temamî ji stratejîya li dijî bajarên ereb ên protesto dikin, mîna ku di bûyera ***Humus, Idlib, Jisr al-Shugur, Daraa*** ûyd. gelek cûda hat şanî dan.

Dervayê vê jî, kurdên ku di sala 1964ê de bêsedem ji hemwelatîyê hatibûn derxistin, cardin bi paş ve hatin wergirtin daku ev rewş tansîyona herêmên kurdan kêm bike. Bi qanûneke serokomarî ya 7ê Nîsana 2011ê hemwelatîya kurdan bi rastî jî, hema bêje piştî 50 salên bê hemwelatîyê, cardin hat nas kirin. Encama bêdadîyê ji bo van kurdan gelek giran bû. Ev gav û pêşnîyaza **Beşar Esad** a ji bo bi delegasyoneke partîyên kurd re hev bibîne, xizmeta wê armancê dikir ku rê li ber berfirehbûna tevgera protestoyê bigire. Lê helwesta partîyên kurd, stratejîya aramîpêdana rejîma Sûrîyeyê li alîyekî, zor newêrek bû û dernediket dervayê veguhastina rejîmê. Em dikarin helwesta partîyên kurd li ser du komikan dabeş bikin. Helwwesta piranîya partîyên kurd ên Sûrîyeyê û ya *Partîya Yekîtîya Demokrat*-PYD:

Piranîya partîyên kurd

Piranîya partîyên ku nêzîkê her du partîyên mezin ên Îraqê ne, dûredirêj li ser veguhastina rejîmê spekulasyon kirin. Lê dema dijberî ber bi şêweyê şerê navxweyî bi pêş ve ket, ji bo wan partîyan jî guhertina rejîmê hew jêrevbar bû. Dîtinên van partîyan çi bûn û çi ne? Ji alîyekî ve ev partî bawer nakin ku partîyên muxalif ên sunî, berîya giştan jî Birayên Misilman, piştî guhertina rejîmê, çareserîya pirsa kurd li Sûrîyeyê acîl bibînin. Ji xwe li ser vê pirsê jî, helwesteke wan a zelal tuneye. Ji nav refên van partîyan jî, daxwazên ji bo otonomî û federalî yên wek çareserîya pirsa kurd tên. Lê hêzên muxalif ên ereb di wê ramanê de ne ku divê çareserîya pirsa kurd, piştî hilweşîna vê rejîma heyî, bê dîtin. Ji alîyekî ev partî ji alîyê her du partîyên kurd ên li Îraqê desthilatdar in, ***Partîya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtîya Niştimanî ya Kurdistanê*** tên hişyar kirin ku ew rêyeke navgîn bimeşînin, ji ber ku Hikumeta Kurd a Herêmî derfet nabîne ku kurdên Sûrîyeyê biparêze, eger arîşeya bi hikumetê re ji rê derkeve. Piştî gelek demkujî û taktîkan partîyên kurd ên Sûrîyeyê di dawîya meha mijdara 2011ê de Şêwirmendîya Netewî ya Kurdên Sûrîyeyê damezirandin ku ew berjewendîyên wan ên derva biparêze. Belkî bi awarteya serokê ***Tevgera Pêşerojê Mişel Temo*** yê ku di sala 2011ê de hatibû kuştin, hemû partî spekulasyonê dikin ku arîşeya li Sûrîyeyê dikare dirêj bikişîne, ji ber wê yekê jî, ew pêwîstîya şanîdana helwesteke zelal nabînin. Ew behsa guhêzbarîya dewleta Baas a despot dikin, lê bêyî ku têgeha guhertina rejîmê bi kar bînin. Sekreterê Partîya Yekîtî ya Kurdistanî, Ismaîl Hamî di hevpeyvînekê de wiha digot: *"Em, tevgera kurd, me heta niha eşkere daxwaza hilweşîna rejîmê nekir, bi tenê guhertina sîstemê xwast"*. Wî lê zêde dikir *"...rejîm êdî rewa nîne"*. (7) Partîyên kurd dizanin ku daxwaza hilweşîna rejîmê tê maneya veqetandineke zelal ji rejîmê. Ev dikare bibe sedem ku herêma Kurdistanê ji şideta berfireh a rejîmê parastî nemîne. Wekî din 500 heta 1000 xebatkarên 20 partîyan dikarin şexsî jî bikevin bin çavdêrîyê.

Hêza duyem PYD

Hêza duyem ***PYD***, partîyeke dirêjahîya PKKê ye ku gelek kêm serbixwe ye. Ew ji alîyê stratejî û siyasî ve girêdayê partîya eslî ye (partîya dayîk). Bi destpêkirina şoreşa ereb, PKK û bi wê re PYD û dirêjîya wê ya li Îranê ***PKK- PJAK*** xwe ji nû ve bi cîh kirin. Wiha dixuyê ku PKK, ji helwesta nû ya hikumeta tirk a AKPê ku piştgirîya serhildanên ereb dikir, motivekirî nêzîkî Îran û Sûrîyeyê dibe. Bi vî awayî hewesa wî ya hilweşîna rejîma **Beşar Esad** tuneye. Bi hilweşîna wê dibe ku ***Birayên Misilman*** ên hevkarên hikumeta AKPê li Sûrîyeyê roleke girîng bi dest bixin. Tirkiye piştgirîya serhildana Sûrîyeyê dike, dikare bêtir bandor li Sûrîyeyê bi dest bixe. Ji ber vê sedemê PKK, PYD û hemû kes û komikên din ên hevalbendên wan rola aktîv a Tirkîyeyê li Sûrîyeyê red dikin. Li gelek deverên kurdan, bi taybetî li herêmên ***Afrîn*** û ***Kobanê*** PYD desthilatdarîyê diceribîne. Agahdarî zêde dibin ku PYD muxalifên kurd dişopîne û cezayan dide wan. Hin nivîskarên ereb ên Sûrîyeyê bawer dikin ku ***PYD*** bi erkdarîya rejîmê tevdigere. Jixwe PYD valahîya desthilatîyê bi kar tîne ku di herêmên kurdan de cîyê xwe zeximtir bike. Dîtinên wê yên li ser çareserîya pirsa kurd hîn bêtir girtî ne. Serokê PYD di hevpeyvînekê de wiha dibêje:

"Me projeyek pêşkêş kir: `Otonomîya demokratîk´ (wiha!). Divê zelal be ku ev yek ne otonomî ye. Me hertişt beyan kirin, gavên pratîk raxistin ber çavan û dest pê kir ku vê projeyê bixin jîyanê (...) Em modelên klasîk ên wek federalîzm, konfederalîzm, xwe îdarekirin û otonomîyê red dikin. Armanca me damezirandina civakeke nû ya kurdan e, çêkirina mirovekî azad e..." (8)

Serokê PYD bi gelek zêde peyvan hestekanîya li ser çêkirina "mirovê nû" tîne ziman: *"çîma em li Sûriyeyê felsefe (wiha!) û îdolojîya Apo (Abdullah Öcalan) bi kar tînin, sedemeke wê heye: ew çareserîya herî baş ji bo pirsgirêkên kurd li Kurdistana Sûrîyeyê pêşkêş dikin."* (9)

Di bin bandora PYD de, belkî ji tirsa kiryarên PKK û PYD, partîyên kurdên Sûrîyeyê hewl nedan ku wek beşekî ji muxalifên Sûrîyeyê axaftinan bi hikumeta AKPê re bikin. Berîya hevdîtinan, PYD tevgera protestoyê ya li dijî rejîmê li herêmên kurdan wek peyayên Tirkiyeyê tawanbar kir. (10) Hevdîtinên bi hikumeta AKPê re (11), dê li herêmên kurdan bibûya sedema kiryarên şidetê li dijî serokên partîyên kurd. Partîyên kurd ên Sûrîyeyê nikarin li dijî hêza PKKê derkevin. Partîyên kurdan derfeta ketina pêwendîya aktoreke ji yên herî hêzdar a herêmî ya Rojhilatê Navîn, ji dest da.

Zelal e ku rejîma **Beşar Esad** ji ber sedema zordarîya li dijî gelê sîvîl, rewatîya xwe li Sûrîyeyê, li cîhana ereb û serzemînê navnetewî sedîsed winda kiriye. Dibe ku rejîm nikaribe ji bin vê krîzê derkeve. Di arîşeya kurd de pirs ji bo çareserîya pirsgirêkê li ser pêşnûmaya rejîmê ye ku ka ew bi kijan berfirehîyê dikare pêşkêş bike. Bi paşvedana hemwelatîyê herçiqas gavekî ber bi rastîyê ve be jî, têr nake. Zerarên kesên di sala 1964ê de ji hemwelatîyê hatine derxistin, divê li gor pîvanên dadmendîya navneteweyî bên telafî kirin. Erebkirina navçeyên kurdnişîn ên di nîvê salên 1960ê de plan bûne û piştî hatina serhikum a **Hafiz Esad** pêk hatine, divê bi paş ve bên wergirtin. Ew bi rewişt(ehlaq, karakter) û hebûna xwe ve tevdîrên gelek nijadperest bûn. Ew bi hemû pîvanên mafên mirovan re rikeber in. Kurd li benda naskirina nasnameya etnîk û muxtarîyeta xwe ne, ev daxwaza hemû partîyên kurdan e. Zagona bingehîn a di dawîya sibatê de xistibûn dengdarîyê şanî dide ku rejîma **Beşar Esad** li hember kurdan hîn li ser helwesta kevin bi israr e. Bi vî awayî, gelê Sûrîyeyê di pêşekîya zagona bingehîn a nû de dibe "parçeyekî neveqetbar ê neteweya ereb". (12)

Damezirandina partîyên li ser bingeha etnîk jî di benda 8 de neqanûnî hatiye beyan kirin. Li gor nêrîna kurdan ev bend vekirî binpêkirina mafên wan e, ji ber ku li gor zagona bingehîn divê bi tenê partîyên ereb ên neteweperest bên damezirandin. Kurd bi eşkereyî ji meydana siyasî tên qewitandin.

Kurd nikarin daxwazên xwe bi cih bînin, muxalefeta ereb daxwazên kurdan qebûl nake, PYD jî rewşê xirabtir dike

Rastîya ku muxalefet jî daxwazên partîyên siyasî yên kurdan nake yên xwe, dikare sedemek xwe paşvegirtin û helwesta wan a pasîv be. muxalifên ereb etnîzekirina siyaseta kurdan rexne dikin. Borazana sereke ya rexnegirên (13) ereb dibêje ku divê kurd wek erka yekem a şoreşa Sûrîyeyê hilweşandina rejîma Sûrîyeyê bibînin. Ev rexne neheq nîne, bi taybetî tesîra derdîçe ew e ku kurd piştgirîya armanca muxalefeta ereb a guhertina rejîmê nakin. Helwesta muxalefeta kurd bi hin şêweyên xwe, wek helwesta *Rêxistina Kordînasyona Neteweyî ya Sûrî ye* (Haiy'at al-Tansiq al-Watani al-Suri) ku ev dikare wek muxalefeteke "sadiq" bê tesnîf kirin. Her mudaxaleyeke biyanî red dike û spekulasyona veguhastina sîstemê dike. Beşekî mezin ê çalakvanên vê rêxistinê dîtinên *panerebî* yên tund diparêzin. (14) Partîyên kurd ji hesabeke din didin ser rê. Sûrîye beramber veguhastineke bingehîn e. Eger rejîma niha bê hilweşandin, pirs ji nû ve avasazîya dewleta Sûrîyeyê ye. Ev ji guhertina rejîmê zêdetir e. Wek komika etnîk a duyem hêzdar, ew dixwazin di nav çarçoveya avakirina-netewe de pozîsyoneke xurt di dewleta nû ya Sûrîyeyê de bi dest bixin. Wisa dixuyê ku modela kurdên Îraqê mînaka wan e. Lê partîyên kurd ên Sûrîyeyê rewşê baş nanirxînin ku kurdên Îraqê, li hember gelek têkçûnan, dîsa jî cîyekî desthilatdar di jîyana siyasî ya Îraqê de wergirtibûn. Ji vê wêdetir komikên wan ên gerîla yên xurt hebûn. Piştî avakirina herêma parastî 1991, navnetewî jî hatin nas kirin. Hemû ev merc li ba kurdên Sûrîyeyê tunene. Wekî din divê ew bi partîya kurd PKKê ku bi şaxê xwe PYD ve derbarê çareserîya pirsa kurd bi temamî xwedîdîtinên gelek cuda ye, serî derkevin. Ji komîteyên kordînasyonê yên jixweber ên li hemû deverên kurdan derketine holê jî ditirsin ku ew dikarin zêde desthilatiyê bixin destê xwe. Pirsgirêka kurdên Sûrîyeyê di wê yekê de ye ku ew, cihêwaz ji kurdên Îraqê berîya hilweşîna **Sedam Huseyn**, nikarin armancên lihevhêner ron bikin. Kesên ku dixwazin di lijneya neteweyî ya Sûrîyeyê de kurdan temsîl bikin jî, xwedî rewayîya fermî ya nûnerîyên kurd nînin. Di dîroka Rojhilatê Navîn de mirov mînakên bi vî awayî wek li ba kurdên Sûrîyeyê nabîne ku di veguhestina mezin a Rojhilatê Navîn de nizanin çi bikin û stratejîyeke wan a çalakîyê tuneye. Dawîya arîşeyê ne dîyar e. Dervayê awarteyê Îraq û Lubnana di bin desthilata Hîzbûlahê de, hemû aktorên rojhilatê ereb piştgirîya guhertina rejîma li Sûrîyeyê dikin. Muhalefeta Sûrîyeyê jî deriziye. Wisa dixuyê ku Lijneya Neteweyî ya Sûrîyeyê stratejîya guhertina rejîmê dişopîne. Rêxistina Kordînasyona Neteweyî, ji ber ku radîkal erebî-neteweperest e, dikare qîma xwe bi lihevhatinekê jî bîne. Her du komik jî dixwazin gengeşîya li ser pirsa kurd bi paş ve bixînin. Kurd bi xwe jî çareserîyan berdidin meydanê (mînak: otonomîya herêmî û federalîzm) ji ber ku nikarin bixin jîyanê. Ew dê li Sûrîyeyê hêzeke muxalif jî nebînin ku zêdetirî naskirina mafên çandî bipejirînin. PYD rewşê hîn dijwartir dike, eger ew bi tenê ber bi Tirkîyeyê ve çalakîyan bike jî, bi peyv û di rastîyê de her çareserîya derbarê pirsa kurd li Sûrîyeyê asteng bike. Zagona Bingehîn a nû ya Sûrîyeyê şanî dide ku ger kurdên Sûrîyeyê bawerîya xwe bidin ser **Beşar Esad**, ew dê şertanê li ser hespê şaş bigirin.

* Li Zanîngeha Erfurtê rêveberê Ûnîteya Lêkolînên Kurdî ya Mustafa Barzanî.

1 b. Kurdwatch, nûçeyên 2011ê, www.kurdwatch.org.

2 b. Iliya F. Harik: The Ethnic Revolution and Political Integration in the Middle East(*şoreşa etnîk û întegrasyona siyasî li Rojhilatê Navîn*). In: International Journal of Middle East Studies, Vol. 3, No.3, Jul. 1972, S. 303-323

3 b. Zur positiven Haltung des christlichen Klerus zum Regime Baschar al-Assad(*Li ser helwesta erênî ya dîndarên xiristîyan derbarê rejîma Beşar Esad*), Der Spiegel 48/2011

4 Di dawîya Sibata 2012ê de serokê texmînî 700.000 Drûzên Sûriyeyê Hamud al-Hannawi got ku drûz bêtir lihevhatinê dixwazin, ne hilweşandina rejîmê, ji ber ku ew ji şerekî ayînzayî ditirsin, b. www.elaph.com, ji 27.02.2012

5 b. kurdwatch: Dekret 49 – Enteignung der kurdischen Bevölkerung? (*Bê malû milk kirina gelê kurd*) Berlin: kurdwatch, Tirmeh 2010

6 b. Li ser dîroka partîyên kurd li Sûriyeyê: kî muxalifeta kurdên Sûriyeyê ye? Pêşveçûna partîyên kurd 1956-2011, www.kurdwatch.org

7 Kurdwatch, www.kurdwatch.org, Nûçeyên 2011ê

8 Kurdwatch, hevpeyvîn bi Salih Muslim Muhammad re, www.kurdwatch.org, Nûçeyên 2011ê

9 Heman çavkanî

10 Heman çavkanî

11 Derbarê amadebûna wezîrê karên derva yê Tirkiyeyê Davutoglu agahdarîyên esayî hene ku ew bi şandeyeke partîyên kurd ên Sûriyeyê hevdîtinên lêgerînane pêk bîne. Ev yek ji sedema helwesta tirsnak a wan partîyan pêk nehatiye. Axaftinên bi Anonymus re, Berlin Çile 2012

12 Hiquqnas û siyasetmedarê kurd Ismet Ghubarî, bi xwe hiquqnasekî navdar bû, endamê Lijneya Amadekarîya Pêşnûmaya Zagona Bingehîn bû ya ku ji alîyê Beşar Esad ve hatibû danîn. Li gor gotinên wî, pêşnîyaza wî ya xweserîya kurdan di zagonê de bê nivîsandin, bi tundî hatiye red kirin, b. Haidar Umar: qira'a sari'a fi mashru' dustur al-jumhuriya al-arabiya al-suriya (Nêrîneke zû li ser pêşnûmaya zagona bingehîn a komara ereb a Sûriyeyê), www.efrin.net, ji 25-2.2012

13 b. Ghassan Muflih: al-Hiwar ma'a ba'dhana hawla al-thawra al-suriya (Gengeşîya di navbera me de li ser şoreşa Sûriyeyê), www.elaph.com, ji 14.02.2012

14 Michel Kilo, Haitham Manna' Hasan Abd al-,Azim, Samir Aita ûyd

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

Pirsa kurdî û raperîna sîvîl (Dewama rûpela 1)

dewletê, him jî li dij tevgerên din ên kurd, ku wekî muxalîf didît, bi kar anî. Mebesta şideta li dij muxalîfan bûyîna hêza tik û tenê û bidestxistina rewşeke hegemonîk bû. Li paş şideta li dij dewletê de jî ew fikr hebû ku digot dewleta tirk bi rêbazeke derveyî şidetê nayê rê. Ev şideta dualî, bi gelemperî li ser siyaseta Tirkîyeyê, bi taybetî jî li ser siyaseta kurd de xisarên mayînde hiştin.

Siyaseta Tirkîyeyê û şidet

Ji ber ku dewlet li hember meseleya kurdî de şidetê bi kar tîne û PKK jî şidetê wek rêbazekê bi kar tîne, li Turkîyeyê pergaleke wesayetgerîya siyasî ava bû. Vê rewşê ji du alîyan ve bandor li ser siyaseta Tirkîyeyê kir:

Wekî yekem, organa ku wesayetê bi xwe re digerîne, artêş e. Ji ber ku artêş bi PKKê re şer dike, ev yek giranîya wê ya di nav sîstemê de zêde dike û nufuza wê ya li ser qadên siyasî û huqûqî mezintir dike. Artêş ji şer û pevçûnê ji xwe re meşrûbûnekê derdixe û di meseleya kurdî de hêza biryardayînê bi dest dixe. Artêş ji civakê re vê yekê dibêje:

"*Li qadê ez şer dikim, lewma aktorê ku xwedîyê wî ez im yê ku bibê ka tişt çawa bibin. Gavên ku dê werin avêtin ez dîyar dikim; heger hin tedbîrên civakî, huqûqî û çandî hewce bin, ez dikarim biryara wê bidim. Destûrê nadim wê siyaseta ku ez rêk û pêk nabînim*".

Giranîya artêşê him li ser qanûnçêkerîyê, li ser hikûmetê, him jî li ser dadwerîyê tê hîs kirin. Artêş sebaret bi wan mijaran ku dikevin destûrmendîya qanûnçêkerî û hikûmetê, qada xwe ya tevgerînê bi xwe dîyar dike. Wekî mînak, Serfermandarê artêşa tirk, ku îro tê bawer kirin ku ji alîyê hikûmetê ve hatîye sînordar kirin û ketiye bin nîrê wê, jê kêm namîne û aşkere dîyar dike ku ew li dij perwerdehîya bi zimanê dayîkê ye. Artêş herweha li ser dadwerîyê jî xwedî bandor e. Ji ber ku divê şewqa endamên artêşê, ku "li dij terorê têdikoşe" nabe ku were şikandin. Lewma, ew kesên ku derdikevin sînorên huqûqê bi destê dadwerîyê tên parastin.

Wekî duyem, hawîrdoreke bi şidet li Tirkîyeyê dibe sedem ku siyaset xwe radestî neteweperestîyê bike. Li Tirkîyeyê geh rastgir, geh çepgir bingeha hevpar a hemû partîyên siyasî neteweperestî ye. Îdealên neteweperest, hemû partîyên siyasî dikişîne ser heman xetê û dibe sedem ku ew hemû heman refleksan nîşan bidin. Şidet reh û rîşalên neteweperestîyê ye. Ji ber ku dema asta şidetê bilind dibe, li cem herdu alîyan jî zerar û mirin jî zêde dibin. Di wê hawîrdora aloz de, ku pêk tê, neteweperestî îtîbara xwe zêde dike û partîyên siyasî di warê neteweperestîyê de dikevin pêşbirkê. Dema ku siyaset dikeve jêr bandora ruhîyeteke neteweperest, ew ê ku wenda dike demokrasî ye. Ji ber ku di hawîrdoreke weha de maf û azadî tên rawestandin, stratejîyên serbazî û ewlekarîperest serdest dibin.

Heger di vê çarçoveyê de were nirxandin, mirov dikare bibêje ku li Tirkîyeyê di warê dîyarkirina rojeva siyasî de hêza herî bibandor PKK ye. Dema ku şideta PKKê zêde dibe, gavên demokrasîyê yên li Tirkîyeyê, ku bi hezaran zehmetîyan hatine avêtin, hema çerx dikin. Dema ku şidet radiweste, demokrasî dikare hinekî be jî hilma xwe vede. Lewma, şidet pêşî li wê yekê digire ku Tirkîye di warê meseleya kurdî de rojeva xwe ya siyasî dîyar bike û bi hasbelqeder dîyar kiribe jî wê berdewam bike.

Siyaseta kurdî û şidet

Ji ber ku di meseleya kurdî de hertim şidet heye, ev yek dibe sedem ku siyaseta kurdî jî bikeve bin wesayetê. Siyaseta kurdî jî li jêr nîrê wesayetê de ye û ev wesayet têkoşîneke demokratîk nemumkin dike, nahêle ku demokrasî pêş keve. PKK, difikire ku heger li ser navê kurdan deskeftîyek hebe, ew encama têkoşîna wê ye û weha tev digere ku wê berdêla vê deskeftîyê bi xwe daye. Lewma, hewlê dide ku hemû rêxistinên siyasî bixe bin kontrola xwe. PKK, li gor xwe xetek dîyar dike û dixwaze ku herkes li gor vê xetê tev bigere. Heger şexsiyetek, an jî komek vê xetê derbas bike, PKK hema berê xwe dide wê û zorê dide ku di nav xetê de bimîne.

Mirov dikare behsa gelek sedeman bike ku vê wesayetê peyda dikin û dihêlin ku berdewam bike. Berîya hertiştî, wekî ku li her derê din jî weha ye, li vê derê jî hêza ku çek di dest de ye -an ku PKK- bi arezûya parastina serdestîya xwe tev digere. Çek, deshilatdarîyekê pêk tîne û çekdar da ku vê deshilatdarîya xwe biparêzin û wê hêzdartir bikin, bi hêza xwe ya herî dawîyê hewlê didin ku qada siyasî û civakî li jêr kontrola xwe bihêlin. Hêza çekdar, li hember hemû rûdanan, ku li derveyî însîyatîfa wê pêk hatiye, bi şik û guman tev digere û li dij wê yekê derdikevin ku sîvîl -herçend rast be jî- gotarên siyasî bi pêş bixin. Wekî mînak, rêveberên PKKê dikarin gelek caran dîyar bikin ku "*dema têkoşîna çekdarî derbas bûye*" û ev yek nabe pirsgirêkek. Lê belê dema ku heman gotin ji alîyê Şaredarê Bajarê Mezin ê Dîyarbekirê ve were gotin ev yek dibe pirsgirêkek. PKK li hember raya giştî bertekê (reaksîyonê) nîşanî **Baydemîr** dide û bang lê dike ku hedê xwe bizanibe. Ji ber ku hêza çekdar bi vî awayî dixwaze gotina dawîyê bibêje û bi ser gotina xwe de gotineke din nas nake, ev yek jî siyasetmedarên ku ji xwe bêhêz in, bêhêztir dike.

Sedemeke din jî pirsgirêka **"pêewlebûnê"** ya li cem siyasetmedaran e. Siyasetmedar -nemaze yên ku di nav BDPê de cih digirin- bi dewletê ewle nînin. Di qurna dawîyê de kurd tûşî gelek zext û zulma dewletê bûn. Rabûrdûyeke tije bi serpêhatîyên xerab, bû sedem ku li cem siyasetmedaran tirseke mezin a tasfîyebûnê peyda bibe. Herweha bû sedem ku çek li dij tasfîyebûnê wekî garantîyekê were dîtin. Derbirîna herî aşkere ya vê ferasetê di gotinên Leyla Zana de tê dîtin, ku di van demên dawîyê de gotibû. Wê gotibû: "*Çek, sîgorteya kurdan e*". Mebesta wê gotinê ew e ku heger dewlet bi êrişekê kurdan wekî hedef bigire, wê demê hewcedarî bi mekanîzmayeke bersivdanê hebe ku bikaribe çekan bi kar bîne. Dema ku mîsyoneke weha bidin çekan, rexneyeke li dij çekdaran jî mumkin nabe. Herweha li cem siyasetmedaran hesta bi xwe ewlebûnê pêş nakeve û ew nikarin însîyatîfê bigirin destên xwe.

Encamên neyînî yên şidet û wesayetê

Bikaranîna şidetê û wekî encama wê pêkhatina wesayetê, ji bo siyaseta kurdan rê li sê pirsgirêkên mezin vedike.

A yekem, şidet pêşî li wê yekê digire ku di maneyeke rasteqîn de siyaset were kirin. Da ku siyasetmedar li ser pirsgirêkekê çareserîyan pêşnîyar bikin, divê ew bikaribin ji nav alternatîfan bi azadî hilbijartinê bikin û bikaribin bi awayekî aşkere bipeyivin. Lê belê, li ser siyaseta kurdî de hêzeke wekî PKKê heye, ku di warê bikaranîna şideteke tîr û bibandor de xwedî potansîyelekê ye, û hebûna vê hêzê pêşî li muzakereyeke vekirî digire, ku pêş-şerta siyasetê ye. **Hannah Arendt** dibêje li cihê ku şidet hebe, meseleyên siyasî nikarin werin gotûbêj kirin. Ji ber ku li cihê ku "gotin" û "şidet" tev li hev bibin, gotin hukmê xwe ji dest dide. Lê siyaset bi gotinê pêk tê. "*Lewma, şidet derveyî siyasetê ye û siyasetê li der ve dihêle*".

Ji ber şidet û wesayetê jiyaneke rasteqîn ya siyasî pêk nayê û vê yekê pêşî lê pêşketina siyaseta kurdî girt. Derbarê hin qadên dîyarkirî de -wekî mînak sebaret bi bêçekkirinê- jî perspektîfên çareserîyê ku alternatîfên cuda pêşkêş dikin, nikaribûn werin bi pêş xistin. Ji ber ku siyaseta kurd di nav xwe de nekarî pirsgirêka demokrasîyê çareser bike, vê yekê rê li ber avahîyeke "yekdengî" vekir û zixta ji der ve jî bû sedem ku ev avahî zêdetir "hev bigre". Di encama wê de wan xwe teslîmî rastîyên mutlaq kir û gotineke rêk û pêk a siyasî derneket. Heger di warê meseleya kurdî de çareserîyeke demokratîk derneketibe, sedema vê yekê ne tenê şaşîyên dewletê, herweha têrê nekirina polîtîk a siyaseta kurdî ye.

A duyem, şansê serkeftinê ya projeyeke siyasî bi kapasîteya wê ya îqnakirina xelk ve girêdayî ye. Heger tevgerek xwedî perspektîf û metodekê îqnakir be, dikare bigihîje serkeftinê, yan na têkçûn misoger e. Yek ji pêşşertên îqnakirina xelk jî ziman û helwêsteke siyasî ya jidil û lihevkirî ye. Ziman û helwêsteke weha bi awayekî dikare xwedî li hemû kesan derkeve, ku tûşî şidetê bûne û jana wan par ve bike. Cudagerî navbera xwe û yên din nas nake, li nasnameyan nanihêre; helwêsta xwe li gor kirdar dîyar nake.

Di warê îqnakirina xelk de faktoreke din a girîng jî hebûna hevahengîyeke navbera mebest û alavan e. Heger armanc û alav li hev nekin, wê demê bivênevê ye ku mesafeya navbera we û xelk wê mezintir bibe. Heger ji bo armancekê, ku tu dikarî bi rêbazên siyaseteke demokratîk bigihîjî, hewlê bidî bi şidetê bigihîjî, îqnakirina xelk dê dijwartir bibe. Di merheleya îro de yek ji nakokîyên herî mezin a siyaseta kurdî ev e.

A sêyem, li cîhanê -nemaze li Ewropayê, ku di pêşketina tevgera siyasî ya tevgera kurdî de dînamîkeke gelek girîng e- li hember rêxistinên siyasî, ku bi awayekî digel rêxistinên çekdar di peywendîyê de ne, tehemul her ku diçe kêmtir dibe. Îro tu tevgera siyasî xwedî wê luksê nîne ku raya giştî ya cîhanê paşguh bike. Rêxistineke siyasî bi tenê heger daxwaz û alavên wê meşrû werin dîtin, dikare bi dewletên cîhanê re bikeve têkilîyê. Heger alavên we nefreta cîhanê dikişîne ser we, dê ji bo we derfet nemîne ku hûn piştgirîya raya giştî ya cîhanê bi dest xin û xwe bigihînin serkeftinê.

Di vê çarçoveyê de, mirov dikare bibêje ku di meseleya kurdî de şidet rê li du rewşên neyînî vedike. Ji alîyekî ve, rê li krîminalîzekirina daxwazên biheq ên kurdan û marjînalkirina wan vedike. Ji alîyê din de jî, çalakîyên şidetê dibin hinceta dewletê ku maf û azadîyan tengtir bike. Raya giştî ya cîhanê li hember wan dewletan, ku tûşî çalakîyên şidetê dimînin, rasterast nerazîbûn nîşan nakin ku ew dewlet qadên demokratîk teng dike, bi xweşbînî nêzî wan dibe.

Wekî ku tê dîtin, şidet û wesayet destarek in ku him siyaseta kurdî him, jî ya Tirkîyeyê pûç dikin. Da ku

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 2**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 25 x 25 cm

jiyaneke siyasî ya demokratîk û ji bo pirsgirêkên civakî çareserîyên aştîyane werin dîtin, divê xwe ji dîyarkerîya çekan rizgar bikin û rêyan vekin ku siyaseta demokratîk bikaribe lê hilma xwe vede. Lê belê çawa?

Raperîna sîvîl

Ez li dij şidetê me; ji ber ku qencîyên ku, tê bawer kirin ew tîne demî ne, xerabîyên ku tîne jî mayînde ne.

Gandhi

Di roja me ya îro de siyaseta kurd xwedî wê berpirsîyarîyê ye ku him li cem xelk hevdilên xwe zêde bike, him jî di asta navneteweyî de meşrûbûna xwe bilindtir bike û him jî di maneyeke rasteqîn de bikaribe siyasetê bike. Fikra raperîna sîvîl û pratîka wê da ku ev pirsgirêk bikaribin ji holê werin rakirin, dikare rê li pê siyasete kurdî bixe.

Raperîna sîvîl, li dij neheqîyên mezin çalakîyeke derqanûnî ya siyasî ye, ku wekî çareya dawîyê dikare were bi kar anîn. Raperîna sîvîl, fikra edaleta hevpar ji xwe re dike bingeh û şidetê bi tundî red dike. Nebûna şidetê, yek ji taybetmendîyên sereke ye ku karaktera çalakîyên raperîna sîvîl dîyar dike. **Jürgen Habermas,** dîyar dike ku çalakîyên bêîtaedîyê divê teqez aştîyane -an ku bêşidet- bin. Çalakî, nabe ku zirarê bide hebûna fîzîkî û psîkolojîk a dijberan, yan jî kesên sêyem ku têkilîya wan bi bûyerê re nîne.

Raperîna sîvîl, di rastîyê de, nameyek e ku daxwaza edaleta hevpar derdibire û bangek e ji bo raya giştî. Koma ku çalakîyê li dar dixe, agahîyê dide raya giştî ku prensîpa yeksanîyê, ku civakê li cem hev radigire, tê bin pê kirin, azadî hatine ji dest girtin û maf bi zanîn tên bin pê kirin. Wateya çalakîyê ew e ku ew kom li hember wan neheqîyan nerazî ye, xwe radest nake û dê serî hilde. Li gor **John Rawls** mebesta raperîna sîvîl ew e ku koma hindikahî koma piranî vedixwîne ku xwe bi xwe pirsîyar bike:

"*Komeke hindikahîyan bi rêya bêîtaedîya sîvîl, sorê dide koma piranî ku tiştên ku dike binirxîne, yan jî biryara xwe bide ka ew amade ye ku li gor feraseta edaleta hevpar daxwazên hindikahîyan nas bike yan na*".

Raperîna sîvîl, rêbazek e ku divê bi tenê li hember neheqîyên mezin were bi kar anîn. An ku, heger mafekî girîng were bin pê kirin divê serî li wê were dayîn. Yan na heger ji bo her tiştî rêya raperîna sîvîl were bi kar anîn, bêîtaedî êdî hêjayî bawerîpêanînê nabe û bandora xwe wenda dike. Çalakî divê bi nisbet, li gor armancê be û digel wî mafî ku tê bin pê kirin di nav têkilîyeke maqûl de be.

Raperîna sîvîl, cotestandartîyê qebûl nake. Ji ber tê de bangeke li wijdana raya giştî heye, kesên ku bi vî karî radibin, nikarin cotstandartan bi kar bînin. Wekî mînak, heger ew li dij kuştin û îşkenceyê derdikevin, divê ew bi temamî li dij îşkenceyê be, alîgirî nayê kirin. Çalakvanê raperîna sîvîl, bêyî ku lê binihêre ka ew pêkirinên navgotî ji alîyê kê ve tê li dar xistin, yan jî mexdûr kî ne, li dij wê radibe. Yan na nikare xelk îqna bike û pê bide bawer kirin.

Bi gelemperî, raperîna sîvîl ne navgîna kûrtir kirina neyartîyan e lê bertaraf kirina wan e. Mebesta raperîna sîvîl tune kirina dijberê te nîne lê îqna kirina wê ye. Lewma, tê de cih ji bo şidet û cotestandart nîne.

PKK/BDP û raperîna sîvîl

PKK bi gelek boneyan dîyar dike ku ew naxwaze ji Tirkîyeyê veqete û dewleteke serbixwe damezirîne. **Öcalan**, cara pêşîn di 1991ê de di hevpeyvîna xwe ya digel *Turkish Daily News* de gotibû ku mebesta wan serbixwebûn nîne û ew dixwazin digel tirkan bi hev re bijîn. Paşê jî Öcalan hema hema di hemû axaftinên xwe de dîyar kir ku mebesta wê ya sereke demokratîze kirina Tirkîyeyê ye û "demokratîkkirina komarê ye". Him Öcalan û him jî rayedaren din ên PKKê vê siyasetî îro tînin ziman.

Heger niha mebest ev be naxwe divê bikaranîna şidetê bi awayekî cidî bikeve ber lêpirsînê. Ji ber ku mirov dikare bi rêbazên demokratîk û rê û metodên raperîna sîvîl jî bigihe wan armancan. Jixwe PKK xwedî hêzeke weha qirase ye ku dikare çalakîyên bi vî rengî organîze bike. Di nav qada bandora PKKê de partîyeke wekî BDP heye ku 3 mîlyon deng wergirtine, rêxistinên civaka sîvîl hene ku li her alîyê civakî belav bûne, dezgehên wê yên medyayê û hevdilên wê yên ciwan hene ku dikarin pir bi lez tev bigerin. Heger bi van potansîyelan çalakîyên protestoyî yên aştîyane werin li dar xistin ev dê li ser siyaseta Tirkîyeyê bandoreke hejok bike.

Ji bilî wê yekê, veguherîna ku di siyaseta kurdî û di civaka kurdî de pêk tên ji bo siyaseta demokratîk derfetên girîng dide. Wekî mînak hejmara wan kesan ku di Newrozê de beşdar dibin, ku jê re girîngîyeke siyasî tê dayîn, hersal zêdetir dibe. Nemaze jin, zarok û ciwan, di çalakîyên wekî vê rojê de bêhtir cih digirin, bi roleke dîyarker radibin. Zêdebûna piştgirîya girseyî ya di rojên weha de du bandoran dike: Ji alîyekî ve rojên weha dibin bingeha avakirina nasnameya neteweyî, ji alîyê din de jî derfet çêdibe ku daxwazên siyasî werin krîstalîze kirin û girse li dor wan daxwazan tev bigerin.

PKKê di 2011ê de ev yek dît. Nemaze "Bihara Erebî", bandoreke mezin li ser Öcalan kir û ew fikirî ku bi çalakîyên raperîna sîvîl jî ew dikarin bimeşin. Li gor Öcalan heger li Dîyarbekirê dîmeneke wekî ya Meydana Tehrîrê ya Misirê pêk were, ev yek dê di meseleya kurdî de rê li pêşveçûnên gelek mezin veke.

"Wekî mînak, heger li Dîyarbekirê jî xelk wekî ya Misirê bi rojan li kuçeyan bimînin, daxwazên xwe bînin zimên, wê demê dê aştî were. Wê demê Erdoğan dê daxwaz bike ku vê pirsgirêkê çareser bike".

Ev mesaja Öcalan bi qismî hat sepandin. Di vî warî de, ji alîyekî ve li herêmê, ji alîyê din de jî li Ewropayê çendîn çalakî hatin li dar xistin. BDPyê, bi bixwebawerbûna xwe ya tevgerên girseyî 4 daxwazên xwe yên berbiçav ragihandin: Daxistina benda 10 dersedî, ku di temsîleyetê de dibe needaletî, berdana girtîyên siyasî, rawestandina operasyonên leşkerî û siyasî û naskirina mafê bi zimanê dayîkê. BDPyê dîyar kir ku ew ji bo bi cih anîna van daxwazan ji hikûmetê li benda gavên berbiçav in û divê hikûmet sozê bide. Û da ku zorê bide hikûmetê- digel DTKê- dest bi çalakîyên raperîna sîvîl kir. Çalakîyên rûniştinê, înên sîvîl û protestoyên dibistanan hin ji çalakîyên vê serdemê bûn.

Lê belê BDP, nekarî van çalakîyan bi biryarî û rêk û pêk bimeşîne. Sedemeke vê yekê ew bû ku girseya BDPyê -nemaze jî ciwan- xwedî tecrûbeya çalakîyên bêîtaedîyê nebûn. Sedema din jî berteka hişk û tund a dewletê bû, ku li dij çalakvanan nîşan da. Dewlet ji ber ku ew yek wekî gefeke cidî dît, xwest ku hema pêşî lê bigire.

Girîngîya raperîna sîvîl

Gelek dozên min hene ku dikarim ji bo wan bimrim, lê belê tu doza min nîne ku ji bo wê kuştinê bikim.

Gandhi

Lê belê raperîna sîvîl ji du alîyan ve girîng bû: Carekê, ew dihêle ku dewlet li dij daxwazên meşrû hin gavan biavêje. Wekî mînak, di perwerdehî û têkilîyên digel meqamên dewletê de bikaranîna zimanê dayîkê û daxistina benda hilbijartinê, di warê siyaseta demokratîk de daxwazên gelek meşrû ne. Kes nikare wan kesên ku bi van daxwazan derketina kuçeyan wekî "terorîst" bi nav bike. Deshilatdarî divê li hember van girseyan ku van daxwazan dikin civakî, helwêstekê nîşan bide. Di vir de dikare sê helwêst derkevin: Yan daxwaz wekî ku demokrasî dispêre, dikarin werin nirxandin, yan dikarin werin paşguh kirin û werin hiştin ku bicemidin, yan jî bi awayekî tûj werin red kirin. Bicihanîna daxwazan, dê bibe helwêsta herî maqûl. Ji ber ku ev yek nîşan dide ku mirov dikarin bi siyaseta demokratîk bi pêş de herin û her du alî, an ku xwedîyên daxwazan û yên ku bersiva wan daxwazan dide, hêzdartir dike. Heger daxwaz neyên bi cih anîn jî, yên ku daxwaz kirine malê girseyî bihêz dibin, yên ku red kirine jî qels dibin.

A duyem, **derfeta ji holê rakirina çekan dide.** Tiştê ku dikare li ser çiyan were gotin heger li deştan jî bikaribe bê gotin û ji bo wê çalakî werin li dar xistin, ev yek dikare rê li ber danîna çekan veke.

Raperîna sîvîl, cureyeke çalakîyê ye ku ji alîyê cîhana demokratîk ve meşrû tê dîtin. Heger PKK/BDP di çarçoveya çalakîyên aştîyane de bimînin, dikarin daxwazên xwe yên herî radîkal jî bi dengekî bilind biqîrin û jê girîngtir dikarin him ji raya giştî ya demokratîk a Tirkîyeyê, him jî ji ya Rojava bistînin. Heger derfet û piştgirîyeke weha hebe, bikaranîna çekan dê ne bi kêrî PKKê, ne jî bi kêrî BDPê were. Kampanyaya raperîna sîvîl, ji alîyekî ve xwedî wê potansîyelê ye ku hikûmê li hember raya giştî ya cîhanê bixe tengasîyê, ji alîyê din de jî bihêle ku BDP girseya xwe mobîlîze bike û zindî bigire.

Encam: Rê li ber siyasetê vekirin

Peywira herî mezin a li pêşîya siyaseta kurdî ew e ku siyaseteke weha hilberîne ku deshilat mafên kurdan nas bike û reforman li dar bixe. Divê helwêsteke weha siyasî were nîşan dan ku ne mumkin be ku maf û azadîyên kurdan tune werin hesibandin, paş de avêtin û pêşî lê were girtin. Siyaseteke weha dikare pêk were heger kurd bi çalakîyên xwe yên raperîna sîvîl li qada giştî serdest bin. Li hember çalakîyên raperîna sîvîl, ku pê him piştgirîya navxweyî, him piştgirîya derve zêdetir be, dewlet dê nikaribe helwêsta xwe ya niha berdewam bike.

Raperîna sîvîl, dikare derîyên siyaseteke rasteqîn veke. Ji bo wê jî, divê berîya her tiştî siyasetmedar bi xwe ewle bin û zora tirsa xwe bibin. Siyasetmedar, heta ku di dest tê divê di nav qada lîstîka siyasetê de bimînin û qada xwe ya tevgerînê firehtir bikin. Bi tenê wisa dikarin dîwarên ewlenebûnê hilweşînin û aştîyê ava bikin.

* Ji Fakulteya Huqûqê ya Zanîngeha Dîcleyê

Wergera ji tirkî: Celil Kaya

WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

Ayub Raoof Mahmood

Eyub Raûf Mehmûd (Ayub Raoof Mahmood) di 1985ê de li Silêmanîyeyê ji dayik bû. Di 2008ê de ji Enstîtuya Hunerên Bedew a Silêmanîyê kuta bû.

Di dema xwendekarîya xwe de beşdarî gelek çalakîyên hunerî bû. Di salên 2005-2008ê de wek perwerdekarê hunerê xebitî.

Di 2008ê de beşdarî pêşangeheke hunerê bû. Heta niha bi tevayî beşdarî 20 pêşangehên komî bûye.

Di 2007ê de sazîya **Azadî Lawan** pêşbirkek wêneyan li dar xist. **Eyub Raûf** beşdarî vê pêşbirkê bû û xelata duyem wergirt. Ev pêşbirk li Kurdistanê di vê kategorîyê de pêşbirka yekem bû.

Di 2009ê de dîsa beşdarî pêşbirka ji layê sazîya **Azadî Lawan** ve hatibû li dar xistin bû, îcar xelata yekem wergirt.

Di 2009ê de li Muzeya Netewî ya Amna Swraka pêşangeha huner a navendên cîwanî yên bajarên Silêmanî, Koye û Xaneqîn bi rê ve bir.

Eyub Raûf wek berpirsîyar û perwerdakarê Navenda Cîwanî û Huner a Silêmanîyê xebatên xwe didomîne û li dibistana seretayîyê wek mamosteyê dersa wênesazîyê dixebite.

Bo zêdetir agahdarî:

http://www.sulyon.com
http://www.facebook.com/ayub.raoof



AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 1**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 100 x 100 cm

Vegera kargehê

Pîşesazî, bingeha hêzê

Laurent Carroué *

Berî niha demeke nêzîk, sifeta kevneperestîyê bi hemû parêzvanên pîşesazîyê ve dihat zeliqandin. Lê niha, ji Parîsê ta Waşîngtonê, berbijêrên hilbijartina serokkomarîyê pesnê nûbicîhkirina berhemdarîyan didin... tevî ku wan bi xwe, yan partîya wan hişt ku derkevin. Li Fransayê, Nicolas Sarkozy têra xwe behsa karên pîşesaz dike, lê belê ew li hember bicîhbûna li Fasê ya mezintirîn kargeha Renault (dewlet hîssedara wê ye) ya ku wê erebeyên bazara ewropî çêke, bêçalak maye. Van jicîhbûnan şekil daye erd û nifûsan, wek li Seine Saint-Denis. Li Dewletên Yekbûyî, bedêla xilaskirina kargehan berbijêrkirineke civakî ye. Li gel îlankirina rabûna nirxê ya berhemên çînî, çi tê serê pîşesazîya ewropî (li jêr bixwînin)?

Tevî axaftinên li ser "civaka zewqê ya pişt-pîşesaz" ku di salên 1990 û 2000ê de bişkivîbûn, berhemdarîya pîşesaz hê jî di raxistina zemînan, çalakbarîya pergalên berhemdêr û têkilîyên îqtidarê yên ku şêwe didin globalîyê, bi roleke sereke radibe. Li navbera 1990 û 2010ê, yanî di bîst salan de, guhertinên kûr li hîyerarşîya dinyayê xwe dan der: Li hember çalakbarîya welatên di pêşketinê de û hêzên herêmî, para Ewropaya sî welatan (bîst û heft welatên Yekîtîya Ewropayê li gel Norwêc û Swîsreyê) ya di berhemdarîya dinyayî de % 36 heta % 24,5ê daket. Sala 2011ê, Çîn bû hêza endustryel a yekemîn a cîhanê û weha dawî li sedsaleke hegemonîya amerîkî anî. Di heman demê de, Brazîla ku aniha hêza aborî ya şeşemîn a dinyayê ye (1) di rêzê de da pêşîya Fransa, Koreya Başûr û Keyatîya Yekgirtî ya ku bixwe di bin metirsiya Hindistanê de ye. Ev nûraxistinên jeoaborî di çarçoveya mîmarîyeke cîhanî ya pirqûtbî de, bi çêbûna dabeşîyeke nû ya xebatê ya li cîhanê tên rave kirin. (2)

Tevgereke cografyayî ya neditî ya bazaran rû dide, ku veberanîn, kar û şûngirtinên xebatê bi xwe ve dikişîne. (3) Di navbera 1990 û 2010ê de, qazancên du sed û bîst mezintirîn fîrmayên ewropî li welatên bi pêş dikevin % 15ê gihiştine % 24ê. Lewre jî mantiqê şûngirtina şirketên transneteweyî serûbin dibe. Tevî dewambûna jişûnrabûnên li ser bingeha cudahîya fiyetên meaşan, şirket her weha hewl didin ku ji daxwazên sinifên navîn ên bajarî yên nû û deynbar re bibin bersiv, di demeke weha de ku qezencên wan ên di welatên bakur de asê mane. Bezeke bi lez a ber bi bazarên Başûr ve dest pê kir. Welatên bipêşdikevin yên mezin xwe bi aktîvîteyên erzan sînordar nakin û di beşên nirxbilindtir de cih digrin jî: Teleragihandin, pîşesazîyên fezayî û hewayî, trênên bi lez, nukleer, pîşesazîya deryayî... Ew veguhastinên teknolojîyan bi minaqeşeyên sert û dijwar bi dest dixin, hewleke girîng a fêrkarîya hêza xebata xwe derdixînin holê û şirketên transneteweyî yên çalaktir ji xwe re ava dikin û weha fîrmayên rojavayî têk dibin. Di minaqeşeyên taybet ên di navbera Hindistan û Dassaultê de ku di sibata 2012ê de ji bo firotina sed û bîst û şeş balafirên şer Rafale xuya bûbû, guftûgo hem li ser hejmara balafirên ku wê li Hindistanê ji hêla şirketa umûmî *Hindustan Aeronautics Limited* ve bên çêkirin (di qeydê de % 86), hem jî li ser veguhastinên teknolojîyên destûrdayî û berdêlên aborî û fînansî bû.

Çîn yekemîn wergira cîhanî ya patentan: Ji *"made in China"* bo *"designed in China"*

Cografyaya cîhanî ya nûkerîyê weha serûbin dibe, wek mînaka sêalî ya çînî ya ku faktorên mirovî, fînansî û teknolojîyê dixebitîne, baş dide xuyan. Hewla mirovî: Li gel 1.15 mîlyon lêkolîneran, Çîn xwedîya potansîyeleke bi qasî % 82 qabîliyetên amerîkî û % 79 qabîliyetên Yekîtîya Ewropayê ye; Li gor *National Science Foundation* a amerîkî, ew ê heta 2025ê, % 30ê lêkolînerên cihanê li Çînê bin. Hewla fînansî: 2009ê, Pekînê ji bo cara pêşî budceyeke lêkolînê ya weha mezin xuya kir ku wê derdixe rêza duyemîn a dinyayê, hîn dûrî Dewletên Yekbûyî, lê li pêşîya Japonyayê. (4) Dawîyê, hewla teknolojîyê: 2011ê, Çîn bûye yekemîn wergira cihanî ya patentan, bi saya stratejîyeke neteweyî ya ku dixwaze ji *"made in China"* ("li Çînê çêbuyî") derbasî *"designed in China"* ("li Çînê sazbûyî") bibe. Bandora wê bêsînor e û zemînên nû yên reqabeta rasterast vedike. 23ê kanûna 2011ê, fîrmaya *China Three Gorges* (CTG) –bi navê bendava hîdroelektrîk a meşhûr a li ser **Yangzi Jiangê**– % 21.3ê sermayeya şirketa ceyranî ya *Energias de Portugal* (EDP, emsala Ceyrana Fransayê) bi dest xist, ku ji bo têkoşîna li dij deynê giştî hatibû ferdî kirin. Wê ev bazar ji destên şirketa almanî ***Eon*** û ya brazîlî ***Electrobras*** bi mîqdareke 2.7 mîlyar euroyan stend, lewra bihayekî serê hîseyê % 50ê zêdetirê rêçûna wê ya borsayê pêşnîyaz kir. Çîn jixwe nîvê berhemdarîya cîhanî ya lewhayên enerjîya rojê yên fotovoltaîk çêdike û weha sazkerên rojavayî dixe tengasîyê, çawa ku birina iflasê ya ***Solon*** û ***Solar Millenium*** ên almanî a kanûna sala 2011ê nîşan dide. Ew xwedîya parka cihanî ya tûrbînên bayî ya yekemîn e; ev park jî dê heta 2020ê bi 4.7 caran zêde bibe. Di vê paşxanê de, têkçûna stratejîyên YEyê û korbûna elîtên siyasî û aborî yên ewropî mirovî matmayî dihêlin, dema ku Çînê heta bi rêza yekemîn a pîşesazîya cihanî bilind bû, şokeke mezin li Dewletên Yekbûyî pêk anî. (5) Dîsa jî divê Yekîtîya Ewropayê û Fransa bi lezûbez der barê paşeroja xwe ya pîşesazî, zanyarî û teknolojîk de bifikirin. Li Yekîtîya ku, dawîya 2011ê, 23.8 mîlyon karxwaz dihewandin, bêkarî û binkarî li hev zêde dibin. Krîz bûye sedema herifîneke % 20 ya di du salan de (li nav 2007 û 2009ê) ya nirxa berhemdarîya pîşesazîya li Yekîtîya Ewropayê. Ev paşveçûn % 15 li Ewropaya navîn û rojhilat, digihîje heta bi sêyêkê li Estonyayê û çarêkê li Letonyayê û li Almanyayê % 20 zêdetir e (% 21.4), Îtalya, Finland an jî Swedê. Ji destpêka krîzê, payîza 2008ê, heta dawîya 2010ê, Yekîtîyê bêhtirî çar mîlyon karên pîşesazîyê winda kirin, yanî % 11ê karkerên xwe. Li sêmehîya sêyem a 2011ê, ji bilî li Almanyayê, cihê van windahîyan hîn nehatibû dagirtin. Rawestana aborî ya cidî ku wê di 2012-2014ê de ji ber planên siyaseta aborî ya dijwar ên pir mezin rû bide, wê bi tenê vê xirabçûnê xirabtir bike.

Di navbera 1989 û 2011ê de, li Fransayê 2.5 mîlyon karên pîşesazîyê winda bûn

Ji çar welatên mezin ên devera Euroyê, Fransa yê herî ji pîşesazîyê bûyî ye (sê welatên din jî Almanya, Îspanya û Îtalya ne); di navbera 1980 û 2011ê, karên pîşesazîyê ji % 24ê tevahîya karan daketin % 13ê wan. Sedemên vê herifîna giran mijarên nîqaşê ne. Weha tê hesibandin ku ji 1980ê û pê ve, çarêkeke xirabûnê ji ber guherînên pergala berhemdar û vederkirina zêdebûyî ya xebatên pîşesaz ber bi xizmetdarîyan, wek mînak bikaranîna karê demkî çêbû. Hin xebatên sazkirin, tamîrkirin û heta sekretaryayê jî weha wek xizmetan tên hesibandin, tevî ku, berê ew para berhemdarîyê bûn. (6) Divê kêmbûna xebatkaran a bi qezencên berhemdarîyê ve girêdayî jî lê bê zêde kirin, ku nêzîkî % 30ê tevahîyê ye. (7) Lê belê, ne rast e ku em çavên xwe li ber meşa fransî ya dûr û dirêj û endîşedêr a ber bi ji pîşesazîyê bûnê ve bigrin, Krîz vê yekê bi tenê bi leztir dike. Nîşanên pirhejmar şahidên vê yekê ne, weke paşketina veberanînê, di navbera 2008ê û 2010ê ji % 10 daket, yan jî hilfirîna lihevderneketina budceya ticarî ji 2004ê û vir ve. Hêvêna pevguhastinên pîşesazîyê ji bo çi bigire hemû berheman neyînî ye, ji xeynî berhemên cotyarî-xurekî. Ji bo tevahîya berhemên pîşesazîyê, îxracat bi tenê % 87 yê îtxalatan dadigrin, % 73 ji bo mal û milkên danûstandinê û % 87 ji bo mal û milkên techîzatê. Van pênc salên dawîyê, lihevderneketina budceyê ya li ser hev digihîje 113.6 mîlyar euroyan, nemaze li gel Çîn û Almanyayê. Tevî windabûna noqteyên zeîf, noqteyên xurt diherifin: Fransa parên bazara îxracatê li Ewropa û dinyayê ji dest dide û nikare bersiva pêwîstîyên xwe yên neteweyî bide. Di navbeyna 2008 û 2010ê de, paşketina nirxa berhemdarîya fransî di hemû beşan de zerarê (ji bilî beşa sergo, av û paqijkirina haweyê). Ew di rafîne û kokefaksîyonê de digihîje % 28ê, di tekstîlê de % 26ê, di metalurji, mekanîk, înformatîk, optîk û elektronîkê de ji % 15 heta % 20ê, di van beşan de girtinên sîteyên pîşesazîyê li pey hev rû didin. Di navbera 1989 û 2011ê, pîşesazîya fransî weha 2.5 mîlyon kar winda kirin. Ne surprîz bû ku ev daketin zirar û ziyanê dike li pîşesazîya giran û ya ku hêza xebatê ya nekuwalîfeyan dixebitîne. Lê belê, ev paşketin her weha pîşesazîyên nûker, an jî stratejîk, yên weke techîzat an jî robotîkê, ji xwe re dike qurban.

Her weha, tevî ku ziyana herî mezin karkerên nekuwalîfîye dît, bi kêmbûneke 671 000 karan (- % 55), 182 000 dewsên karkerên kuwalîfîye û 74 000 dewsên muhendis, kadro û teknîsyenan jî ji holê rabûn. Cotmeha 2011ê, ***Peugeot SA*** xuya kir ku ew ê 6 000 karan ji holê rake, 1 900 di berhemdarîyê de û 3 100 di xizmetdarîyê de, bi taybetî li qutba lêkolîn-sazkirin; 3 000 karkerên nerasterast û demkî ji kar tên avêtin. Li derve hin kevnemîrasên golîst ên ji salên 1960-1970ê mayî (pîşesazîyên hewayî û fezayî, sîlah, nukleer) û lawaz, her weke cotyarî-xwurekî, esasa pîşesazî û teknolojî ya neteweyî ji hev dibe, bêyî ku nûbûneke bi heybet di sê yan çar dehsalên bihurî de dabûyana dest pê kirin. Lewre mirovî matmayî nahêle ku ji pîşesazîyê bûn bûbe mijareke sereke ya hilbijartinên serokkomarîyê yên bê, hem li Fransayê û hem jî li Amerîkayê. Ji çepa tundrew ber bi rasta tundrew û di ber **François Hollande** û **Nicolas Sarkozy** re, namzedek tuneye ku behsa wê nekiribe. Li du Meclîsên Giştî yên pîşesazîyê yên 2010ê, wezîrê berpirsê vê meselê, **Eric Besson**, "alîkarîya jinûve pîşesazîbûnê" dixe dewrê ya ku riya wergirtina avansên di sê salan de tên vegerandin li ber şirketên piçûk û navîn (ŞPN) vedike, tevî vê jî ***Fona Stratejîk a Fransî*** (FSF) da zanîn ku hin sermayeyên di ŞPNên weke stratejîk hesibandî de bi dest xistine. Lê belê, mesafeya li nav van biryar, an jî daxuyanî û pirsên bingehîn, berbiçav e.

Berdêla çekdanîna îdeolojîk, siyasî û aborî giran e

Komîsyona Brukselê û hikûmetên neteweyî yên van sê dehsalên dawîn, li pey hev ketî xwedîyên berpirsîyarîyeke rasterast in; hem ji bo înşakirin, hem jî ji bo herifîna rejîma komkirina fînansî li hêlekê û mekanîzmaya ji pîşesazîyê bûna Yekîtîyê li hêla din: Ev jî du alîyên krîzeke pergalî ne. Stratejîya Lîzbonê ya li 2000ê tarîfbûyî tam leylanek e. Armanca wê ya tu caran negihandî ev bû ku her dewletek wê % 3ê Hilberîna Nesafî ya Neteweyî (HNN) a xwe ji bo lêkolîn-sazkirin û nûkerîyê veqetîne. Bingeha vê yekê jî pergaleke temsilîyeta îdeolojîk a li dora eksena "aborîya zanyarîyê" sazkirî bû, ku diviya şûna berhemdarîya materyalê bigre. Lê belê, ev têgeh bûye awayekî rewakirina devjêberdana alîyên tevahî yên pîşesazîya fransî û ewropî, bi navê bisporbûneke navneteweyî ya xebatê ku teknolojî û beşên herî pêşketî ji bo Yekîtîya Ewropayê veqetand. Li gel vê, nûbelavkirina sermayeyê ya navneteweyî, fînansîbûneke her zêde dibe û birêvebirina demkurtî ya hiseyên pîşesaz, xirabûna têkilîya kar û sermayeyê di belavkirina dewlemendîyan de, redkirina domdar û pergalî ya hemû siyasetên pîşesaz ên ewropî û neteweyî ji ber dogmaya reqabeta azad çêbûn. Berdêla vê çekdanîna îdeolojîk, siyasî û aborî giran e: Di navbera 2000 û 2010ê, HNN a serê niştecihî bi tenê % 0.9 li YEyê zêde bû û % 0.5 li Fransayê, yanî li gor aborîyên pîşesaz ên din rêjeyeke pir zayîf. Ewropa û Fransa weha li nav welatên bi pêş dikevin û welatên mezin dibin, asê dimînin, ev welatên mezin dibin wê panzdeh salan bi şûn ve, di beşên heta niha ji reqabetê parastî mayî de jî bibin reqîbên wan. Ji 1998ê heta 2008ê, giranîya welatên fiyatên nizim ên berhemdarîyê di îtxalata mal û milkên sazkirî yên devera euroyê de ji % 17ê gihişte % 44ê. (8)

Divê em binxêz bikin ku windahîya reqabetbarîya Fransayê bi tenê bi fiyata kar sînordar nabe. Ji bo analîzeke ciddî, divê zexta ji ber siyaseta euroya xurt çêbûyî, reqabetbarîya bi kalîteya

Ayub Raoof Mahmood: **Bênav 13**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 25 x 25 cm

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 6**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 60 x 90 cm

fêrkarîyê, raxistina kar, cihê lêkolîn û nûkerîyê, taybetmendîyên pergala berhemdêr û derxistinên sermayeyê [paredayîna faîzan, hwd.] ve girêdayî hemû jî bên hesibandin. Lewre ku fiyata seatî ya kar di 2008ê de -sala dawî ya miqayeseyê ku li ber destan e- di pîşesazîya sazker a fransî de nizimtir (33.16 euroyan) bû ji ya almanî (33.37 euroyan). Lê belê berhemdêrîya serê kes li Fransayê li gor welatên din ên Ewropayê, pir mezin e: % 21 ji navincîya Yekîtîyê 27 bilindtir û % 15 ji ya Almanyayê bilindtir. Ji ber vê yekê, stratejîya pergalî ya nizimkirina domdar a buhayê kar bê encam e. Lewre ku Almanya ji bo hemû tiştan di minaqeşeya fransî de tê werdan, divê hin rastî bên dubare kirin. Serkeftina almanî li ser esasê stratejîyeke pîşesaz a xurt (% 20 a HNNê û % 19 a kar) çêdibe, ku ev stratejî her wiha li ser nûkerî, bilindbûna nirxa berheman û bisporîya di aktîvîteyên sereke yên li dor mal û milkên techîzata sîvîl sazbûyî de, qûmaşeke berhemdêr a ku fîrmayên mezin *(Konzerne)* û caweke bi hêz a şirketên piçûk û naverast ên nûker û îxracatbar *(Mittelstand)* bi hev ve girêdide.

Tevî krîzê jî, bêkarîya resmî li Almanyayê di nizimtirîn noqteya xwe ya bîst salan de ye

Eger em li pêşketinên bîst salan binihêrin, xuya ye ku Fransa bi navincî xwedîya % 73.5 a HHB a almanî ye, lê belê nirxa berhemdarîya wê ya pîşesaz xwerû % 42 û ya îxracatên wê yên mal û milkan digihîhîje % 52yê. Encamên van tercihên stratejîk berbiçav in: Tevî krîzê jî, bêkarîya resmî li Almanyayê di nizimtirîn noqteya xwe ya bîst salan de ye (% 6.8). 2011ê, mezinbûn % 3 bû û rê da kêmkirina lihevderneketina budceya giştî ji bo % 1 a HNNê. 535 000 karên dema tam çêbûn û veberanîna di mal û milkên techîzatê de % 8.3 bilind bû. Ev rewşa baş a aborîya alman bi sedema zêdebûneke % 8.2 ya îxracatan rave dibe, bi taybetî ber bi wan welatan ve ku mezin dibin yên weke Çîna ku pêkan e sê salan bi şûn ve wê bibe hevkara wê ya ticarî ya yekemîn.

Rast e ku *Konzerne* ber bi bîyanistanê, bi taybetî ber bi Ewropaya Navendî û Rojhilatî ve, beşeke mekanîzmaya wan a berhemdêr (otomobîl, mekanîk...) veguhast. Di navbera 1998 û 2012ê de, para îtxalatên mal û milkên navbeyn di nirxa lêzêdekirî ya pîşesazîyê de ji % 33yê derbasî % 59ê bûye (li Fransayê, ji % 50yê gihişte % 80yê). (9) Lê belê, *Konzerne* kontrola parçe û fonksîyonên herî stratejîk di bin destên xwe de girtin û ya herî girîng, bê rawestîyan modernkirina mekanîzmaya xwe ya pîşesaz li Almanyayê jî domand da ku ji daxwazên nû yên cîhanî re bibe bersiv.

Lawazîyên kapîtalîzma fransî ji çil salan û vir de tên zanîn: Têr pîşesaznebûn (% 12 ê HNNê û % 11ê kar), kêmbûna lêkolîn-sazkirina ferdî û pîşesaz, dewsgirtina nirxa navîn ji bo berheman, tepisandin û talankirina tevnê ŞPNyan ji hêla fîrmayên mezin ve -yên ku îxracatê dikin ji yên Almanyayê sê caran kêmtir in-, kêmbûna fêrkarîya seretayî û domdar, di pergala temsîlîyetên civakî de têr kuwalîfîye nebûna teknolojîk an zanyarî... Reqabetnebarîya fransî bi taybetî ji ber kêmbûna veberanîna pîşesazker û beşa taybet di lêkolînê de çêdibe. Hewla wan ji çarêke faîzên net ên li 2008ê dayî zêde nabe, li hember % 35 li 1995ê. (10) Li 2010ê, ev bi tenê digihîje % 57 a hewla fînansî ya fîrmayên almanî.

Derketina ji krîzê çawa mimkun e?

Tevî stratejîya Lîzbonê ku zêdebûna bo % 40 a kesên nav 30 û 34 salî yên xwedîyên dîplomayeke dibistana dawîn pêş didît, % 46 a fransîyên nav 25 û 45 salî bi tenê xwedîyên dîplomaya dibistana navîn, an bê dîploma ne. Dawîyê, pergala berhemdêr a fransî her weha di rêvebirina stratejîyên pîşesaz de dibe qurbana hegemonya parametrên fînansîbûyî, lewre ku veberhênerên fînansî talîyê bûne biryardêrên tercihên stratejîk. Li hember van pêwîstîyên xurt û van acilîyetan, divê Yekîtîya Ewropayê û Fransa li modela xwe ya pêşketinê bi temamî ji nû ve bifikirin û pergala bankayî û fînansî li rola xwe ya esasî vegerînin: Fînansekirina mezinbûneke aborî, civakî û zemînî ya bikêr, mayînde û bi destbiratî. Li ser nifşekê, yanî li ser sî salan, divê şoreşeke pîşesaz û berhemdêr bidin dest pê kirin. Qûtbûna teknîkî û teknolojîkî divê li gor ya dawîya sedsala 19ê bibe. Armanc ev e ku sînoreke biryardêr di aktîvîteyên paşerojê de derbas bibin, da ku bigihêjin hedefên ewropî û cîhanî yên sedsala 21ê. Divê bi bîr were xistin ku, heta 2030ê, wê nifûsa dinyayê bi 1.4 mîlyar niştecihan zêde bibe û nifûsa kardar a cîhanî wê heta 2020ê du caran zêde bibe. Tevabûna modela amerîkî ya danûstandinê li dinyaya bi giştî têk çûye. Nîqaşeke li ser siyasetên ewropî û neteweyî yên nûpîşesazbûn ên îradedar mecbûr e, li gel hewleke demdirêj a nûkerî, lêkolîna esasî û çêkirî, fêrkarî û kuwalîfîyekirina hêza xebatê. Ji bo vê yekê, divê Fransa 4 an 5 noqteyên HNNê yên zêde bixe dewrê, hewleke pêwîst û ragirbar a 100 mîlyar euroyan.

Derketina ji qeyranê bi tenê li gel pêşxistina modeleke nû ya pêşketinê di çarçoveya modeleke mezinbûna mayînde de li zemînê neteweyî û ewropî çêdibe. Ev jî tê maneya nûxistina dewrê ya dewleteke stratej a ku biryara siyasetên pîşesaz û veberanînên demdirêj dide, nûrêvebirin û nûberadana beşa fînansî û bankayî ber bi veberanînên berhemdar, nûbinirxbûna potansîyela mirovî û nûkerî, derketina holê ya bisporîyên nû li dor xurtkirineke pêşkêşîya arzê li ser bingeha berhem û berhemdarên nû. Di vê çarçoveyê de û tevî zehmetîyên heyî, Fransa û Yekîtîya Ewropayê xwedîyên xusûsiyetên pirhejmar in. (11) Wek mînak, di enerjîyê de, di navbera arz û daxwazê de nehevsengîyên zêde dibin, zêdebûna tevnî ya bihayên maddeyên xam li dema navîn û dema dirêj û misogerkirina tedarîkkirina zêdebûneke nedîtî ya xurtîya enerjîyê, bikaranîneke aqilanetir û ekonomîktir a serêkanîyên enerjî û maddeyî (tevakirina beşên nûbikaranînê), xistina dewrê ya enerjîyên nû û qûtbûneke teknolojîk di nukleerê de (reaktorên nukleer ên nifşa nû, birêvebirina sergoyên radiyoaktîv ên pir çalak û demdirêj) li ser me ferz dike. Li hemberî zêdebûna pêwîstîyên xurekî yên cîhanî (% 50 heta 2025ê), hedefên ji bo berhemdarîya bêhtir û baştir, tevî bersivdana pêwîstîyên jîngehî, tenduristî û civakî û li gel ewlehîya xurekî pirhejmar in. Dawîyê, pêşxistina zemînên beşî yên nû li gel teknolojîyên ekolojîk, enerjîyên bêkarbon û zeft û stokkirina CO_2ê vedike, her weke bîyoteknolojî û zanyarîyên zindî, kîmyaya gulûgîyayî, materyalên nû, nanoteknolojî, zanyarîyên zihnî û teknolojîyên komputerî yên nû. Ev jî hemû riyên şoreşeke nû ya berhemdar in.

* Birêveberê lêkolînê li Enstîtûya Fransî ya Jeosiyasetê (IFG, Paris 8).

1 Rêzkirina Navneteweyî ya Center for Economics and Business Research (CEBR) a Londonê, kanûn 2011

2 "World manufacturing production 2010" ("Berhemdarîya sazkirina dinyayî 2010"), IHS Global Insight, www.ihs.com

3 Bixwînin "Crise et basculements du monde : enjeux géopolitiques, géoéconomiques et géostratégiques/Krîz û li ber bê ketine dinyayê: Qebûyên jeopolîtîk, jeoaborî û jeostratejîk", *Revue Historiens et Géographes*, hjm. 416, çirîya paşînr-kanûn 2011

4 Texmînên Rapora li ser siyasetên neteweyî yên lêkolînê û fêrkarîya jorîn, pêveke projeya qanûna fînansî ya 2012ê, Parîs

5 *Bnr.* "The case for a national manufacturing strategy", *The Information Technology and Innovation Foundation*, Waşîngton, nîsan 2011; "Report to the President. Ensuring American leadership in advanced manufacturing", Executive Office of **PCAST**, 2011

6 Destgehên nepîşesaz % 36 karên pîşesaz dixebitînin, li hemberî % 26ê bîst û pênc sal berîya niha

7 "Le recul de l'emploi industriel en France de 1980 à 2007: quelle est la réalité ?/Kêmbûna karê pîşesaz li Fransayê ji 1980yê heta 2007ê", *Lettre Trésor-Eco*, hjm. 77, Parîs, îlon 2010

8 *Lettre Trésor-Eco*, hjm. 95, çirîya paşîn 2011

9 *Flash Eco*, Natixis, hjm. 32, Parîs, çile 2012

10 "Rapport annuel sur l'Etat de la France en 2011/ Rapora salane li ser dewleta Fransayê sala 2011ê", Conseil économique, social et environnemental (CESE), Parîs, 23 çirîya paşîn 2011

11 *Bnr.* "France 2030 : cinq scénarios de croissance/ Franse 2030: Pênc senaryoyên mezinbûna aborî", Centre d'analyse stratégique, Parîs, nîsan 2011 û " La compétitivité: enjeu d'un nouveau modèle de développement", CESE, çirîya pêşîn 2011

Wergera ji fransî: Simko Destan

Heyranîya nûbicîhbûnan ji ber çi ye?

GÉRARD DUMÉNIL û DOMINIQUE LÉVY *

Rabûna otomobîla amerîkî, îxracatên pîşesazîya almanî; xuyabûna nûbicîhbûna yekîneyên berhemdarîyê... Lê rastîyên nexweşik ji paş axaftinan derdikevin holê.

Dirêjbûna alozîya vekirî ya sala 2008ê mijarek deranî rêza pêşî ya guftûgoyên di rojevê de: Ji pîşesazîyê kirina welatan ku "navenda" pergala cîhanê ne. (Dewletên Yekbûyî û yên Ewropî). Serokê amerîkî **Barack Obama**, ku gav davêje nav sala hilbijartinê, ev pirsgirêk weke yek ji xetên sereke yên kampanyayê hilbijart (li gel têkoşîna li dijî pîşesazîya diravî ya berpirsîyar ji yekem beşa buhranê û pirsgirêka neyeksanîyan). (1) Di vê navberê de peyveke xwe da xuya kirin: "**insourcing**" (2), sîmetrîka **outsourcing**, ango taşeronî. Fikra giştî ew e ku hilberîna pîşesazîyê li qada neteweyî were ragirtin; ev yek li Fransayê herwiha weke "vexwecihîkirin (relocalisation)" tê bi nav kirin.

Piştî tevgereke tund a hilberîna ber bi welatên cîran û derdorê, zehmet e mirov gumanê bide ser pêwistîya lezgîn a vegereke pîşesazîyê. Mirov dikare derfeta daxistina rêjeya betalîyê bibîne û leza hilweşîna aborîyên navendê –nîsbeten– kêm bike, lê belê herwiha mirov dikare xwe ji ber bêdengeyîyên bazirganîya derve jî bide alî. Û pêkanînên wisa dibin xwedî girîngîyeke taybet di rewşa îro ya buhrana deynên dewletan de, lewre dezgehên diravî yên navneteweyî (weke "bazaran" jî tên bi nav kirin) berî hertiştî liserhevhatina du valahîyan bêceza nahêlin: Ya butçeyê û ya bazirganîya derveyî.

Pêşîwêwerebîramekubêpîşesazîkirin pêvajoyeke giştîtir û kevintir e ji derxwecihîkirinê (délocalisation). Ji bo aborîyên navendê, gavavêtina nav neolîberalîzmê, di dirêjahîya salên 1980yê de, nehate wateya jihevqutbûneke kokdar. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, pîşesazîya destkarîyê ya ku di salên 1960ê de ji sedî 26ê hilberîna hundirîn ya grûz pêk dianî, di salên 1980yê de daket ji sedî 19ê, di sala 2007ê de jî ket heta asta ji sedî 11ê, tam berîya ku ev buhrana dawî rû bide. Hejmarên di vî warî de li Fransayê jî kêm zêde eynî ne, li Almanyayê hinek bilindtir bin jî, lezên wan ên daketinê xwedî heman çap û astê ne. (3) Tê zanîn ku meylên wisa dibin neynik ji bo guherîneke demdirêj a berxwurîya ku ji bo sektora xizmetan bi feyde bû, (binêrin li nivîsara Laurent Carroué ya li rûpel XX). Derxwecihîkirina hilberîna ber bi herêmên din ên cîhanê jî, bi rêjeyeke bilind mohra xwe li cîhanîbûna neolîberal dide.

Stratejîyeke pîşesazîya neqandî bi destê şirketên mezin ên ku bûn pirên navneteweyî, di pêvajoya dehan salan de bû dîyaredeyeke dîyarker. Rewşa amerîkî rave dike ka çawa stratejîya wê wek ya herî berbiçav dixebite: Bi rêya sermayedanîna rasterast li derve, ango kirîn, an jî afirandina şaxên şirketan li welatên din.

Di herikîna salên 1970yê de, li berbanga gavavêtina nav neolîberalîzmê, sermayedanînên rasterast li deverên din ên cîhanê yên şirketên ne-diravî yên amerîkî, li dewletên yekbûyî ji sedî 23yê sermayedanînên fîzîkî yên safî pêk tanîn, bi taybetî di qadên înşaet û malzemeyan de (binêrin li grafîka XX). Pêvajoya dehsalên berîya buhranê (salên navbera 1998-2007), ev rêje hilkişîya ji sedî 81ê û bû nîşaneyeke ji bo vîneke biryardar a hilberîna li deverên din ên wêdetirî xaka neteweyî. Gelo **Obama** wê bikaribe yekser dijberîya şirketên wêdetirî-neteweyî bike û zextê li wan bike da ku dawî li vê stratejîyê bînin?

Di rewşa heyî de li welatên derdorê, maliyeta meaşên karkeran serê yekeya hilberandî bi lezûbez bilind dibe û çi maye bigihe ya Amerîkayê. Serokê amerîkî ev lihevgihîştina maliyeta hilberînê qebûl dike û bilindbûna bihayê mûçeyan serê saetê, weke sedem nîşan dide.

Jinûve binirxbûna pereyê Çînê jî sedemeke din e. Lê belê ev livûtevger herwiha bi daketina heman maliyetên li Dewletên Yekbûyî ve jî girêdayî ye û vê yekê kir ku şirketên ku li derveyî welêt dişuxilîn, vegerin hin eyaletên Amerîkayê (li Karolîna Başûr, li Alabamayê, an jî zêdetir li Tenesseyê) (4).. Buhranê, bi tenê lez da vê meylê û pêkanîna pêşbazîyekê di navbera xebatkarên welatên navendê û yên welatên cîran û derdor, niha xêzek datîne binê "serkeftina" stratejîya neolîberal.

Berhemdarîya otomobîla amerîkî? Başbûneke bê mucîze

Ji nû ve xwecihîkirina şirketan ku serok îdîa dike ku nirxeke pir mezin didê, wê bêguman ji bo qabiliyeta bikaranînê baştir bûya. Şirketên wêdetirîneteweyî wê hingê neketana nav hewldanên pêkanînê (ji bilî hewldana bi hişmendî haydarbûna ji vê realîteyê!). Ji ber ku destekdayîna ji bo vê tevgerê, bi taybetî jî bi daxistina bacan ji bo feydeya şirketên ku li ser xaka neteweyî sermayê datînin, wê hukûmet wezîfeya xwe bi cih bîne..

Çileya derbasbûyî, Obama di gotara xwe ya der barê rewşa yekîtîyê de, plana xwe ya ji bo *"Amerîkayeke li ser hîmê berdewambûnê sazkirî"* pêşkêş dikir û piştrast dikir ku *"pîşesazîya otomobîlan a amerîkî vegerîyaye welêt"*. Bi rastî jî, hilberîna otomobîlan li nav welêt li berbanga buhrana aborî di sala 2007ê de eger weke 100 were qebûl kirin, ev hejmar di hezîrana sala 2009ê de daketiye 48ê: Hilweşîneke ku dikare bibe sedem ku ev war nema bikaribe pişta xwe rast bike. Di kanûna sala 2011ê de hema piştî jinûve fînansekirineke tund a ji alîyê hukûmetê ve, vê qadê ji nû ve xwe hilkişand asta 84ê. Bêguman wê xwe rizgar kir, lê dîsa jî hesabê wê yê malê û sûkê dûrî hev in. Pîşesazîyên din hê di rewşeke xirabtir de ne jî; hin ên din jî, yên elektronîk, bi awayekî baştir xwe li ser piyan girtin. Ji bo tevahîya qada destkarîyê, heman pêlpêlok di hezîrana sala 2009ê de dikeve heta 80yê û di kanûna sala 2011ê de jî ji nû ve hildikişe 93yê. Ev sererastbûnek e, helbet; lê belê ne mucîzeyek e. Qîrînên serkeftinê yên ji bo sererastbûna pîşesazîya otomobîlan li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), ku di demên hilbijartinan de pir maqûl in, dikarin rê li zayînên zû û hetta, zêde xwepêşbîn vekin.

Eger em bên ser dîmenên ji Ewrûpayê, ev meylên heyî dihêlin ku em performansên aborîyên alman û fransî bidin ber hev. Tevî pêşbazîya welatên cîran jî, wisa tê gotin ku Almanyayê mûmkinbûna biîstîqrariya globalbûneke neolîberal îspat kir.

Fransa weke ku wê hinek li paş bimîne. Lê belê heta ku berdêla vê yekê neyê hesibandin, mirov nikare performansên pîşesazîyê yên almanan baş binirxîne û der barê wan de bigihîje qenaetekê. Gelo ma jixwe pêwist e mirov bikeve ser rêyên wisa?

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 12**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 25 x 25 cm

Sala 2003yê mohra xwe li şikestin û qutbûnekê da. Berîya vê demê û ji salên 1960ê ve, rêgehên pîşesazîyî yên Almanya û Fransayê pir nêzî hev û wekhev bûn; ji sala 2003yê ve ferqa mezinbûna navbera her du pîşesazîyan her çû kûrtir bû. Di navbera sala 2003 û destpêka buhranê, sala 2007ê de, hilberîna pîşesazîya fransî bi tenê ji sedî 4 hilkişîya, li himberî vê yekê ya almanan gihîşt ji sedî 20ê. Lê belê divê hema bi lez were gotin ku li vir em, bi tenê, behsa mezinbûna qada pîşesazîyî dikin.

Tevî tiştên di vî warî de medya îdîa dike jî, aborîya almanan ji ya fransî pir bileztir bi pêş nakeve: Di heman pêvajoyê de, hilberîna hundirîn a grûz a her du welatan hema hema bi heman lezê bilind bûn (binêrin li grafîka XXX). Bes e ku mirov berê xwe bide Japonyayaya ku stratejîya wê ya pîşesazîyî, bi pêşketina mezin a hilberîna pîşesazîyî (ji sedî 18ê, ji bo heman perîyoda 2003-2007) ya Almanyayê tîne bîra mirov, lê belê aborîya wê li ser rêgeheke dirêj rawestîyayî maye.

Hejmara karkerên xizan ên Almanyayê her di zêdebûnê de ye

Li vê derê mirov dîsa rastî pirsgirêka heqdestan tê. Çerxeke bingehîn, li Almanyayê jî, li ser malîyetên karmendan bû zexteke berbiçav (heqdest û berdêlên ji bo pêdivîyên civakî). Ew bi taybetî li ser heqdestên nizim pir dijwar bû, tund bû. Piranîya kedkarên ku weke "xwedî heqdestên nizm" tên qebûl kirin li vî welatî, bi hejmara xwe her diçe zêde dibin, bi taybetî jî ji dawîya salên 1990ê ve û ev yek bi xwe re parçebûna karmendan tîne (5) –divê li van guherînan, bilindbûna berbiçav a hejmara karkerên "serbixwe" yên li Almanyayê, ku formeke din a parçekirinê û ziravkirina misogerîya kar e, were zêde kirin. Prîmên beşa civakî bi rêjeyeke mezin tam di berbanga buhranê de hatin daxistin. Fransa bi xwe jî kete bin tesîra sistbûna mezinbûna lêçûnên heqdestî, lê belê bi rêjeyên piçûktir: Maliyeta heqdestê reel a navincî (6) hilkişîya %3.5ê, tevî ku ev maliyet li Almanyayê di navbera salên 2003-2007ê de % 1.5 dadiket.

Li Almanyayê ev zext li bikaranîna belav a taşeronîya ji bo şirketên bîyanî zêdebû, di nav wan de taşeronîya ji bo şirketên Ewropaya Navîn hene. Berevajî, li Fransayê ji destpêka salên 1990ê ve, şirketên mezin opsîyonên pir dişibin yên li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ecibandin: Sermayedanîna rasterast li welatên bîyanî. Dibe ku hûn bibêjin, çawa be encam eynî ye, lê belê zîvirandina çerxa pîşesazîya almanî nîşan dide ku ev yek wisa nameşe: Ev stratejî dike ku navenda hilberînê li ser xaka netewî bimîne. Ew, bi her halî, bi mezinahîya kara bazirganîya derve re têkildar bû. Ji 2003yê ve, gava veqetîna rêgehan di navbera her du aborîyan de îsbat bû, mezinbûna kara almanan zêde bilind bû (heta % 7ê hilberîna hundirîn a grûz), di heman demê de valahîya butçeyî ya Fransayê di asteke maqûl de kûr dibû (%2 heman sal). Livûtevger wisa bi tesîr bû ku mezinahîya kara bazirganîya derve ya fransî di zikhev de ji ya Almanyayê ya salên 1990ê (li Fransayê 1,2%, li Almanyayê 0,5%) bilindtir bû.

Cihêrengîyaezmûnênneteweyîçidibe bila bibe, pêvajoyên bêpîşesazîkirin û vepîşesazîkirinê her du jî divê weke bangêrên çerxên neolîberal bên fêm kirin. Bêpîşesazîkirin, ango, derxwecihîkirina hilberînê, bû berhema vê nîzama civakî, îfadeya kirasekî jihev-veqetîna navbera berjewendîyên çînên serdest ên welatên ji feydeyên bi destê şirketên wêdetirîneteweyî tên bi dest xistin, sûdê werdigirin û aborîya xakî ya welatan. Ji bo van ên dawîyê, devera ku lê vehatin pêk tên zêde ne girîng e, nîsbet bi mezinahîya feydeyan. Rewş di vê wateyê de bi qasî xuya dike, li Almanyayê baştir dihat îdare kirin, lê belê weke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), berdêldayîna karmendan pir giran bû –ji bilî karmendên giregirên şirketan bi rê ve dibin, ku hevkarîya van a bi xwedîyên şirketan re yek pêldankeke silma neolîberalîzmê ye.

Heta ku kadroyê neolîberal ê gelemperî, bi hemû pêkhênerên xwe ve (7) −hegemonyaya çînên sermayedar û ya dezgehên diravî, lihevgihandina kadroyên gerînendeyî û îdarî yên xwedî armancên neolîberal, diravîkirin û globalbûna neolîberal−,nekeve ber lêpirsînê ji alîyê tiştê ku, eger mirov li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya piştî şer bifikire, mirov dikare weke "zexteke diravî" bi nav bike, her cure hewldanên ji bo têkoşîna li dijî pêvajoya bêpîşesazîkirinê, asta serkeftina wan çi dibe bila bibe, paşketî ne û wê her wisa bimînin. Ew tişta ji bidestxistinên gel yên beriya bi deh salan ve mayî dixin ber lêpirsînê, bêyî ku ti feydeyê bidin vepêkanîna mezinbûnê û başkirina şert û mercên kar.

* Aborîzan û nivîskarên bi taybetî berhema bi navê *The Crisis of Neoliberalism* (Buhrana Neolîberalîzmê), Harvard University Press, Cambridge Massachusetts, 2011.

1 "Remarks by the President on the economy (Têbînîyên Serok li ser Aborîyê)", Qesra Spî, Washington, 4 çile 2012, www.whitehouse.gov

2 "Remarks by the President on insourcing American jobs", Qesra Spî, 11 çile 2012, www.whitehouse.gov. Carna behsa "reshoring"ê tê kirin

3 Ji 36 % (di 1960î de), ji bo Almanyaya Rojava tenê, daket %23yê

4 "Made in America, Again. Why Manufacturing Will Return to the U.S.", The Boston Consulting Group, Tebax 2011

5 Thorsten Kalina û Claudia Weinkopf, "The increase of low-wage work in Germany. An erosion of internal labour markets", International Working Party on Labor Market Segmentation, Aix-en-Provence, 5-7 tîrmeh 2007. Binêrin herwiha li nivîsa Anne Dufresne ya bi sernavê "Konsensusa Berlînê", Le Monde diplomatique, sibat 2012

6 Ev lêçûn ji alîyê daneya fiyetan a HHG (PIB-bi fransî) ve hat sererast kirin

7 Cf. Georges Duménil û Dominique Lévy, The Crisis of Neoliberalism, Harvard University Press, Cambridge Massachusetts, 2011

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Statuyek ji bo heywanan

PABLO JENSEN

Hema ku mirov behsa wan dike, hin xalên girîng yên hevdemîya me têgehên me yên herî naskirî şêlo dikin. Têkilîya di navbera mirov û heywanan de herwiha dibe sedema reaksîyonên bêjimar, ku di wan de dîmenên fîlozofî, zanistî û siyasî bi awayekî ku nema ji hev derkevin tevlihev dibin: Li ser bingeha lêpirsînê ya têgeha biesas a xwezayeke mirovî ya xwedî taybetmendîyên xusûsî, rewatîya ceribandinên li ser heywanan, an jî hîn bêtir a bikaranîna wan e, ku dikeve çarçoveya lêpirsîna me. Lêkolînên nû yên di warê etolojîyê û mijûlîyên ekolojîk de termên vê minaqeşeya kevin ji nû ve zindî kirin, weke ku du pirtûkên nû yên afirandineke berfireh jî şahidîya vê yekê dikin.

Her dem, mirov komên heywanan bi kar tînin, daku ji wan li ser civata xwe agahdarîyan werbigirin. Yê bihêztirîn li jîyanê dimîne, ev mînaka herî binavûdeng a qaîdeya bingehîn a civatî ye ku dibe sedem ku *darwînîzm* ji bo piştrastkirina sîstema aborî ya rikeber bi kar bê. Lê îro, lêkolînên hîn baldartir ên li ser meymûnan dest nîşan dikin ku alîyekî îhmalkirî, lê herwiha jî yê bingehîn ê têkilîyên wan: Empatî, ango hîskirina heyecanên hevûdin e. Xuya ye ku ev kapasîte heta bi serdemeke bi gelekî berîya ya cinsê diçe. Ew bi îhtîmaleke mezin bi guhdana dê û bavî dest pê dike, mêyên li beramberî zuriyeta xwe hestyar ji yên ku serê xwe ji zuriyeta xwe nediêşandin, bêhtir zêde dibûn.

Ev yek jî me mecbûr dike ku em têkilîyên mirovî ji nû ve di ber çavan re derbas bikin: Mirov gelek caran bawer dike ku lihevkirinek di navbera her du alîyên wek hev de heye; lê di rastîyê de, pirî caran nelihevkirin heye. Ji ber ku weke ji bo gelek guhandaran, di hemî dema jîyana mirovî de qonax hene ku mirov hewceyî/girêdayî yê din e (gava ku mirov piçûk û naşî ye, pîr an nexweş e) û berevajîya wê: Em ji bo jîyana xwe berdewam bikin, bi piranî pişta xwe bi yê din rast dikin. Ji bo **Frans de Waalî** (1), wexta wê hatiye ku mirov bi hisabkirina mesref û fêdeyên wê, dev ji fikra biryardana li ser ji rewşa nelibar derxistina kesên din berde. Hilbijartina xwezayî kapasîteya empatîyê daye guhandaran, ev jî gava mercên wê pêk bên, alîkarîya kesên din bi wan re misoger dike. Nivîskar vê yekê bi gelek mînakan nîşan dide.

Tevî ku **De Waal** me ji alîyekî ve nêzîkî heywanan dike, **Dominique Lestel** (2) ji alîyê din ve heywanan nêzîkî mirovan dike û bi vê yekê sînoran şêlî dike. Kêmasîyên pirtûkê yên naverokê di warê rexnegirîyê de hene: Ji bo destê parêzvanan pêşîn xurt bike, nivîskar her cûre argumanan derdixe pêş ku xwendevan karibin pê cilika xwe ji avê derxin. Di şerî de, mirov ji bo nezaketê, hev maçî nake. Ev yek carinan dibe sedema hin tevlihevîyan. Mirov ji vê fikra seyr a ku li gor wê, "ji ber ku tiştekî xwezayî ye, heta ku êrişeke wiha azareke pir mezin jî bidiyê, heywan dikare qebûl bike ku nêçîrvanek êrişî wê bike", tevî ku ew nikare êrişeke wiha têbigihê û ji bo wê tu maneya ceribandinên li laboratuarê jî tuneye, dikare çi bibêje? Nivîskar, gava dest nîşan dike ku tu maneya wê tuneye ku mirov bixwaze sînorekî zelal di navbera mirov û heywanan de bibîne û tu maneyeke wê yekê ya bîyolojîk jî tuneye, xwe hîn bêtir îqnaker nîşan dide. Lê pirsa bi rastî jî balkêş, bêtir dê ew zanîn be, bê çima mirov dixwaze tevî her tiştî jê re sînorekî deyne, ku ev jî bi taybetî berê mirovî dide heta avakirina hevdemîyê, ji hev cudakirina Mirovî û Xwezaya bêruh ku mirov dikare bibe efendîyê wê û bi awayekî bê ûjdan wê bi kar bîne.

Berevajîya nêrîna heywan-makîne, **Lestel** pêşniyar dike ku mirov wê weke maka subjektivîte û hesasiyetê bibîne, ew jî, ji bo ji alîyê din ve analîzeke kûrkirî ferz bike, ku derfetê bidiyê, li ser mijara dijwar a ceribandina heywanan, xwe ji helwêsta milîtantîyê pak bike, bi fikra ku çareserî ne di tercîha pratîk a roja me, yan jî reda giştî de ye, lê di afirandina cûreyekî din ê tecrûbekarîyê de ye ku êdî qet heywanan weke tiştekî nezindî nebîne. Di vî warî de, pêşniyara yek ji bavên genetîkê, **John Burdon Sanderson Haldane**yê birîtanî (3), alîgirê bîyolojîyeke "bêşidet", ku ji **Gandî** îlhamê digire, ji bo ku weke berî pêncî salan îro jî ekzotîk xuya ye, dîsa jî hêjayî minaqeşekirinê ye.

Ji ber sedemên cihê, weke dijwarîya bi hev re jîyana hirç û mîhan, selexane û laboratuar jî tirs û sawê dixin dilê mirovî, pirsên heyî siyasî ne, ji ber wê divê li vir em bi taybetî bêjin ku ravekirina berjewendîyên ku em dixwazin li ber çavan bigirin û yên ku em mafê li derve hiştina wan didin xwe, hene.

1 **Frans de Waal**, L'âge de l'empathie. Leçon de nature pour une société solidaire / *Heyama empatîyê. Ji bo civateke hevkar dersa xwezayî,* Les Liens qui libèrent, Parîs, 2010

2 **Dominique Lestel**, L'animal est l'avenir de l'homme / *Heywan siberoja mirovî ye,* Fayard, Parîs, 2010

3 **John Burdon Sanderson Haldane**, "Pour une biologie non-violente / *Ji bo bîyolojîyeke bêşidet* ", in Alliage, n° 7 û 8 "L'animal, l'homme / *Heywan, mirov", bihar-havîn 1991*, Nice, r. 191–198.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 7**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 60 x 90 cm

Piştî Fukuşîmayê

CHRISTINE BERGÉ

Teqîna santrala nukleer a Fukuşîma-Daîşîyê, piştî tsunamîya 11ê adara 2011ê, *"bi awayekî xembar û eşkere nîşan da ka çawa ji welatekî xwedî teknolojîya herî pêşketî nehat ku ji heqê felaketeke wisa derkeve".* (1) Li gor **Bernard Laponche** û **Benjamin Dessus** bi tenê dersek heye ku divê mirov ji vê yekê derxe: Divê dev ji nukleerê were berdan. Herdû nivîskar fikrên nerast ku ber bi teorîya "yan nukleer, yan jî bi mûmê razî bin" ve diçin, analîz dikin. Berî bernameyên ji bo veguhertineke enerjetîk yên biserketî û erzan, pêşgotineke nirxandina teknîkî –EPR (Reaktorên bi Zexta Mezin yên Ewropî) ne ewle! MOX [sotemenîyeke ku pêkvedayîyeke oksîdan e] bi tehlûke ye!– bi hejmarên ku tesbîtên xwe xurt dikin, tê pêşkêş kirin. Alîyên wî yên xurt ev in: Xisleta hêrêmî û terîtorîyal ya çavkanîyan (ku ji bo gelek sektoran tê maneya "şêwazekî baş ê bikaranîna enerjîyê" û bipêşketineke aborî) derdixe pêş; û lêkolîneke heft "senaryoyên enerjetîk" ku hêvîyê bi mirovan re çêdikin û di van çil salên dawîyê de hatin weşandin. NegaWatt (2006) ji van lêkolînan ya dawîyê bû û diviya versîyona wê ya nû dawîya sala 2011ê bihata weşandin. Hewqas proje hene ku mixabin hukûmeta Fransayê ehemîyetê pê nade.

Fîlosof **Gunther Anders** dibîne ku di warê siyasî û exlaqî de ji me nayê hêza bêsînor ya "azadîyê" ku ji bipêşketina teknîkî tê, kontrol bikin. (3) Wisa xuya ye ku tiştê ku wî navê *"tehlûkeya nukleer"* lê kiriye, tu bîrewerbûn pêk neanîye: *"Eger em tehlûkeyê weke tiştekî ku me elaqedar nake bifikirin, hingî em wê qebûl dikin".*

Ev yek nakokîyek be jî, em bi fîksîyonê herî zêde tiştan li ser gerdûnê fêr dibin. Di pirtûka bi navê *La centrale* (santral), (4) **Elisabeth Fithol** derîyên dinyaya ku mirov dibizdîne ya "biratîyekê" vedike, ya karkerên yekser girêdayî karên di bin tîrêjên nukleer (YGKTN) de. Ew weke koçeran in (li seranserê welat seyar dişuxilin), heta ku hew karibin karê xwe hilgirin dişuxilin, heta yek ji wan *"ji ber zengilê hewarê yê doziyommetreya* [amûreke ku asta radîyoaktîvîteyê dipîve; nota wergêr] xwe*, dev ji hevalên xwe berde û terka avahîsazîyê bike".* Sê hevalên wî ku li wir man, neçar dimînin mîqdara radîyoaktîvîteyê *"di nav xwe de parve bikin.* Ew westiyabûn û gêjbûneke rojane hîs dikin: Divê derbasî quleke çil û pênc santîmetre fereh bibin û di "qotîya avê" de ku bi qasî hucreya *Soyuz* mezin e, bişuxilin. *"Tiştê ku di pratîkê de hêsan e, di mêjîyê mirovê ku dizane di bin tîrêjên radîyoaktîf de dimîne, gelekî zehmet dibe".* Rast e ev pirtûk romanek e, lê ew di heman demê de lêkolîneke rasteqîn ya ekolojîya navxwe ya karkerên YGKTNê ye, yên ku *"xuya nakin",* di bin *"enerjîya dêw a di qutîyekê de hepiskirî, li hêvîyê ne ku qutî bişke da ku hemû hêza xwe nîşan bide".*

Ji bo **Dominîk Manotî** û DOA (nivîskarek), *"ya herî xirab hîn wê biqewime".* Polara [şêwazekî romanê] wan (5) bi kuştina karmendekî Komîserîya Enerjîya Atomîk (CEA) dest pê dike, piştre me dibe nav operasyona bidizî ya bi navê *"Baxçeyê Hesperidan"* ku tê de berpirsîyarên şerên li ser nukleerê di nav xwe de lihevkirinên ji bo taybetkirina sektora nukleer amade dikin. Gelo wê skandal û hetîketî di navbera herdû dewrên hilbijartinên serokdewletîyê de derkeve holê? Heke em bikevin pey agahîyên di nav vê fîksîyonê de, wê dosyayên gelek cidî (û reel) derkevin holê. Piştre em bala xwe didinê ku gumanên me çêbûne, em difikirin ku di jîyana bi rastî de weke di nav fîksîyonan de, dibe ku bermahîyên nukleer xwe gihandibin peravên Sîsîlyayê... Jixwe dosyaya ji alîyê *Canard enchaîné* (rojnameyeke qerf û henekan) ve hazirkirî destûrê dide ku berîya qezayek pêk were, em riya derketinê bibînin: Heke santrala nukleer ya Nogentê biteqe, tu planên xwexilaskirinê yên bajarê Parîsê tineye. (6)

Em bifikirin ku em ê hesabê felaketê –weke nimûne, ku şatoyên *Loirê* an jî Dêra *Fontervraud* di bin herika çemê Chinonê yê har û bixumxum de ye– li buhayê ser kilowatt saetê zêde bikin. Makîneyên xwe yên hesêb derxin û bersiva vê pirsê bidin: Gelo nukleer (ku % 16ê ji hilberîna elektrika cihanê peyda dike) hêjayî hewqas ked û zehmetîyê ye? Yan jî gelo armanca wê ya bi rastî şer e? Ev yek hemû fikrên mantiqî pûç dike û tevahîya pirtukên li ser nukleerê hatine nivîsandin, berî ku bên weşandin, bênirx dike.

1 Bernard Laponche û Benjamin Dessus, *En finir avec le nucléaire. Pourquoi et comment /Ji nukleerê xilas bibin, çima û çawa?* Seuil, Parîs, 2011

2 EPR: Reaktorên bi Zexta mezin ên Ewropî; MOX: Sotemenîyeke nukleer bi uranium û plutoniumê

3 Gunther Anders, *L'Obsolescence de l'homme. Sur la destruction de la vie à l'époque de la troisième révolution industrielle / li dervehiştina mirovî. Li ser talankirina jîyanê di dema seyemîn şoreşa pîşesazîyê de,* Fario, Parîs, 2011, û *La Menace nucléaire. Considérations radicales sur l'âge atomique / Tehlûkeya nukleer. Fikrên radîkal ên li ser dema nukleer,* Le Serpent à plumes, Parîs, 2006. Herdû pirtûk ji alîyê Christophe David ve ji zimanê almanî hatine wergerandin

4 Elisabeth Filhol, *La Centrale / Santral,* Folio, Parîs, 2011 (POL, Paris, 2010)

5 Dominique Manotti û DOA, *L'Honorable société / Civaka bi rûmet*, Gallimard, Série noire (rêza pirtûkan a reş), Parîs, 2011

6 "C'est par où la sortie? Le grand débat après Fukushima" / "Derîyê derketinê bi kîjan alîyî ve ye? Niqaşa mezin a piştî Fukuşîmayê", *Dosyayên Canard enchaîné*, hejmar 121, çirîya pêşî 2011

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

LIHEVNEKIRINA BERJEWENDÎYAN Û HEVKARÎYÊN GUNEHKARÎYÊ YÊN MEDYATÎK

Aborîzanên bi pereyan tên girtin dibin armanca êrişan

RENAUD LAMBERT

Edîtorîya rojname û kovaran, bernameyên danê sibê ên radyoyan, platformên televizyonê: Di nîvê kampanyaya hilbijartinên serokdewletîyê de, komek aborîzan qada çapemenîyê dadigirin û tiştên ku mumkin in sînordar dikin. Weke profesorên zanîngehan tên danasîn û ew hişkî û teqezîya teknîkî di nav devjenîya îdeolojîk de bi gewde dikin. Lê belê heke van "bisporan" karûbarên xwe yên din jî bi raya giştî bidana zanîn, gelo tesbît û analîzên wan wê dîsa ewqasî bawerî bidana mirovan?

Ji vê yekê re "***Efekta Drakula***" tê gotin: Çawa vampîrê navdar ê Karpatyayê dikir, weha jî birêkûpêkkirinên nelegal çawa bi herkesî eşkere bibin, wê ji holê rabin. Bi vî awayî sala 1998ê eşkerekirina Peymana Piralî a li ser Veberanînê (*Accord multilatéral sur l'investissement-AMI*) a ku bi dizî li ser hatibû li hev kirin ku lîberalkirina aborî were bi lez kirin, bûbû sedema jihevdeketina vê peymanê. Vê carê gengeşî elaqedarê peymana bi dizî ya di navbera aborîzan û sazîyên fînansê ye. Çapemenî gelek profesorên zanîngehan vedixwîne da ku nîqaş û gengeşîya di nav raya giştî de rohnî bike, lê belê her weha lêkolînerên ku hukûmetan ew weke şêwirmend wezîfedar kirin jî, di rastîyê de banke û şirketên mezin heqdestê wan didin. Gelo bisporek dikare "bi tevahî serbixwe" be, wexta ku ew hem pesnê ji qeydan xilaskirina malî bide û di heman demê de di birêveberîya foneke veberanînê de wezîfedar be?

Ev pêwendîyên bi tehlûke, çavkanîyên hevnegirtin û nakokîyên berjewendîyan, ne sirr û veşartî ne. Lê belê yên ku sûdê ji wan werdigirin, bi zanîn behsa vê yekê nakin û ji raya giştî vedişêrin. Berîya qiyameta malî ya sala 2008ê herkes ji vê pirmanedarîyê razî bû: Rojnamevanan bisporên xwe weke ku qaşo bêalî ne, nîşan didan, ji ber ku ew di demên cihê de li her deverî bûn, wan kara xwe diavêt berîka xwe; kara wan navdarîyeke zêde dibû û pereyên pêşin bûn. Lê belê ji qeyran û qiyameta sala 2008ê û vir ve aborîzan û girêdanên wan dikevin ber lêpirsînê. Gelo ***Efekta Drakula*** wê ji heqê vî rengê întellektuel ê bertîlxwarinê jî derkeve? Gelo bes e ku mirov lê eşkere bike ji bo ku mirov zora wê bibe? ***Komeleya Amerîkî ya Aborîyê*** (*American Economic Association, AEA*) ya xwedî prestîj xwedîya vê îdîayê ye.

Ji destpêka vê salê ve, gotarên di kovarên zanistî de yên ku endamên komleleyê ne, hatin weşandin, divê di rastîyê de hevnegirtin û nakokîyên ku nivîskaran digire nav xwe, eşkere bike. Bi vî rengî nivîskar divê "*wan 'alîyên pêwendîdar' (1) ên ku heqdestekî malî yê mezin dane wan, ango mîqdareke biqasî 10 000 doleran [qederê 7 600 euroyan] yan jî bêhtirî vê mîqdarê di nav sê salên bihurî de dane wan*" bidin nasîn û behsa wan bikin (danezana 5ê çileya 2012ê). Ev pîvan ji bo mîqdarên ku "*nasan*" dayî derbas dibe. Di serê hin ji wan kovaran de ku yên herî bi prestîj yên vê zanistê ne, kovara muhterem AEA –ew xwe amade dike ku sed û sîhem salvegera damezrandina xwe pîroz bike– ne kovarek e ku mirov henekê xwe pê bike. Biryara wê kir ku fikir û mêjî bihejin.

Piştî serketina belgefilma Charles Ferguson a bi navê *Inside Job* herişîn êdî darîçav bû. Mûçeyên hin şêwirmendên nêz ên serokê DYAyê **Barack Obama** yên ku ketibûn nav karê lîberalkirina sektora bankeyan di nav raya giştî de bûbûn sedema hin fikar û kakûnîyan. Bi vî rengî birêveberê *Konseya Aborî ya Neteweyî* (National Economic Council) **Lawrence Summers** 5.2 mîlyon dolar di navbera 2008 û 2009ê de pere weke heqdest ji fona spekulatîf **D.E. Shaw** stendibû û heta bi 135 000 doleran pere jî ji bo konferansên xwe stendibûn; piranîya van konferansan ji alîyê şirketên fînansê ve hatine lidarxistin –jixwe em qet behsa pereyên ku ji bo her rêza (ew rêz jî gelek bûn) nivîsê ya ji bo *Financial Times*ê jî nakin. Hêrs di nav refên vî pîşeyî de jî bi gurmîn rabû. Ji *Zanîngeha Denverê* **George DeMartino** ji me re rave dike ku sala 2011ê "*rêzeke lêkolînên zanistî nîşan da ku nakokîyên berjewendîyan qaîde ne û îstîsna nînin*". 3yê çileya 2011ê bi înîsîyatîfa profesorên zanîngehê **Gerald Epstein** û **Jessica Carrick-Hagenbarth** nameyeke li raya giştî vekirî kir ku li defa hawarê xe; vê nameyê bang li AEAyê kir da ku li hemberî ve yekê bikeve nav tevgerê. Bêhtirî sêsed aborîzanan ev name mohr kiribû, yek ji wan jî **George Akerlof** bû ku xelata Bankeya Swêdê ya zanistên aborî ên ji bo bîbîranîna **Alfred Nobel** tê dayîn wergirtiye û yeke din jî kevneşêwirmenda serokê DYAyê Barack Obama**, Christina Romer** bû. Piştî duwanzdeh mehan dengê wan hat bihîstin.

Lê belê dengvedana vê pêngava exlaqî hê nû bi zor ji Atlantîkê bihurî bû (2)... Di *Le Monde* a 1ê sibatê de aborîzan **Olivier Pastré** li dijî projeyên terikandina pereyê yekbûyî yê bi tenê yê ewropî xwe dîn û har dike. Ew wezîfeyekê dide xwe: "*Ji fransîyên herî nazik û yên ku herî zêde bi dezînformasyonê re rûbirû re rave bikin ka tehlûkeyên terikandina euroyê çi ne*". (3) Rojnameya êvarê nivîskarî weke "*profesorê aborîyê li zanîngeha Parîs-VIIIê*" dide nasîn. Dîsa jî **Pastré** herweha serokê bankeya tûnisî ***ImBank***ê ye. Û di konseyên birêveberîyê yên bankeya CMPê, *Komeleya Birêveberên Bankeyan* û herweha ***Institut Europlace*** a malî de jî cihê xwe digire. Ew herweha heman "*profesorê li zanîngehê*" ye ku her sibeha şemîyê di weşana bernameya ***France Culture***ê a bi navê "*L'Economie en questions [Aborî ketiye ber pirsan]*" beşdar dibe û bi xwe jî hev-produktorê bernameyê ye.

Dema ku 2+2 bike 5

Dema ku ev mijar ji wî re hat gotin, şiroveya endamê komîteya birêveber a AEAyê profesor **Michael Woodford** weha ye: "*Va ye mînakeke bêkêmasî ya wê rewşê li ser me ferz kir ku em bersivekê bidin. Tevahîya aborîzanan heman pîvan li ser weşanan hemûyan ferz kirine: kovarên akademîk, edîtorî, gotarên di rojname û kovaran de, şiroveyên di radyo, yan jî televîzyonan de tên weşandin* ". Woodford weha dewam dike: "*..li gor min di vê rewşê de mafê xwendekaran heye ku bizanibin ka gelo bisporê navbirî analîzekê diparêze, yan berjewendîyên sazî û dezgehên ew ji bo wan dixebite diparêze*". Pastré di gotara xwe ya 1ê sibatê de misoger dikir ku di rewşa hîpotetîk a terikandina euroyê de banke "*bihayê deyndarîya xwe ya demkurt û demdirêj wê pir zêde bikin*" û ji ber "*kêmbûna bikaranîna wan*" a muhtemel, li defa hawarê dixist.

Ji bo berpirsîyarê lêkolîna aborî ji bo bankeya ***Natixis*** û birêveberê şirketa *Totalê Patrick Artus* teza ku *Woodford* diparêze "*li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Meliktîya Yekbûyî xwedî mane ye. Lê belê bi rastî jî ez bawer nakim ku mirov bikaribe wê her weha li qada euroyê jî pêk bîne*" lewra "*gelek aborîzanên girêdayî sektora fînansê li wir li gor li cîhana anglo-saxon pir lawaz in*". (4) Dibe ku komeke piçûk be... lê belê di nav bisporên çapemenîyê de pir zêde tê temsîl kirin.

3yê çirîya paşîn a 2011ê. Bernameya sibehî ya ***France Interê*** mijarên sereke yên li pêşîya G20ê ya ku wê li *Cannesê* pêk were, analîz dike. Bername kê vedixwîne? "*Serokê Çerxa Aborîzanan Jean-Hervé Lorenzi.*" Ev komeleya ku kêm caran tê danasîn, **Patrick Artus, Jean-Paul Betbèze** (seraborîzan e li bankeya Crédit agricoleê), **Laurence Boone** (seraborîzan e li Merrill Lynch), **Anton Brender** (seraborîzanê Dexia Asset Management e), **Olivier Pastré** û hwd. dicivîne. Çend rojan piştre li ser heman kanala radyoyê ya dewletê bernameya "*Le Téléphone sonne* [zengilê telefonê lêdixe]" ji civînê "*dersan derdixe*". Li ser mîkrofonê "*Serokê Çerxa Aborîzanan Jean-Hervé Lorenzi*" heye. Bi vî navî Lorenzi yê ku wekî din şêwirmendê namzedê serokkomarîya Fransayê yê Partîya Sosyalîst **François Hollande** e, bazara milk di *Les Echos* de, kêmbûna nirxê borsayê di kanala ***Europe 1***ê de, yan jî "*çarenûsa harîqulade ya Fransayê*" li ser ekranên RTLyê analîz dike. (5) Dîsa jî vê kartvîzîtê cih nedida hin agahîyên detay. Lorenzi di konseya birêveber a **PagesJaunes**ê, ya *Associés en financeê*, ya Komeleya Fransî ya Operatorên telefonên Mobil (*Association française des opérateurs mobiles - Afom*), ya BNP Paribas-Assuranceê de cihê xwe digire. Ew wekî din dayendeyê notan ê Euler-Hermesê ye, endamê konseya çavdêrîya şirketa malî *Compagnie financière Saint-Honoré*, yê BVAyê, ya holdînga Ginger e û şêwirmendê birêveberîya şirketa malî Compagnie financière Edmond de Rothschild Banqueê ye.

Christian Saint-Etienne bi xwe, xwe weke profesorê Konservatuwara Neteweyî ya Huner û Pîşeyan (CNAM) li ser ekranên ***France 24***ê û weke aborîzan û analîstê siyasî di qunciken *Pointê* de dide nasîn. Ti caran xwe weke şêwirmendê zanistî yê Konseya Stratejîk a Ewropî SAyê, endamekî birêveber ê Konseyê di birêvebirina mîrateyê de nedaye nasîn. **Elie Cohen** jî şêwirmendê **Hollande** e, li ser ekranên France Interê û di rûpelên *Le Figaro*yê de wî xwe weke birêveberê lêkolînê li Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS) û weke professor li Sciences Po [dibistana bilind a navdar a Zanistên Siyasî li Franseyê, nota wergêr] da nasîn. Tu caran xwe weke endamê konseya birêveber a şirketên Pages Jaunesê yan jî EDF Enerjîyên Nûyê nedaye nasîn. Jacques Mistral? Di qunciken *Le Monde*ê de û li ser France Cultureê aborîzan e, yan jî di bernameya ***"C dans l'air"*** (kanala France 5) de birêveberê lêkolînên aborî ye li Enstîtuya Fransî ya Têkilîyên Navneteweyî (IFRI). Ne birêveberê BNP Paribasyê ye. Danile Cohen şêwirmendê **Martine Aubry** navê xwe yê *senior adviser* ê bankeya Lazard –şêwirmendîya hukûmeta yewnan dike da ku ji nû ve li ser deynên xwe bazarê bike –kêmtir derdixe pêş, belê kalîteya xwe ya profesorîya zanistên aborî li *Ecole normale superieure* [muhendisên ku dibin karmendên payebilind ên dewletê perwerde dike] û yê zanîngeha Paris Iê pir bêhtir derdixe pêş.

Ji bo amadebûna li konseyên birêveberîyê yên şirketên mezin xelat (serê wezîfeya dewrekê ji bo şirketên CAC 40ê navînî 35 000 euro û ji bo şirketên din jî nîvê vê mîqdarê; ev agahî li gor daneyên Înstîtûya Fransî ya Birêveberan -Institut français des administrateurs, IFA- ne), konferansên taybet (weke mînak Lorenzi serê yekê 6 600 euroyî distîne), bi heqdest nivîsandina raporan ... Li gor çavdêrîya DeMartino aborîzanên heştgoşe, bi tevahî weke hevpîşeyên xwe yên amerîkî, "*xwedîyên pir zêde derfetan in da ku bi pir pereyan, bi pir zêde pereyan kar bikin. Belê ew ji yên din baştir dizanin ku tutişt belaş nîne, buhayekî her kar û fêdeyê heye. Û li vir buha jidestdana serbixwebûnê ye*".

Lorenzi li ber vê yekê radibe û dibêje "*li gor min di vê yekê de pêjn û tîhneke salên 1930ê heye. Pirs ew e ka gelo awayê hûn pê debara xwe dikin, bandorê li hukmên we dike yan na. Û na di vê rewşê de ev yek ne wisa ye*". Çi dibe bila bibe, mirov dikare bi awayekî xurt bibêje 2+2 dike 4, mirov ji zanîngehekê re bixebite, yan jî ji bankeyê re bixebite ev yek naguhere. **Woodford** weha bersivê dide, "*bêguman wisa ye. Lê belê piranîya pirsên aborîzan bi wan re rûbirû ne, rê li ber hukmên bêhtir bi besîret vedikin. Ne lazim e mirov xwe bixapîne: Nîqaş û guftûgoyên me li ser hin berjewendîyên taybet xwedî hin bandorên yekser in*". Gelo divê em tevî profesorê zanîngeha Illinoisê bigihêjin wê encamê ku mumkin e "*aborîzan weke parêzeran tevbigerin, ango ji rastîyên serbixwe vî awirê li mijarê, yan jî awirekî din ê li mijarê biparêzin*"? (6) Yan jî –da ku em bi rengekî din bibêjin- gelo elaqedarî encamê, ew carinan meyldar in mirovan qaneh bikin ku 2+2 dike 5?

Derhênerê belgefilma bi navê *Inside Job* Ferguson bi aborîzanê ji ***Columbia Business Schoolê Frederic Mishkin*** re rûnişt:

- Ferguson: *Sala 2006ê hûn jî yek ji hevnivîskarên lêkolîneke li ser sîstema malî ya îzlandî bûn:* 'ev welatekî pêşketî yê xwedî sazî û dezgehên bêqusûr e. Bertîlxwarin lê kêm e, dewleta huqûqê ye, aborî veguheriya lîberalkirina malî. Rêzik û kontrola bi baldarî ya kalîteyê lê heye.'
- Mishkin: "*Şaşî li wir bû* [sala 2008ê aborîya îzlandî bi tevahî hilweşîya, nota redaksîyonê]. *Derket holê ku rêzik û kontrola bi baldarî têra xwe razîker nebû.*
- *Sedem çi bû ku we ji berevajîyê vê yekê bawer kir?*
- *Me xwe sparte agahîyên li ber destên xwe. Û fikra giştî Îzlanda weke welatekî xwedîyê sazî û dezgehên bêqusûr û pir pêşketî qebûl dikir.*
- *Kê ji we re ev got? We çi lêkolîn bi rê ve birin?*
- *Em bi mirovan re dipeyivin, me bawerî bi Bankeya Navendî anî, ku di rastîyê de ne ya ku mirov bawerîyê pê bîne bû.*
- *Ji bo çi we bawerî bi Bankeya Navendî anî?*
- *Me xwe sparte agahîyên li ber destên xwe.*
- *We bi vê lêkolînê çiqas pere bi dest xistin?*
- *Min pere standin ... mîqdar ji xwe li raya giştî eşkere ye*".

Mishkin 124 000 dolar [qederê 95 000 euroyan] ji Odeya Bazirganîyê ya Îzlandî stendin da ku lêkolîna xwe bike.

- *Li ser CVya we, navê raporê 'Îstîqrara Malî li Îzlandayê' hatiye guhertin û bûye 'Bêîstîqrarîya Malî li Îzlandayê'...*
- *Oh... Ez nizanim ji bo çi, lê belê... Dibe ku şaşîyeke nivîsê be*".

Parêzerê bi tevahî xwe dayî muwekîlê xwe, yan jî zanayê şaşî kirî, cihêtîya di navbera herduyan de carinan xeteke pir zirav e. Belê DeMartino vê yekê bi bîr dixe: "*Aborîzan ji îmtiyazekê sûdê werdigirin ku di pîşeyên din de nîne: Mirov qet ji ber şaşîyên wan ji wan hesab napirse.*" Lê belê ew şaşîyan dikin.

17ê tebaxa 2007ê krîza deynên ji bo kirîna milk li alîyê din ê Atlantîkê hê nû dest pê dike. Elie Cohen hê hingê dawîya wê dide zanîn, ew piştrast dike: "*Di nav çend hefteyan de bazar wê xwe reforme bike, karûbar wê vegerin ser seyira berê*" (LeMonde.fr, 17ê tebaxa 2007ê). Şeş mehan paşê, li ser ekrana Direct 8ê kela canê bankevanê karsazîyê û şêwirmendê Nicolas Sarkozy **Alain Minc** bi "*qayîşîbûna ecêb a sîstemê*" radibe: "*Ji me re hatibû gotin ku [ew] ê bi jêhatîbûneke wisa bê kontrol kirin ku em ê nekevin ber krîzeke ku dîsa jî mumkin bû yek ji wan krîzên pir mezin ên malî yên berê qewimî, bûya! Ev bi herhalî cîhaneke ku di bingehê de li hemberî derban pir xweragir e*". Biryar? "*Aborîya dinyayê bêhtir baş tê bi rê ve birin*" (8ê çile). (7) Heman salê Lorenzi da zanîn ku "[wî] *biryar daye "tesbîta bankeyên navendî pir bi lez, heq û xwedî tesîr bû. Di nav krîzeke bazara nav-bankeyî de ji wan hat bi awayekî jêhatî xwe ji felaketê xilas bikin; di vê rewşê de wan li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêşî li petixîna bankeyên îpotekker girt û destûr da dezgehên mezin ên bankeyî yên bi rastî di tehlûkeyê de, ji nû ve xwe bi cih bikin, bêyî tehlûkeya kêmbûna pereyî, beşek ji berhemên wan veguherîne hebûnên veguhezî*

yên xwedî nirxên malî.. (8) Ev peyvên wî hê nû hatibûn çap kirin, bankeya Lehman Brothers petixî, bi xwe re jî beşek ji sîstema malî ya cîhanî kişand. Redaktorê *Flash Economie*yê li cem Naxitis yê bi nexweşîya nivîsê ketî (bi navînî rojê pênc gotaran dinivîse) **Artus** bi xwe, bi defa delalîyê di Challengesê de 28ê tebaxa 2008ê ev yek da zanîn –du hefteyan berîya hilweşînê! - : "*Va ye me mijara deynên ji bo kiryarîya milk hatine dayîn, li pey xwe hişt.*" Piştre ew ê bi heraret li dijî wê fikrê rabûya ku li gor wê banke divê bêhtir bacê bidin û fînansekirina aborîyên krîzê ew lawaz û nazik kirine, dewam bikin. Sernavê gotara xebatkarê Natixisê di *Flash Economie*ya wî ya 18ê tebaxa 2012ê de weha bû "*em nikarin hertiştî ji bankeyan bixwazin*".

Ne çepgir û ne rastgir: Bankevan

Mirov dikare pirsa têkilîya di navbera şaşîyên hukmî yên bi vî rengî û heqdestê ku nivîskarên wan distînin, ji xwe bike. Yan jî tevî **Epstein** aborîzanan "*li ber hempîşeyên wan, çapemenî, xwendekarên wan, welatîyan berpirsîyar*"bikin. (9) Lê belê gelo divê mirov xwe li şaşmayînê deyne dema ku bankevanek berjewendîyên bankevanan biparêze? Belê di nav van şert û mercan de Lorenzi bi çalakîyên xwe re rûbirû dibe, berîya demeke kurt wî ev yek weha rave kir: "*Ez ew kes im ku jê re* senior banker *tê gotin. Ez bi awayekî giştî hewl didim karan bi pêş bixim ku li gor gelek çalakîyên şirketa malî Compagnie financière Edmond de Rothschildê ne*. (10) Pastré û ew xwedî wezîfeyeke fikrî a bi wî rengî ne ku dema di pirtûka xwe ya bi navê *Droite contre gauche? Les grands dossiers qui feront l'élection présidentielle* [Rastgir li dijî çepgiran? Dosyayên mezin ên ku wê di hilbijartinên serokkomarîyê de bikevin pêşbazîyê], ya sala 2012 çap bûyî de ew fermanê didin xwendekarên xwe ku "*xwe ji xapeyên li ser dewleta parêzer dûr bikin*", "*êdî bi wêrekî li alîyê bazarê şert bigirin*" û berîya her tiştî, xwe dûrî "*hukimkirinên zêde ecele û bi lez*" ên der barê pîşesazîya bankeyî bigirin?

Çirîya paşîn a bihurî serokê Otorîteya Bazarên Malî (*Autorité des marchés financiers, AMF*) û kevne musteşarê Sarkozy li ser mijara karûbarên ewropî **Jean-Pierre Jouyet** pir ditirsiya "*di dawîyê de welatî wê li dijî dîktatorîya heyî* [ya bazaran] *serî hildin*". (11) Lê belê "bazar" ma ne heta bi nava AMFya ku erka wê kontrolkirina wan e, xwedî hukmê serdest in? Lewma, ma kî şêwirmendîyê dike ji wê otorîteyê re ku Jouyet serokatîya wê dike? Heman kes: Artus, Olivier Davanne (hevbirêveberê Groupama Invest), Olivier Garnier (cîgirê birêveberê Société Générale), **Ruben Lee** (serok birêveberê giştî yê Oxford Finance Group), Pastré û hwd.

Em vegerin Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Ferguson ji birêveberê beşa aborîyê yê Harvardê John Campbell dipirse:

- Ferguson: *Lêkolînerekî bijîşkîyê gotarekê dinivîse û tê de dibêje: 'Ji bo dermankirina vê nexweşîyê, divê filan derman di dermannameyê de were nivîsîn.' Derdikeve holê ku ev bijîşk % 80yê hatina xwe ji hilberînerê vî dermanî distîne. Gelo ev yek we zivêr nake?*
- Campbell: *Li gor min helbet girîng e mirov vê yekê derxe holê ... ew, ehm... ehm... Ev yek hindekî cihê ye ji bûyera li vir em behsa wê dikin, lewra ... ehm...*

Elaqeya vê şibandinê bi cîgira birêveberê ragihandina AMFyê bi **Barbara Frugier** jî ne xuya ye. Berîya ku dewam bike, dikeve navberê "*guh bidin min, ez pîşesazîya dermançêkerîyê nas nakim. Ya rastî ez nizanim bi vê mînakê hûn dixwazin bigihêjin ku. Bi ya min, ev tiştekî asayî ye ku mirov li cem kesên bispor xwe agahdar bike.*" Bi ser de jî li gor malpera Înternetê ya Otorîteyê, li ser le collègeê –a ku di nava gelek wezîfeyan de herweha wezîfedar e ku budceya sazîyê çêke û rêzikên hundir û giştî dîyar bike– berevajî konseya zanistî "*tevahîyan rêzikên ji bo xebatkar û muçegiran, û pêşîgirtina nakokîya berjewendîyan ferz in*". Dema ku payeya aborîzan û wekî din jî serokê CAEyê **Christian de Boissieu** hatina 2011ê ji duyemîn civata hemfikran bilind bû û derket yekemîn civata hemfikran, hingê jê hat xwestin ku dev ji wezîfeyên xwe berde; şêwirmendîya fona spekulatîf HDF Financeê, Ernst & Youngê û herweha kursîyê xwe yê di komîteya teftîşê ya bankeya Neuflize OBCyê ku tê de ew endamê konseya kontrolê ye. Ew rave dike: "*Dema ku li bendê bûm di demeke pir nêz de dev ji vê konseya berdim, dema ku li AMFyê yekser, yan jî neyekser behsa vê bankeyê tê kirin, ez xwe derdixim (ez ji holê derdikevim û bi tu awayî tevlî hizirîn û guftûgoyan nabim)*".

Hukmên AMFyê û yên Boissieu hêjayî pesindayînê ne; gelo ew rûreşkirneke zimnî nînin li hemberî wan kesên ku nivîsa nakin? Mesela li hemberî çapemenîyê.

Rojnamevanê France Infoyê Jean Leymarie 16ê kanûna 2009ê, 24ê çirîya paşîn a 2010ê û 29ê hezîrana 2011ê Lorenzi kir mêvanê xwe. Gelo ew wezîfeyên mêvanê xwe yên di şirketa Rotshildê nas dike? "*Erê, helbet!*" Û dîsa jî di bernameya radyoyê de behsa wê nake? "*Guhdarên me ehmeq nînin. Ew baş pê dizanin*". Lê belê ew ê çawa pê zanibin, lewma hevpîşeyên wî xwedîyên heman helwestê ne, tevî ku ew bi rû û wezîfeyên cihê yên mêvanên xwe dizanin jî?

Jean-Marc Sylvestre bi zanîn **Lorenzi** vexwend LCIyê da ku behsa tehlûkeyên kontroleke xurttir a sektora bankeyan bike (24ê nîsana 2010ê); **Yves Calvi** bi zanîn di bernameya xwe *"C dans l'air"* a li ser ekranên ***France 5*** de mafê axaftinê da Godet û Saint-Etienne da ku rave bikin ku siyasetên hişk ên aborîyê bivênevê ne (9ê çirîya paşîn a 2011ê)? Yan jî *Financial Times*ê bi zanîn quncikên xwe li Summers vekirin da ku encaman ji "krîza kapîtalîzmê" derxe (8ê çileyê 2012ê). Gelo pêwîst e mirov bi rengekî baldar guh bide bersivan dema ku mirov pirsên wisa ji mêvanên wisa bike?

Ji agahdarkirina fransîyan wê tiştekî zêde girîng kêm nebe heke çapemenî bêhtir cih veqetîne- çend rêzan, çend saniyeyên weşanê– ji bo danasîneke tam a bisporên xwe. Serokê Komeleya Fransî a Zanistên Aborî (AFSE), aborîzan **Hubert Kempf** ê weke "adetparêz" navdar e weha bersiva me dide: "*Jixwe ev ê ewqasî hêsan bûya ku şaş dimînin çawa heta niha ev nekirine.*" Gelo rêxistina wî dixwaze der barê hevnegirtin û nakokîya berjewendîyan de ji endamên xwe bipirse? "*Dibe ku di kongreya bê de em rûniştineke li endaman vekirî organîze bikin*" di tîrmeha 2012ê de. Û li alîyê Komeleya Fransî ya Polîtîkaya Ekonomîyê (AFEP) a ku berîya du salan ji bo teşwîqkirina pirrengîyê di nav pîşeyî de hat damezrandin, rewş çawa ye? Sekreterê Komeleyê **Nicolas Postel** ji me re dibêje "*Hê bi awayekî fermî biryareke wisa nîne, tevî ku li ser vê mijarê* ji berê ve *lihevkirinek heye*." Ew li gotinên xwe zêde dike "*lê belê bifikirin ku pirsgirêk wê bi tenê nakokîyên berjewendîyan be; bi ya min şaşîyek e*".

Taybetkirina bisporîyê

Senaryoyeke din. Di hejmara xwe ya 14ê sibatê de *Le Monde*ê di kolonê navneteweyî de analîzek li ser krîza Yewnanistanê weşand. Rojnamevan **Claire Gatinois** di wê analîzê de ji ber gelek aborîzanan digire, hemû jî yekser girêdayî cîhana fînansê ne. Belê, hevnegirtin û nakokîyên berjewendîyan li vir nînin: Wezîfe bi awayekî zelal hatine danasîn. **Christopher Probyn**? "*Ser-aborîzan e li cem Koma Fînansî a li Bostonê State Street*" (sê caran ji ber hatiye girtin). **Natacha Valla**? *"Aborîzan e li cem Goldman Sachs"* (sê caran ji ber hatiye girtin). **Jésus Castillo**? *"Aborîzan e li cem Natixis"*. Jixwe em behsa "*bisporên UBSê*" nakin. Bêguman nivîskar weha dihizire ku "aborîzanên bankeyan" çêtir in ji bo ku krîzeke weke ya ku Yewnanistanê dihejîne, analîz bikin. Postel li hember vê fikrê radibe "*ji bo çi ew ê çêtir bin? Li ser mijareke weke vê mirov ji çapemenîyê li benda ravekirineke pir teknîk a çerxên malî yên zelûl nînin, lê belê ew li benda jêpirsîneke bingehîn a li ser statuya deynê welêt in: ev deyn rewa ye? Ew ji ku tê? Û li ser vê mijarê aborîzanên bankeyan ne illeh yên herî jêhatî ne*".

Gelo em dikarin lê bifikirin ku aborîzanekî wekî **Goldman Sachs**ê îdîa dike sedema sereke ya krîza Yewnanistanê deynekî nerewa ye ku ne ferz e wî deynî bide? Gatinois lê mikur tê "na, ev yek bi min pir zêde nemumkin xuya dike. Ew rave dike "*ji bo vê gotarê, ez fikirîm ku balkêş e mirov ji aborîzanên bankeya bipirse ku bêhtir lîberal in, da ku nîşan bidim ku ew jî ji ber rewşa Yewnanistanê tatêlan dikin*". Mesele qet nebe carekê nîşandana awira lîberal e. Ev awayê hizra pîşeyî xuya ye berîya her tiştî çapemenîya mezin vedigire, fikra weke mînak jêpirsîna nûnerên sendîkayan –ku bixwe herî kêm bi qasî aborîzanên lîberal ji çerx û encamên drama civakî ya diqewime haydar in- naye bîra wan. Di çirîya pêşî ya sala 2011ê de weke mînak **Gatinois** mafê axaftinê da çil aborîzanan, komên aborîzanan, yan jî yên weke wan. Bîst û neh ji wan yekser ji bo bankeyan, yan jî saziyên malî dixebitin, sisê ji wan li ser navê sendîkayan peyivîn. (12) Di navbera 1ê îlona 2008ê û 31ê kanûna 2011ê de *Le Monde*ê di 147 gotaran de ji ber ***Artus*** –berpirsîyarê lêkolînê ji bo bankeya Natixis– girtiye (wî çar caran jî tevî ku ne di redaksîyona rojnameyê de bû, gotar nivîsandin). Ji **Jacques Attali** (132 gotar) û ji Alain Minc (118) bêhtir. Û ji Jean Gadrey (li ser mijarên aborî pênc gotar) û Frédéric Lordon (çar) gelekî zêdetir. Proporsîyonên bi vî rengî mirov wê di rojnameyên *Libération* yan jî *Le Figaro* de û piranîya kovaran de jî bibîne.

Di bin van şert û mercan de şefafî gelo têrê dike ku mirov berê meyila xwezayî ya bisporên malî ya parastina... berjewendîyên fînansê biguhere? Ber bi dawîya sohbeta me ve Gatinois bi kurtebirî dibêje: "*Ya rastî ez qebûl dikim ku ez tevahîya awirên li ser mijarê nadim nasîn*".

1 "Alîyên elaqedar" weke "*tevahîya ferd, kom, yan jî rêxistinên bi awayekî malî, îdeolojîk yan jî siyasî pêwendîdarî naveroka gotarê*" tên terîf kirin

2 Aborîzan Jean Gadrey daneyên pirsgirêkê di nivîsa xwe ya bi navê "Les liaisons dangereuses (Girêdanên bi tehlûke)" de nîşan da, 21ê îlona 2009ê, http://alternatives-economiques.fr/blogs/gadrey. Lêkolîna me ji şîretên wî sûd wergirt û herweha ji xebata François Ruffin a di çarçoveya bernameya "Là-bas si j'y suis (li wir heke li wir hebim)" a dîyarî "aborîzanên nobetdar" kirî de pêk anî (France Inter, 2 û 3yê çileyê 2012ê)

3 Olivier Pastré, "La sortie de l'euro, un suicide (Terikandina euroyê, xwekuştinek)", *Le Monde*, 1ê sibata 2012ê

4 "Si les économistes ont sous-estimé la crise, ce n'est pas par complicité avec les financiers (Heke aborîzanan krîz piçûk dîtibe, sedema vê ne hevkarîya bi fînanskeran re ye)", *Le Monde*, 10ê îlona 2009ê

5 Yek jê 3yê çirîya pêşî, yek 19ê tebaxê û ya din jî 3yê nîsana 2011ê

6 Ben Casselman di "Economists set rules on ethics (Aborîzan rêzikên exlaqî datînin)" de ji ber girtiye, *The Wall Street Journal*, New York, 9eê çileyê 2012ê

7 Gilles Balbastre û Yannick Kergoat di belgefilma bi navê *Les Nouveaux Chiens de garde* de ji ber girtiye, JEM Productions, 2012

8 Jean-Hervé Lorenzi, "Qui va payer ? (Kî wê heqê wê bide?)", hejmara derveyî rêzê "Crise financière: analyses et propositions (krîza malî: analîz û pêşnîyaz)", *Revue d'économie financière*, Paris, 2008

9 *The Wall Street Journal,* li jor behsa gotarê hatiye kirin

10 *Investisseurs* (kovara şirketa Rothschildê), hejmar 4, kanûn 2011, rûpel 16-17

11 Hevpeyvîna di *Journal du dimanche* de, Paris, 12ê çirîya paşîn a 2011

12 Thomas Vescovi ew hejmartin

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Şîreta baş

Konseya Analîza Aborîyê (CAE) bi "*rohnîkirin û şêwirmendîya serokwezîrê Fransayê bi riya liberhevgirtina nêrîn, analîz û tercîhên hukûmetê di warê aborîyê de*" hat wezîfedar kirin; ew raporên li ser mijarên herî girîng ên aborî û civakî ji desthilatdaran re amade dike û bi vî awayî hewl dide rengekî bide nîqaşan. Yanî weke ku hewl dide fikreke dewletê ku yekser ji sektora teybet tê, pêk bîne. Belê ev sazî ji bîst û heşt endamên xwe pêk tê: **Patrick Artus** (Natixis), **Daniel Cohen** (Lazard), **Elie Cohen** (PagesJaunes, EDF Enerjîyên Nû), **Jean-Hervé Lorenzi** (Compagnie Rothschild) û **Christian Saint-Etienne** (Konseya Stratejîk a Ewropî - Conseil stratégique européen - SA), **Jean-Paul Betbèze** (birêveberê aborîzan yê bankeya Crédit agricoleê), **Jacques Delpla** (*senior adivser -şewirmendê paye bilind-* yê BNP-Paribasê), **Michel Didier** (serokê COE-Rexecode), **Olivier Garnier** (Alîkarê serokê bankeya Société Généraleê), **Michel Godet** (birêveberê şirketa Bongrain û yê komeleya sîgortekirîyên ji bo teqewitbûn, danheva pereyan û tedbîrê) [Agipi], ku hevkarekî AXAyê ye), **Mathilde Lemoine** (seroka lêkolînên aborî û stratejîyên bazarê ya HSBCya Fransayê) yan jî **Philippe Trainar** (şefê aborîzanan yê SCOR, şirketekê jinûve sîgortekirinê).

R.L

Tercîheke ji bo standina xwînê

Aborîzanê (heterodoks) bi navê **Jean Gadrey** vê pirsê dike: "*çima mirov bifikirin ku di mijara dermanan de nakokîya berjewendîyan heye û di ya wan dermanan de ku ji alîyê bijîşkên aborîyê ve hatine pêşnîyaz kirin, heman nakokî nîne? Belê dermanên wan bi awayekî gelekî dijwar tesîrê ne li tenduristîya mirovan, lê belê li bingeha civakî dike.*" Ji salan û vir ve, weke bijîşkê **Molièrî**, aborîzan dermannameyên lîberal dinivîsin ku di wan de standina xwînê tercîh dikin.

Christian de Boissieu bi dilxweşî rave dike: "*Di navbera salên 1992 û 1998ê de min beşeke jîyana xwe li Moskovayê bihurand*". *(1)* Ew li gel **Daniel Cohen, Jacques Delpla** û **Charles Wyplosz** (û gelekên din), beşdarî bernameya ewropî ya *Alîkarîya Teknîkî ji bo Civata Dewletên Serbixwe* (Technical Assistance to the Commonwealth of Independant States, TACIS) bû. Armanc ev e ku "*piştgirîya Rusyayê bikin da ku bikaribe ji sîstema bi navê kolektîvîzm, yan jî komunîst xwe xilas bike û bikeve nav aborîya bazarê*".

Çileya 2009ê kovara zanistî ya bijîşkîyê ya îngilîz *The Lancet*ê analîzek weşand li ser têsîra dermannameyên aborî ku Rûsyayê ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe di destpêka salên 1990ê de bi kar anîn. (2) Nivîskarên kovarê derdibirin ku "*di navbera 1991 û 1994ê de hêvîya temenê li jîyanê mayînê yê xelkê welêt qederê 5 salan kêm bûye*" û îdîa dikin ku sedema vê kêmbûnê xirabûna şert û mercên jîyanê ye ku encama seranser ya "stratejîyên aborî yên ku armanca wan veguherîna komunîzmê bo kapîtalîzmê bû." *Money doctors* [bijîşkên pereyan] ên fransî û hin kesên din jî ev stratejî pêşnîyaz kiribûn. (3)

Berê, **Daniel Cohen** di Bolîvyayê re derbas bûbû, li cem bisporê amerîkî yê vî şiklê dermankirinê **Jeffrey Sachs** li ser "dermankirina bi awayê şokê" perwerde bûbû. Di sala 1985ê de hukûmeta **Victor Paz Estenssoro Sachs, Cohen** û **Felipe Larrain** vexwendibûn da ku "aborîya welêt bi îstîqrar bikin". Wan bernameya "qanûnên herî bilind a 21060ê" amade kir: taybetkirin, kêmkirina lêçûnên dewletê, ji kar derxistina bîst hezar karkerên kanên qelayê (piranîya wan êdî bi çandina pelên koka re mijûl in) …dema ku Navenda Karkerên Bolîvyayê (COB), mezintirîn konfederasyona sendîkayî ya welêt, banga greva giştî dike, hukûmet îdareya orfî îlan dike û sed û heftê û pênc pêşengên wê dixe girtîgehê. Profesor **Kenneth D. Lehman** weha difikire "*li derveyî welêt, ji bo pîvana encamên civakî ya siyaseteke bi vî rengî statîstîk têrê nakin. Sala 1986ê, hêza kirînê ya navînî % 70ê kêm bû (…) rêjeya bêkarîyê* [ya kesên dikarin bixebitin] *gihişt % 20 ta % 25ê, di heman demê de hema bêje tevahîya tedbîrên parastina civakî yên ku karkeran heta wê demê ji wan sûd werdigirt, ji holê hatin rakirin*". (4)

Cohen êdî şêwrmendîya Bankaya Lazard, hukûmeta Yewnanistanê û Partîya Sosyalîst a fransî dike. **Boissieu** jî serokatîya Konseya Analîza Aborî û Civakî (CAE) dike, ku ji şêwirmendîya serokwezîrê Fransayê **François Fillon** berpirsîyar e.

R.L

1 Gilles Balbastre û Yannick Kergoat ji bo belgefîlmê *Les Nouveaux Chiens de garde* ev hevpeyvîn çêkirin, JEM Productions, 2012

2 David Stuckler, Lawrence King û Martin McKee, "Mass privatisation and the post-communist mortality crisis: a cross-national analysis (Taybetîkirina girseyî û krîza mirinê ya piştî komunîzmê)", *The Lancet*, berg 373, hejmar 9661, London, 31 çile 2009

3 Bixwîne Ibrahim Warde, "Les faiseurs de révolution libérale (Çêkerên şoreşa lîberal)", *Le Monde diplomatique*, gulan 1992

4 Kenneth D. Lehman, *Bolivia and the United States (Bolîvya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*, The University of Georgia Press, Athens (Gurcîstan), 1999

Artêşa tirk ku şeş hefte berê li hember şervanên kurd êrişeke xurt li dar xistibû û ji ber ku êriş ji bo demeke kin hatibû plan kirin, hîna jî li ser axa Iraqê berdewam e. Bi sedan kesên sîvîl hatine kuştin, herweha operasyonên leşkerî li rojhelat û başûrê Tirkîyê jî berdewam in. Toleransa dewletên rojava li gel şahînên Ankarayê, dikare encamên gelek girîng hem ji bo rewşa polîtîk ya hundirîn, hem jî ji bo dengeya hemû herêmê peyda bike.

ÇARYEKA DAWÎN BO ARTÊŞA TIRKAN

Êrişa bêperwa ya li ser Kurdistanê

KENDAL NEZAN

Tirkîye, ku nêzîkî yanzde sal in şerekî bêdawî û wêrankar li hember şervanên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) dimeşîne, ketiye nav sendroma bi nav û deng "çaryeka dawîn". Wek hemû destbirakên xwe yên ketine şerên kolonîyal, generalên tirk, her demsal dîyar dikin ku serkeftin nêzîk e, dawîya tunelê tê dîtin, ger di vê gavê de; rê ji wan re vekirî be, ger alîkarîya çekan ya balafir û helîkopteran berdewam be û bikaribin çend sînoran derbas bikin, an jî çend navçe û herêman vala bikin (1) dê hêsantir bikaribin bi ser serhildanê de biçin.

Mudaxeleya girseyî ya artêşa tirk ya 20ê adara dawîn, ku li Kurdistana Iraqê berdewam e, li ser fikra "reva berî wextê" hatiye ava kirin, tenê bi înîsîyatîfa leşkeran hatiye meşandin û tu agahdarî ji meclîsê ne hatine girtin, ne jî hatine dayîn, ev têkilhatin ji alî serokwezîr **Tansû Çillerê** ve, di dîroka welat de; ji şerê rûs û tirkan yê 1877ê ve, yê herî girîng e ku hatiye nasîn. Ger mirov ji Ankarayê bawer bike, ev mudaxele; "hilweşandina bingeh û ji holê rakirina 3 000 teroristên PKK"ye ku li herêmên li ser hidûdan bi cih in, dike armanc. Bihayê vê operasyonê mehane bi milyarek dolara tê texmîn kirin. Ev êriş, bi alîkarîya hêzên hewayî yên firokeyên bombardûmanî, hêzên tank û topan û helîkopteran û herweha bi 35 000 leşkeran ve tê meşandin û di nav çend rojan de, tixûbên navneteweyî hatin ihlal kirin û 8400 km2 axa Iraqê hate dagîr kirin. Ev cîh, di nav "herêmên ewle" yên di bin kontrola Neteweyên Yekgirtî de dimîne û di sala 1991ê de, bi alîkarîya hêzên hewayî yên amerîkî, îngilîzî û fransî ve ji bo parastina kurdan li hember êrişên artêşa iraqî hatibû damezirandin.

Leşker, bajar û gundan îşgal dikin, mal bi mal li malên kurdên Iraqê digerin kontrola nasnameyan dikin, kesên li gor wan bi "şuphe" ne, yek bi yek tên girtin.

Li gor kultura kevin a ***yenîçerîyan,*** tirkan li hemû dîyar û gundên kurdên Iraqê, alayên xwe çikandin, bi awayekî çavkorî welatek ku ji berê de hatibû texrîb kirin, wan jî dan ber bombeyan û wêran kirin. Ketina herêmê ji rojnamevan, çavdêrên navneteweyî û herweha ji nûnerên ***Xaça Sor*** re jî hatiye qedexe kirin, ku karê wan ew e ku alîkarîya koçberên ku ji ber van bombardumanan direvin, bikin.

Durûtîya welatên ewropî

Ev êriş hema çi bigire du hefte berî îmzekirina *Peymana Gumrukê* ya di navbera Bruksel û Anakarayê de, (2) dagîrkirina Kurdistanê li ber çavê hemû hukûmetên ewropî pêk hat. Divê wusa bifikirin ku ji heqdestê xwe yê ji bo hemû xebatên xwe yên "gihandina vî welatî ber bi Ewropaya demokratîk" ve, bê par mane. Di demeke wisa de, ku bi soz û gotinên hevalbendên xwe yên tirkên sîvîl bawer dikirin û li hêvîya taqwîmeke da ku tedbîrên demokratîk bên stendin û bi cîh anîn, ji bo ku bikaribin rexneyên Parlemena Ewropayê kêm bikin û bikaribin vî welatê "niv demokratîk" bê soz û serhişk entegre bikin; lê belê ev soz, ji sê salan vir de gelek caran berê jî hatibûn dayîn, lê tewş derketibûn. Nuha jî li ber rewşeke emrî-waqî ne. Liberxweketî, Yekîtîya Ewropayê, nuha vê êrişa bê sînor "şermezar" dike û dixwaze ku bi "awayekî bi lez û bez" arteşa tirk leşkerên xwe bi paş de vekişîne. Halbûkî tu dewletekê, ev bûyer nebir ber destê Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekgirtî, da ku bikaribin vê îhlala girîng ya mafê navneteweyî niqaş û şermezar bikin. Bi tenê sê welatên rojava; Almanya, Norweç û Hollandayê qerar dan ku firotina çekan ji bo Tirkîyeyê bidin sekinandin. Fransa, ku divê di demeke nêzîk de, 20 helîkopterên ***Cougar*** teslîmî artêşa tirk bike, bi beyana wezîrê parastinê da zanîn ku dê ev firotin di wextê xwe de, li gor taqwîma tesbîtkirî bête meşandin.

Ji ber kêmasîyên tedbîrên cidî û li ber çav, bi tenê bi şermezarkirin û tirsandina îmzenekirina peymanên gumrukê, Tirkîye natirse û van tehdîdan cîdî nagire, ji ber vê yekê jî tu tarîxekê ji bo paşvekişandina artêşa xwe dîyar nake. Ankara dizane ku berê jî di sê salên bihurî de, Almanyayê du caran qerar da ku teslîmkirina çekan rawestîne. Ev jî bi tenê ji bo ku artêşa tirk bi çekên almanî êrişî sîvîlên kurd dikir, gundên wan vala dikirin û ew koçber dikirin, şerekî axa şewitî berdewam bû, raya giştî li hember vê şoke bibû, da ku bikaribin van reaksîyonan kêm bikin, ev biryar hatibû girtin. (3) Di vê demê de bi sedan kesên ji muxalefetê, ronakbîr û wekîlên kurd dihatin kuştin, an diketin zindanan.

Herweha dema ku tansîyon dadiket, piştî çend hefteyan firotina çekan dîsa dest pê dikir. Ji dema ku îmzekirina peymana li ser çekên konvansîyonel yên Ewropayê û vir de, Tirkîyeyê ji Bonê hejmarek bê hempa çek wek dîyarî girtine, ji van 300 tankên Almanya kevin ya rojhelat, 100 tankên Leopard, 45 firokeyên bombardûmanê Phantom, 250 000 kalaşnîkov, 100 000 roketên antî-tank, û hwd. Herweha di sala 1993ê de, Tirkîyeyê ji Washingtonê wek dîyarî: 1017 tank, 600 panzer û 70 top (4) girtine. Wek prensib, ev çek pewist e ku bi tenê di şerên derve de bên bi kar anîn û ne li hember şerên hundirîn û li gelên sîvîl. Ev çek bi awakî eşkere li Kurdistanê li hember sîvîlan hatin bi kar anîn û heta nuha ji 2 000an zêdetir gund û bi hezaran hektar daristan hatine şewitandin, gelek caran yekser bi bombardûmanên hewayî.

"Têgehiştina" a welatên rojava; Ankarayê heta nuha bi jîrîtî ji vê meseleyê sûd wergirt û ji bê qerarîya yekfikirî ya Yekîtîya Ewropayê û herweha ji dubendîyên fêdeyên wan yên cûda û ticarî îstîfade kir û li alîyên din têkilîyên xwe yên bi îmtiyaz bi Amerîkayê re berdewam kir. Ji ber vê jî Amerîkayê bi awayekî eşkere da dîyarkirin ku êrişa Tirkîyeyê baş "fam dike". Gelek pêkan e ku ev "famkirin" bi alîkarîya teknîk jî berdewam be. Li gor *Agence France-Presse* ê ku agahdarîyên xwe ji Wezareta Parastinê ya Brîtanî ya digire; artêşa tirk wêneyên hewayî yên Kurdisana Iraqê ji hêza hewayî ya Qralîyetê bi alîkarîya ***Harrier G27*** û ji ***Jagûarên fransî*** bi dest xistine. Herweha balafirên ***awacs*** yên NATOyê jî beşdarî vê alîkarîyê bibûn ku bi rewşeke normal ev herêm di bin kontrola wan ya multîneteweyî de ye. (5)

Bi budçeya 12.5 mîlyar dolar, 350.000 leşker û hemû çekên hewayî û bejayî, dîsa jî serşorî

Tirk ji bo ku êrişên xwe biheq derxin, dibêjin mafê me yê taqîbê heye, Washington ji dibêje: **"Temam, belê lê vî îşî zû biqedînin û leşkerên xwe paşde vekişînin".**

Behsa mafên çi taqîban dikin? Hemû çavdêrên navneteweyî û bisporên Tirkîyeyê baş dizanin ku ji çend mehan û virde ye ku tu çalakîyên leşkerî yên gerîlayên kurd li van herêman, li ser tixûban li dar neketine. Pevçûnên herî dawîn ên bi artêşa tirk re, berî sê rojan êrişa mezin ya tirkan bû û ew jî ne li ser sînoran, lê belê, ji wir dûr li hêla ***Dêrsim***ê bû, tam 500 km ji tixûbên Iraqê dûr: Di vî şerî de 15 leşkerên tirk ji alîyê gerîlayên PKK ve hatin kuştin. Di demeke wusa de ku bûyerên bi vî rengî êdî bûne edetî, di şerekî ku li gor Ankarayê 15850 kes, li gor PKKê jî 34200 kes di vî şerî de hatine kuştin.

Di vê êrişê de, li gor çavkanîyên hukûmetê ku hejmara kuştîyan li dora 320 kesan tê qebûl kirin, li gor agahdarîyên PKKê jî derdora çil kesan hatine kuştin, ev rewş wusa dîyar dike ku li vê herêmê ku ji alîyê miletê xwe ve terkkirî maye, ji dervayî çend kampên PKK û bi miqayese bi yên wan ku li hundurê Tirkîyeyê bi cîh in, gelek marjînal dimînin. Hejmara şervanên PKKê li hundurê welat di navbeyna 12 000 û 15 000 tên qebûl kirin.

Ji bo tu bahaneyan nedin mudaxeleyên zîyankar û herdayîm yên artêşa tirk, kurdên Iraqê di sala 1992yê de ji ber xwe ve hêzên PKKê ji herêmên seranserên tixûban derxistibûn û hemû çalakîyên leşkerî li ser vê axê ji bo wan qedexe kirin. Di wê demê de, 20000 leşkerên tirk dîsa tixûb derbas kiribûn, li gor wan ji bo **" bingehên paşsînor yên PKKê bi temamî ji holê rakin û herêmê bi carekê ve ji wan paqij bikin",** Ankarayê wê demê bi serxweşîya serkeftinê beyan dikir ku **"2500 teroristên PKKyî di vê operasyonê de kuştîne".**

Dagîrkirina heremê ji bo **"kemera ewlekarîyê"** û **"mintiqayek tampon"** ya xeyalî, wek xewna hinek generalên tirk, ku dikare şer bibe qada şerekî navneteweyî û bi vî awayî gelek kurdên Iraqê dikarin ber bi alîyê PKKê ve herin û bigihîjin wan, li hember dagîrkirîya bîyanî şer bikin. Artêşa tirk li butçeyeke 12,5 mîlyar dolaran (6), li gel 350 000 leşkerên xwe û li gel bi hezaran cendirme û cîhgirên wan û herweha hemû çekên hewayî, bejayî û top û tankên xwe ve, li Kurdistana Tirkîyeyê heta nuha tu serkeftineke leşkerî bi dest nexistiye. Herweha bi tu mudaxeleyên xwe yên leşkerî li vê herêma ku bi cografya xwe ya herî çetin û zor û asê ya hemû Asya rojava, wê nikaribe bi serkeve. Ger li gel hemû vê hêza xwe, nikaribin li hember hêzên PKKê li hundurê welêt serdest bin, bi çi fikrê dikarin vî karî ji kurdên Iraqê bixwazin ku ew bi xwe jî ji hemû van îmkanan bê par in da ku bikaribin sînoran biparêzin!

Dîplomasîya tirkî ji xwe re li behaneyeke din digere: ***Valahîyê tije kin, an jî vê valahîya otorîtê bi hevalbendên xwe re bidin dagirtin, da ku valahîya otorîtê li Kurdistana Iraqê nemîne.***

Rastî çi ye?

Rastîya problemê tiştekî din e: Ji bo bikaribin bi ewlekarî vegera du mîlyon kurdên Iraqê ku di bihara 1991ê de koçberî Îran û sînorên Tirkîyeyê bibûn, pêk bînin, Hêzên Hevkar ev herêma ewle li hember êriş û bombardûmanên Bexdayê ava kiribû, lê belê tu tedbîrên din yên li berçav yên îdarî hesab nekiribûn. Welatek ku bi mezinbûna axa xwe ji Lubnanê pênc car û nîvan mezintir û bi çar mîlyon nifûsa xwe, bi serê xwe û di nav derdên xwe de hîştibûn. Welatek ku bi temamî hilweşîyabe, ji sedî 70 kesên wî bêkar be, dê çawa bikaribe, birînên xwe derman bike û bikaribe xwe ji nû ve ava bike? Ger îmkanên wî yên teknîkî û aborî tune bin, ger sîstemeke îdarî ya xurt tunebe?

Di bin zixta xurt ya Tirkîyeke ku tirsa wê ew e ku; ev xwe îdarekirina kurdan û bingehek ji bo avakirina Dewleta Kurd î ya "de facto", bibe mînakek xirab ji bo kurdên xwe bi xwe, Ji ber vê jî, Hêzên Hevkar tu caran hukûmet û Parlamena Kurdistanê ya herêmî ku ji hilbijartinên azad û demokratîk derketibûn û ku di vê heremê de tiştekî kêm tê dîtin, li gel vê jî, bi awayekî fermî nas nekirin.

Herweha hemû destekên fînansî jî hatin red kirin, bi tenê alîkarîya bi têkilîya Rêxistinên Dervayî Hukûmetan , di "warê însanî "de bi awayekî mînîmûm hatin belav kirin, ku bi tenê têra ziktêrîya rojane dikir û ne zêdetir. Ji ber vê yekê têkçûna îdareya herêmî û bê îmkanî, dê cihê xwe ji şer û konflîktên nav birayan û yên grûbên cûda yên sîvîl re bihêle.

Berî ku hêzên leşkerî yên Bexdayê paşve vegerin, Tirkîye dixwaze vê valatîyê tije bike, nuha li hember xwe hêza Washingtonê dibîne, ku stratejîya wê ya dûr û dirêj; ji ya Tirkîyeyê, ya Fransayê, ya Rûsyayê û ji ya Çînê gelek cûda ye, ev welat hemû dixwazin ku têkilîyên bi **Sedam Huseyîn** re zû bi zû cardin bên normal kirin.

Amerîkîyan bi eşkere bi hevalbendên xwe yên tirk dan zanîn ku; ewlekarîya sînorên Iraqê divê bi qebûl kirin û

şirîkatîya serokên kurdên Iraqê re bê meşandin, ta ku rejîmeke demokratîk û temsîlkar li Bexdadê bê bi cîh kirin; bi tenê rejîmeke wusa dikare ewlekarî û otorîteya dewletê li hemû herêmê bi cîh bîne. Hemû ”mintiqeyên tampon li hember bidizî derbasbûna terorîstan” divê ji alî Tirkîyê di sînorên xwe de bên ava kirin.

Li gel hemû dilxwazîyên tirk, birêz Mesûd Barzanî û birêz Celal Talabanî, her dû serokên kurdên Iraqê, her car qebûl nakin ku bibin hêzên alîkar û yên yedek yên leşkerên tirk û ji civaka navneteweyî alîkarîyê dixwazin da ku bikaribin gundên wêrankirî yên li ser sînoran ava bikin. Bi tenê ev tedbîr dê bikaribin pêşketina tevgera şervanên PKKê bide sekinandin.

Di vî halî de, hemû operasyonên tirkan dê bi fîyaskoyên mezin yên leşkerî û polîtîk biqedin. Li gel hemû kampanyayên ”Birêkxistina Welatperwerî” û hemû bangên çapemenîyê di bin bandrola: ***” Bi artêşê re, dest bi dest, her ber bi pêş ve Tirkîye!!!”*** dê tu encamên dûr û dirêj nedin.

Li gel rejîma xwe ya leşker û polîs, Tirkîye, bi felsefeya nîjadperest, li hember hemû rêyên çareserîyên polîtîk yên pirsgirêka kurdî disekine û her roj ber bi şerên bêdawî û bêencam ve dişemite.

Û li gor alîkarê sekreterê dewletê, yê amerîkî, birêz **Richard Holbrooke**: ”Dibe welatê hemû talûkeyan”.
Bi polîtîka xwe ya li ser kurdan ya sedsaleke din, bi bihayên aborî û windakirina hêjayîyên mirovahîyê, civat bi tevayî marjînalîze bûye û cûdatîyên etnîkî û olî, tevgerên îslamî û ekstremîst peyda dikin; bajarên mezin dibin barûda amade ji bo peqandinên civakî. *”Pireya navbeyna Rojhelat û Rojava”* ji ber pirsgirêka kurdî bi tevayî kangren bûye û dikare çi wext be ji hev bikeve.

”Famkirina” ”çavgirtina” welatên Rojava ji bo grûpên şahîn û bi taybetî piştî mirina serokkomar **Turgut Özal**, van grûpan di siyaseta întixarê de pêşde bir û rê li ber hemû siyasetên ji bo çareserîyeke maqûl girt. Bi hejmara xwe, 25-30 mîlyon kurd, li Rojhilatê Navîn, têkoşînek ji bo hebûn û nebûn û ji bo parastina mafên nasnameya xwe didin, ger ev siyaset li herêmê bi vî rengî bê ajotin, rîskên ku hatin serê şahê Îranê, dikarin careke din li vê herêmê tekrar bibin, bi artêşa xwe ya pêncem mezin ya cîhanê û cendermeya Rojava li herêmê, dîsa têk çû.Baş tê zanîn tiştên hatin serê wî.

1 Michel Verrier, "Carte blanche à l'armée turque au Kurdistan"(*Desthilatdarîya Artêşa Tirk bo Ketina Nav Kurdistanê*), Le Monde Diplomatique, çirîya Pêşî 1993

2 Michel Verrier, "La Turquie piétine aux portes de l'Union européenne" (*Rawestana Tirkîyê Li Ber Derîyê Yekîtîya Ewropayê*), Le Monde diplomatique, Adar 1995

3 Jean-François Pérouse, "Terre brûlée au Kurdistan" (*Kurdistan, axa wêrankirî*), Le Monde diplomatique, Adar 1995

4 The European, 07-04-1995

5 Dépêche de l'Agence France-Presse, 29-03-1995

6 (*Li gor Wezîrê Karûbarê Navxweyî yê Tirkîyê*) Turkish Daily News, 29-01-1995

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

ÇIRÎYA PAŞÎN 1989

Di navbera Iraq û Îranê de heştsed hezar rehîne

ROLAND-PIERRE PARINGAUX *

Kînîzm û niyeta xirab ên ku ji sal û nîvekê û vir ve, xisleta wê "bazara mirovanîyê" dîyar kirin, ya ji bo vegera girtîyên nexweş û birîndar yên şer ku jimara wan dîyar e, tevî ku weke karê pêşikî tê dîtin, encama xirab a ku bi sed hezaran mirovên ji ber şerê Îran û Iraqê belawela bûne, pêş dibîne. Hal ev e ku tenê an jî bi komî, hemû bi siberojekê re rûbirû ne ku nikarin bandorê lê bikin û têra xwe neewle dîyar e.

Girtîyên şer, firarîyên leşkerîye, şervanên ku ketine destê dijmin, kêmnetewe, muxalifên polîtîk û qurbanên şidetê: Hemû kategorîyên metelhiştî, penaberên îranî yên li Iraqê û kombûyîna îraqîyan a ji nû ve li Îranê, piştî îstatîstîkên fermî nêzî 800.000 in. Hemû li ser "erdên dijmin" li bendê ne ku komek mirov û rêxistinên xurt li ser çarenivîsa wan li hev bikin: Rêveberên Bexdad û Tehranê, sekreterê giştî yê *Neteweyên Yekbûyî, Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor* (CICR) û *Komîserîya Bilind a Penaberan* (HCR). Lê kes pê nizane ka wê giranîya vê mozaîka însanî di muzakereyan de çiqas be.

Vegerîna girtîyên herdu hêlên şer ber bi welêt ve ku bi peymana agirbestê re hatiye plan kirin û bi parastina CICRê hatiye organîze kirin, di çirîya paşî ya 1988ê de bi nexweşan û birîndaran dest pê kir. Lê belê ji ber gelemşeya berdewam a navbera Bexdad û Tehranê ya li ser rêznameya pirsa polîtîk, guherînên der heqê însanî de bi tenê piştî sê seferên balefiran hate sekinandin. Nêzî 1 600 girtîyên nexweş û birîndar divabû di dawîya 1988ê de vegeriyana welêt. Heya niha tenê 155 îraqî û 56 îranî vegeriyane.

Wekî encam, alîyên şer tesdîq dikin ku di destê wan de bi awayekî fermî nêzî 70 000 dîlên şer hene (50 000 îraqî û 20 000 îranî). Sazîyên însanî texmîn dikin ku ev hejmar "herî kêm 100 000" e; lê piştrastkirina vê yekê zehmet e. CICR ji dawîya 1987ê û pê ve êdî nikare bikeve nav girtîyên şer. Iraq bi peymana Cenevreyê re destûra ziyaretê dide.

Em vê kategorîya qurbanan ku ji alîyê hiqûqa navneteweyî ve biîmtiyaz e, li alîyekî bihêlin, Îran –ji yên bi gelekî li pêş– beşa herî mezin a mirovên ji cih û warên xwe kirî, dihewîne: Bi fermî, nêzî 600 000 îraqîyên ji kokên cuda. Piştî ketineke giran, bi *Peymana Cezayîrê* (1975) ya di navbera rejîma Şah û Bexdadê de mohrkirî re, hejmar heya 100 000ê daket, her ku çû ji nû ve zêdetir bû.

Bi mîlyonan sirgûnîyên îranî û îraqî

Di 1980yê de Iraqa xwe ji şer re amade dikir, dest bi vederkirina muxalif û "dijminên hundir" ên potansîyel kir; bi taybetî li cihên şîiyên bi eslê xwe îranî (lê para bêtir welatîyên Iraqê) yên ku ji mêj ve li der û dora cihên pîroz ên şîîzmê bi cih bûne. Hejmara îraqîyên hundir ên li kampa Îranê wê salê ji 120 000ê bihurî. Dijmintîyê dest pê kir û ev hejmar her zêdetir bû: Di 1983yê de 300 000, di destpêka 1988ê de 520 000. Koçên ku ji alîyê bombardimanên kîmyayî yên berî û piştî agirbestê yên teyareyên Bexdayê ve li hemberî Kurdistana Iraqê hatin prova kirin li vê hejmarê zêde bûn. Di biharê de, bi hezaran kurd hatin Helebçeyê; di payîzê de, 40 000ên din ên ku di serî de li Tirkîyeyê li starekê digerîyan, hatin.

Bi vî rengî mirov dikare li Îranê ji hemû rengan mirovên ku ji Iraqê revîyana bibîne: hindikahî (kurd, tirkmen); hindikahîyên dînî (keldanî, asûrî, ermenî); muxalifên polîtîk; şervanên kurd (pêşmerge); firarên leşkerîyê.

Li alîye îraqîyan, hejmara girtîyên îranîyan (herî zede 100 000) şeş car kêmtir e; ev yek jî dezavantaj e ji bo Bexdadê. Li vir mirov dikare gelek kurdan jî bibîne. Di kampeke nêzî paytextê de 25 000 kesên ku ji sebebên polîtîk, firarên leşkerîyê û mirovên ku ji ber şer ji cih û warên xwe bûne, hene. Ji alîye rayedaran ve wekî penaberan tên hesibandin. Bi sedan îranîyên faris en bi piranî nêzî rejîma kevin in jî li kampeke din civiyane.

Rejimên ku guh nadin hiqûqê

Li başûrrojhilatê bi hezarên erebistanî (îranîyên ji etnîsîteya ereb) ku ji herêma ***Axwaz***a Îranê ya ku şer herî zêde têsîr lê kiriye, tên, bi derfeta xebatê û cihguhertinê, xwedî statûyeke taybet in.

Piştre, li cem şervanan, rewşa derketî holê wekî ya li Îranê heyî ye. Tevgerên kurdên Îranê yên ku Bexdad pişta wan digire û nisbî xweser in, wekî *Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê* (PDKI), li ser xeta sînor a bakurrojhilat çalak in. Heta, li Bexdadê bi xwe, bi hezaran mîlîtanên *Mucahidên Gel* hene.

Li herdu welatan, ji bilî şervanan, sirgûn li kampan civiyane û *Xaça Sor* berpirsiyarîya van kampan girt ser xwe û ji nêzîk ve xist bin kontrolê. Li Îranê bi hezaran (qurbanên Helebçeyê û rewşên tibî) sûd ji alîkarîya HCRê girtin. Lê ev tişt divê tunebûna madî û manewî ya piranîyan nede ji bîr kirin.

Qedera van hemûyan, qurbanên bingehîn ên şideta dewletan lê weke xemê di rêza duyem de, wê bibe çi? Li gor hinekan, *"ji bo ku hevpeyvîn neyên tev li hev kirin, axaftina der barê wan de bêdem e"*, lê belê problema dîlên şer dûrî çareserîyê ye. Bêîstisna ev hemû sirgûnîyên ku dema dev ji çekên xwe berdan, wekî tevgerên çekdar dihatin dîtin, "bîyanîyên li ser axa dijmin" in. Û ji alîye mafên mirovan ve bi peymana çaremîn a Cenevreyê tên parastin. Pêkanîna rêzgirtinê ya li hemberî vê rewşê karê CICRê ye. Mînak, divê esseh be ku xisleta vegerîna welêt a muhtemel bi dilê sirgûnîyan e.

Sirgûnî dikarin bi dilê xwe cihê manê yan vegerê hilbijêrin?

Jixwe tehlûkeya ku tişt tevlihev bibin jî di vir de ye. Mijar ev in; sozên negirtî û tecrûbeyên bixwîn ên berê, bi taybetî ji bo hindikahîyan wêrankirin û jicihûwarkirina gel; şideta îdeolojîk û fanatîzma dînî; hermonîkirina "xayîn"an ku li ser axa "dijmin"an mane; ji bo propagandayan îstîsmarkirina girtîyan; di dawîyê de, hessasîyeta pêvajoya aştî û siberojê: Ev hemû bi hev re ji bo afirandina derdoreke munasib a vegerînê kêm bi kêr tên.” Bisporekî van mijaran weha bi kurtî îfade dike *"Ev her du rejîm îsbata barbarîyeke ewhindê zêde, biçûkdîtineke ewqasî mezin a azadîyan û hiqûqê ne, ku gelek mirov bi tenê ji bo fikra vegerînê tên bêzar kirin.”*

Gelo bi rastî sirgûnî dê karibin tercîhê bikin? CICR wê doza vê yekê bike, lewra li gor prensîpa mafên mirovan, ev vegerîneke bidil e, ne bi zorê ye. Bi her halî wê di destê hikûmetên Bexdad û Tehranê de be ku derfetê bidin an jî nedin delegeyên swîsreyî bigihêjin kesên pêwendîdar. Tiştê ku tê xwestin, di nav sazîyên mirovperwer de tê nirxandin ku bi fikirîna li ser qîmetdayina derve qe nebe dê mirovên eleqedar hilbijêrin ku venegerin; û heta heke efûyeke giştî jî çêbe.

Dê gelek kes bidîqet çarenûsa mirovên pêşî ji welatê xwe dûrketî û veguherîna rewşên hundirî bişopînin, berîya, heke rewş guncaw be, biryara vegerê bidin. Dê îhtiyata wan ew qasî bêtir bê teyîd kirin lewra bi hukmên peymanê, parastina navneteweyî ya piştî vegerê pêş nabînin…

Bi hezarên din ên zêde lihevker, dê nikaribin zû bi zû xwe bidin ber tehlûkeya vegerê, heta belkî tu carî nikaribin. Iraqê di çirîya pêşî ya 1988ê de efûya giştî ragihand û gelo pêre bi awayekî zelal da zanîn ku "kesên weke sîxûrên Îranê yan jî artêşa êrişkar a îranî xebitîne” nakevin ber dilrehmîya wê?

Sirgûnî; ne objeya bazarê, lê pîyonên fedayî yên li ser mîhraba aştîyê

Ê wê demê dê kî yên venegeriyayî bixwaze? Rêz ji biryara dilê mirovan re bê girtin, mirov xwe ji qudreta vegerandina wan, yan jî pevguherandina wan jî bêpar bihêle, hingê mirov herweha bivênevê van mafan dide wan (argumana vê tirsê xwe dispêre zilm û zora piştî vegerê): Mafê penaberîyê, yê daxwaza starê û mana li kampan, Komîserîya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ve van kampan diparêze û alîkarîyê û mafê çûyîna farazî dide wan.

Lewre, erdên sozdayî dê li ku bên dîtin? Di nav demokrasîyên rojavayî yên ku weke parêzkar û starê navdar in? Ev gumanbar e, lewra bi salan e ku ji bo qebûlkirina çendek îranîyên li Tirkiyeyê û HCRyê jî ew bi awayekî li gor usûlê qeyd kirine, ji van demokrasîyan rica û lava tê kirin.

Tu kes nizane dê çawa ev tevlihevîya însanî bê nirxandin. Lê bi piranî gelek kes ditirsin ku bi hezaran îranî û îraqî, sirgûnîyên li ser "axa dijmin", piştî bûne qurbanên şer, êdî dê ne objeya bazarê bin, lê pîyonên fedayî yên li ser mîhraba aştîyê bin. Û divê îşaret bi girîngîya her yekê were kirin, di nav vê konteksta zor de, rola dîyarker a ku divê Neteweyên Yekbûyî –bi taybetî ya HCRyê- û CICR dewam bikin, pê rabin.

* Rojnamevan

Wergera ji fransî: Sevda Orak

Xirwatistan, dê di 1ê tîrmeha 2013ê de bibe endama bîst û heşt ya Yekîtîya Ewropî. Dengdaran, di 22yê çileya paşîn de beşdarbûna welatê xwe ya Yekîtîyê pejirand. Herçend dengên "erê" li dor % 67ê bin jî, beşdarîya kêm (%43yê dengên tomarkirî) a dengdanê rêjeya wê kêmtir dike. Di rastîyê de, xirwat bêşewq û heyecan xwe amade dikin ku beşdarî Yekîtîyê bibin. Perspektîfa ewropî, li hemî welatên herêmê gelek ji hêza xwe ya rakêşanê wenda kir.

PROJEYEKE BÎNÇIKANDÎ

Balkan û dawîya xeyala ewropî

JEAN-ARNAULT DÉRENS *

Xirwatistan dike bikeve Yekîtîyeke Ewropî ya wiha ku krîza herî girîng a dîroka xwe dijî, Ewropayeke ku tevî makyaja xwe ya demokrasîyê jî neolîberal û bêhed burokratîkbûyî ye, Mate Kapovic bi hêrs dibêje. Ev zimannasê xort ê ku têza xwe li Zanîngeha Zagrebê diqedîne, dibe yek ji berdevkên herî bibandor ê rikeberîya çep a li dijî entegrasyona Xirwatistanê ya bi Yekîtîya Ewropî re.

Ji dema ku Xirvatistan ketiye nav pêvajoya dirêj a endambûnê, yanî ji bêhtirî deh salan û vir ve, piranîya rexneyan ji derdorên neteweperest hatin. Wan gilîyê rîskên wendakirina serwerîya xwe û mecbûrîyeta hevkarîya bi hiqûqa navneteweyî re, ku dê bibe sedemê girtin û darizandina "qehreman"ên şerê serxwebûnê kir – bêyî ku em derdorên herî mihafezekar ên Dêra Katolik ji bîr bikin, ku li dijî Ewropayeke ku bixwaze mafê zarok ji ber xwe birinê, yan jî meşrûkirina zewaca nêremoyan li ser wan "ferz bike". Ji bo rastê nijadperest, Xirwatistan dê bi guhastina "girêdana" kevin a bi Belgradê ve bi "serdestîyeke" nû ya Brukselê re tiştekî bi dest nexe. Bandora van bîr û bawerîyan her dimîne; hîn jî bi bîr tînin ku çawa Dadgeha Cezayî ya Navneteweyî ya Yugoslavyaya kevin (TPIY), di nîsana 2011ê de, bîst û çar sal cezayê hefsê daye generalê kevin Ante Gotovinayî. Lê, pêşketina rexneyekî çepgiran yê li ser integrebûna bi Yekîtîya Ewropî re siyaseteke nû ya van salên dawîyê ye.

Weke li welatên din ên Balkanan, li Xirwatistanê jî, rikeberîya li dijî "Ewropaya lîberal" mirov dikare bêje ku ceribandina tevgereke nû ya çep a radîkal e, ku xwe bi dirêjîya xwepêşandanên 2010-2011ê bi awayekî eşkere nîşan da. Wê demê her êvar, bi hezaran kes li kolanên bajarên mezin ên xirwatî dimeşîyan û gendelîya rast ê mihafezekar ê ku hîn li ser desthilatê ye jî, weke *"dîktatorîya sermîyanî"* protesto dikir. Bangên nerazîbûna xwe dîyarkirinê li ser torên civatî yên weke Facebook an Twitterê belav dibûn, ev tevger her cûre avasazî û hîyerarşîyê red dike. Li Zagrebê, kortêj navendên partîyên serekî li dora xwe kom dikin –çi rast û çi jî çep– û her wiha jî sendîka û saziyên sereke jî. Xwepêşanderên ku di ber navenda Delegasyona Komisyona Ewropî re derbas dibûn, alaya ewropî dişewitandin. "Îhtimaleke pir zeîf e ku Xirwatistan pêşengîya tevgera cîhanî ya "nerazîbûn"ê bike, lê em yên pêşî ne ku me ev yek pêk anî", Kapovic dibêje û di bin simbêlan re dikene.

Nifşên nû û kevin di nav çepê de

"Zanîn ne malekî kirîn û frotinê ye". Ev ji du salan bêtir e, ev şîar li ser dîwarê pêş ê fakulteya fîlozofîyê ya Zagrebê hatiye nexişandin, ku bûye navenda serekî ya tevgereke xwendekaran a ku daxwazên wê yên radîkal weke lekeyên rûnî yên li ser caw li nav welêt belav dibin, sînorên Xirwatistanê derbas dikin û xwe digihênin komarên din ên Yugoslavyaya kevin. "Em dixwazin ku xwendina bilind ji bo herkesî belaş be, yek ji berdevkên vê tevgerê dibêje. Hikûmetê dixwest heqê xwe qeydkirinê li ser me ferz bike. Bi saya seferberbûna xwe, em biserketin ku rê li ber giştîkirina vî heqî bigirin. Xwendekar bi tenê divê ji bo sala sêyê û çarê heq bidin. Sala yekê, duduyê û pêncê her belaş maye. Ev lihevkirina hinekî jî seyr, rasterast ji alîyê entegrasyona ewropî ya hatiye îlan kirin ve tê tehdîd kirin, ji ber ku ew digel protokola Bolonyayê ya ku xwendina bilind li hemî welatên Yekîtîyê hevaheng dike, li hev nake... Ji bo me, qebûlkirina qaîdeyên ewropî bi xwe re pêşketinekê nayne, lê berevajî wê mafekî bingehîn dixe bin xetera ji navê birinê." Di payiza 2011ê de, vî xortê ku bi tercîhkirina "Erasmusa Têkoşînan" şûna sîstema heyî ya Erasmusê (pevguherînên xwendekaran) ku Komîsyona Ewropî pêş dibîne, li Belgradê gelek wext derbas kir, ku tevgereke xwendekaran wek ya wan lê pêk hatibû.

Hin hilbijêrên mihafezekar ên çep ên xirwatî bi çavekî baş li wan seferberîyên nû nanêrin. Miljenko Turniski, ji Buroya Demokrasîya Herêmî ya Osijekê, ku dikeve rojhilatê welêt, bi rê ve dibe. Rêxistina wî xwe pir daye hevkarîyên ser sînorê Macaristanê û her wiha jî yê Sirbistan û Bosna-Herseka cîran. Bajarê Osijekê yê ku ji alî hêzên sirbî ve hatibû dagîr kirin, ji şerên di destpêka salên 1990ê de gelek zirar dîbû. Turniski bixwe jî seferber bûye û gilîyê "tevlîhevîya" ku dora tevgerên nû yên protestokirinê pêçane dike: "Ew çi alternatîfan ji bo entegrasyona ewropî pêşniyaz dikin?". Ji bo wî entegrasyona li Ewropayê tê maneya normalkirina têkilîyên herêmî û yekane bersiva li hember bêdengbûneke neteweperestî ku rasta xirwat hê jî meyildara wê ye. Bi bilindkirineke birûmetî nîşandana Macaristana li ser nexşeya Ewropayê ya li paşîya buroya wî ya li ser dîwêr, ew jidil qebûl dike ku rewş li gelek welatên Yekîtîyê "ne baş e", lê dîsa jî bawerîya wî pê heye ku "nirxên ewropî", bi taybetî jî yên ku Konseya Ewropayê wad dike, derfeta pêşxistina civateke sîvîl û demokrasîyeke rastîn li Xirwatistanê û herêmê dide.

Belbî sedema nelihevkirina rexneyan ev e ku rexne ji aliyê rexnegirên ji nifşên cuda ne, tên kirin. Ji xeynî çend îstisnayên wiha, weke Nîkola Vîskovîc, profesorê rûmetê yê Fakulteya Hiqûqê ya Zagrebê û rexnegirê "emperyalîzm" û "mîlîtarîzm"a Yekîtîyê ye (1), piranîya rexneyên ji hêla çep ve tên, yên rewşenbîrên weke Kapovîcê ku herî zêde qederê sih salî ne. Ev nifş ne yê Yugoslavyaya kevin-, lê yê piştî wê ye: Wî çi bigire Federasyona Sosyalîst a kevin nas nekiriye û her çend ku ew carinan vê Dewleta wendabûyî îdealîze bike jî, ew komarên wêris di çarçoveyeke normal de dibîne û wiha qebûl dike. Ji ber ku di şerên salên 1990ê de seferber nebûye, ew her wiha jî piştî neteweperweran tê. Bi vî awayî, argumanê entegrasyona ewropî weke wasiteya li pey xwe hiştina nakokîyên di navbera welatên Balkanan de zêde tesîrê lê nake, lê têkilîyên bi komarên din re jî bo wî bûne tiştekî xwezayî.

Tevî ku hîn çend sal di ser re derbas nebûne, ku li hemî welatên Balkanên rojava, minaqeşeyên siyasî weke ku bi şerekî di navbera hêzên neteweperwer û tevgerên demokratîk de ku "alîgirên ewropî" bûn, tê rave kirin. Encama yekê ya vî tiştî jî ew e ku hemî xeterên din, bi taybetî jî yên girêdayî pirsên civatî, yan jî aborî û taybetîkirinê ne, derbasî plana duyê dikir.

Bi îhtimaleke mezin li Sirbistanê ev rikeberîya di navbera neteweperestîyê û entegrasyona ewropî de ye, ya ku herî hatiye dramatîze kirin. Ji dema hilweşîyana rejima Slobodan Mîlosevîc bi vir de, di çirîya pêşîn a 2000ê de, Partîya Demokrat (DS) ya serok Borîs Tadîc dev ji bikaranîna şantajeke exlaqî ya rast li hemberî Yekîtîya Ewropî bernedaye. Wî ji bo ku di lehê tevgerên "alîgirên ewropî" yên Sirbistanê de jestan bike rêkxistina xwe çêkir, da ku welat bi tehdîda "vegereke nijadperestiya weke salên 1990ê" re rû bi rû nemîne, her wiha jî dest dide ku ji rê derketin û gendelîya ku çîna birêveber a sirbî dikurisîne, serpûş bike.

Vê zivistanê dîwarên bajaran ji nû ve bi afîşên bi şîara "Em Yekîtîya Ewropî naxwazin!" ên Partîya Radîkal a Sirbî (SRS) ve hatine xemilandin. Heke ev partî hertim nêrîna entegrebûnê red bike jî, ji bo Partîya Pêşverû ya Sirbî (SNS) êdî perspektîfeke wiha ne di rojevê de ye. Di dawîya 2008ê de, cudabûneke mezin kete nav piranîya kadroyên SRSê û bi tenê çend kesên sadiq ên xeta dijewropî ya ku ji alî serokê dîrokî yê radîkalan, Vojislav Seselj ve, ji hucreya wî ya hefsa navneteweyî ya Scheveningenê dihate dîkte kirin, man. Tomislav Nikolic, birêveberê rêkxistina nû, bi rastî jî alîgirê entegrasyonê bû. Dîplomatên rojavayî yên li Belgradê jî wê gavê bi vê kedîbûna rastê tûj ê sirbî kêfxweş bûn û paşeroja îdeolojîk a Nikolic bi ya Gianfranco Fini yê îtalî re muqayese dikin û li ber piyên "alîgirê ewropî" yê nû xalîya sor radixin.

Ev heyranîya ji bo Ewropayê ne bi tenê ji bo kadroyên siyasî, her wiha jî ji bo derdorên aborî derbas dibe. Piştî hilbijartinên sirbî yên bihara 2008ê, tu piranîyeke zelal derneket holê. Bi gotûbêjkirina hikûmeteke "dilxwaza Ewropayê" li dora maseyên dewlemend ên Odeya Karsazên Belgradê, alîgirên olîgarşîyê di vê navberê de ji vê geremolê sûd wergirtin. Ji bo van karsazên dewlemend ên weke Mîroslav Mîskovîc, ku serekê împeretorîyeke herêmî ya belavkirinê ye, întegrasyona Sirbistanê ya bi Ewropayê re dê bi rastî jî derfeta "normalîzekirina" gencîneyeke ku destpêka wê digihê çalakîyên kirêt ên salên şerî û ambargoya navneteweyî, her wiha bi hêsanî rê li ber bazareke mezintir jî, veke.

Vê lihevkirina nû ya li ser dilxwazîya ewropî li tu derên din bi qandî li Bosna-Hersekê deng venedaye. Li Sarayevoyê, bi henek, hin dibêjin ku *"di salên 1990ê de, hemî partîyên ku şer birêvedibirin xwe weke demokrat nîşan didan; ji wê wextê ve, van heman partîyên ku desthilat bi berdewamî xistine destên xwe û hemî pêşketina welatî bloke kirine, hemî ji xwe re dibêjin ku dilxwazên Ewropayê ne"*.

Yek ji partîzanên herî bi kelecan ê integrasyonê ji xeynî Mîlorad Dodik, serokê Komara Srpska, "Pêkhata Sirbî" ya Bosna-Hersekê –welatê di teorîyê de yekbûyî, lê li gor sînorên ku di 1995ê de, di dema lihevkirinên aştîyê yên Daytonê de hatine danîn, her parvekirî, pê ve ne kesekî din e. (2) Tevî ku îlana wê ya di 8ê çileya paşîn a 1992yê de, derhal bûbû sedemê îlankirina şerî ku dê piştî bi çend mehan welat li ber xwe bibira, Komara Srpska di destpêka çileya paşîn de, bi şahşahayeke mezin bîst salîya xwe pîroz kir. Dodik ji fersenda heya sûd wergirt û dest nîşan kir ku "pêşeroja Komara Srpska di nav Yekîtîya Ewropî de ye". (3) Birêveberên sirbî yên Bosnayê, li hember dewleta navendî, daxwaza bihêzkirineke tecrûbeyên "pêkhatên" ku Bosna-Hersekê pêk tînin, kir. Ji ber ew êdî bawer dikin ku ev guherankarî dikare di çarçoveyeke ewropî de pir bi hêsanî pêk bê. Ew bi dilxwazî û hinek bi qurnazî weha dikin, weke ku li hember stratejîyên siyasî yên Yekîtîyê ya ku dixwaze dewleta navendî ya Bosna-Hersekê bi hêztir bike, matmayî mabin.

Kosovo, parêzgeheke ku skandal lê kom dibin

Li Kosovaya ku ji 1999ê bi vir de, di bin parastina navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî de ye û ji 2008ê bi vir de jî, ji serxwebûneke "bikontrol" a Yekîtîya Ewropî îstifade dike –ku hertim ji alîyê Sirbistanê (4) ve tê red kirin û li dinyayê bi tenê ji alîyê nod û sê dewletan ve hatiye nasîn –êdî rexneyên tûj tên bihîstin.

"Ev deh sal in, ku Kosova bûye qada ceribandinên polîtîkayên ewropî. Lê çi encam ji vê yekê derket? Aborîyeke têkçûyî, civateke ji gendelîyê kangrenbûyî, çîneke siyasî ya bêberpirsîyar" Arber Zaimi bi kerb dibêje. Zaimiyê bi eslê xwe arnawid, yek ji birêveberê serekî yê tevgera Mjaft "êdî bes e" ye, ku gendelîya çîna siyasî ya arnawidî eşkere dike. Wî di 2008ê de, ev tevger bi cî hişt, ji ber ku wî bawer dikir "kiryara RNH [rêxistinên ne hikûmî] ji bo çereserîya pirsan têrê nake, ji ber ku ew bêyî li sedemên wan bipirse, gilîyê encamên wan dike". Di encamê de ew çû Kosovayê, da ku li wê jî koordînasyona komîsyonên berpirs ên amadekirina bernameya tevgera Vetevendosja! ("Mafê çarenûsî!")yê bike. Bi piştrastkirina berpirsîyarîya xwe ya "şoreşgerî", ew bû yek ji sitûnên tora panarnawidî ya RROSHê, ku rêkxistinên siyasî û komeleyên hemî herêma arnawidbûyî ya Balkanan anîn ba hev.

Ji dema avakirina xwe ya di destpêka salên 2000ê de, Vetevendosja ji bona jinavbirina her cûre awayên parastina navneteweyî ya li ser Kosovayê û yekîtîya neteweyî ya arnawidî, li ser navê mafên gelan ên çarenûsî têdikoşe. Tevgera, ku nîşanên wê yên fikrî divê ji neteweperestîya klasîk bêtir li nav çepê tûndrew ê marksîst-lenînîst "enwerîst" (5) bên dîtin, cara yekê beşdarî hilbijartinên çileya pêşîn a 2010ê bû û li gor encamên fermî % 12.2yê dengan bi dest xist –di rewşeke balkêş a sextekarîyên mezin de, ku Vetevendosja jî miheqeq yek ji qurbanîyên wê yên serekî bû.

"Bijarteyên siyasî yên hemî welatên Balkanan meşrûbûna xwe ji civata navneteweyî werdigirin. Ew destûra hevahengîya demokrasîyê, hevdemîyê û bibandorîyê dide, Zaimî vedibêje. Ew bi kurtayî, ji xitabekê pê ve ne tiştekî din e ku bi tenê zanebûna vegotina wê bi awayekî rast û di wexta wê de têrê dike". Ji bo wî, pîvanên "birêvbirina baş" li Brukselê ewinde hatine mezin kirin ku ji xapandinê pê ve ne tiştekî din in: "Yekîtîya Ewropî îdia dike ku li dijî gendelîyê têdikoşe, lê di rastîyê de ew ji li riyên gîhiştina bazarê ji bo şirketên xwe yên halîhazir, an jî yên ku ew dixwaze bi berjewendîyên xwe re bibanîne pê ve li tiştekî din nagere". Rast e ku berdewamîya parastina navneteweyî ya Kosovayê bû sedemê derxistina holê ya skandalên bêjimar ên gendelîyê, ku di nav wan de karmendên vatinîyên navneteweyî –ku bi îddaya fêrkirina pratîka "birêveberîya baş" ji bo Kosovayê hatibûn– jî hebûn û bi roleke aktîv rabûn. (6)

Riya Vetevendosja bi lihevkirina ewro-atlantîkê ya ku bandora wê li ser çîna siyasî ya arnawidî ya Kosovayê re heye, ji hev diqete. Her çend ku tevger li hemberî entegrebûna bi Ewropayê re bê helwêst e jî, ew bawer dike ku ev yek ji bo Kosovayê ne armanceke serekî ya rastî ye û divê ew bêtir giranîya xwe bide ser pêşxistina aborîya xwe û demokrasîyeke rastîn. "Gelê me, weke hemî gelên din ên herêmê, ji alîyê van xwedêgravî "dostên" navneteweyî ve biçûk hatiye dîtin, ku ew her gav li riyên empozekirina modela pêşketina xwe digerin, Zaimi nerazîbûna xwe tîne zimên. Di nav van "qezencen civatî" yên meşûr de qey bi tenê

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 5**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 60 x 90 cm

yên xirab tunene, lê nerewa ye ku mirov bixwaze vê çarçoveya emrîwaqî li ser Kosovayê ferz bike. Qanûn û Destûra welatekî nikare ji derve de li ser wî bê ferz kirin. Ew berhemên pêşketina civatekê ne. Demokrasîyeke ku li ser mirov bê ferz kirin, dê ji demokrasîyeke sexte û şiklî pê ve ne tiştekî din be".

Rayên giştî bi tirseke mezin rewşa Yewnanistanê dişopînin

Ji ber ku qada manevrayê ya birêvebirên hilbijartî yên welatî – serokwezîr Haşim Taçî jî di nav de– xwiya ye heta niha tu carî ewinde teng nebûye, bandora "berevanên" Kosovayê ewçend xurt e û hîn bi ser de jî ya amerîkîyan heye, ev vegotin bêrawestan û hîn bêtir di nav civatê de deng vedide. Biserneketina partîya ***Fryma e Re*** ("Bayê nû") di hilbijartinên çileya paşîn a 2010ê de bû îfadeya geşbûna van devjengîyên siyasî. Vê partîyê dixwest "çina siyasî nû bike", lê bêtir jî "nirx û qaideyên ewropî" li Kosovayê biparêze. Bi kadroyên ciwan ên jîr ku bi piranî ji nav diaspora kosovayî li derveyî welat perwerde bûyî, ***Fryma e Re*** ji alîkarîya eşkere û piştgirîya balyozxaneyên rojavayî îstifade dikir; lê dengên wê yên kêm derfeta ku piyê xwe bavêje nav Parlamentoyê jî nedayê.

Di tîrmeha 1999ê de, piştî dawîlêhatina şerê Kosovayê bi çend hefteyan, Robin Cook, ku wê demê wezîrê karê dervê yê birîtanî bû, xetera piştî şerî, hîn wê demê dest nîşan kir û got: "Balkanan nebalkanîze bikin". Îdeolojîya li paş vê nêrînê êdî tu şikê di serê mirov de nahêle. Mana gotinê ew e, ku herêm ji "kûvîtîya" xwe, ji meyla xwe ya şidetê ya ji bav û bapîran de bê pak kirin, ku ji bo di encamê de mirov bikaribe berê wê bide qencî û pakîyên "şaristanîyeta ewropî", bi gotineke din nirxên siyasî yên rojavayî. (7) Tevî vê jî ev nêrîn ji alîyê birêveberên balkanî bixwe ve, bikêmanî ji alîyê yên herî "rojavayî" ve hate pejirandin ku di nav wan de serokê sirbî Tadicê ku di nîsana bihurî de, li Enstîtuya Lêkolînên Bilind ên Berevanîya Neteweyî (IHEDN) ya Parîsê, konferansek da û heman armanca "nebalkanîzekirina Balkanan" da pêş xwe. (8)

Dîsa, heke mebest nêzîhevkirina çand û karên siyasî yên welatên herêmê yên bi awayekî fermî ji alîyê Yekîtîyê ve hatine teşwîq kirin be jî, biserneketina "Ewropayîkirina" Balkanan misoger e. Li her du welatên ku "civata navneteweyî" –û bitaybetî jî YEyê– bêtir berpirsîyarî girtine, ango li Bosna-Hersek û Kosovayê, pratîka giştîbûyî ya gendelîyê û birêveberîya nebaş bêtir bala mirovî dikşîne. (9)

Heta li Kosovayê, bi raya giştî re jî ew heyranîya ku hîn berîya çend salan ji bo Ewropayê hebû, nemaye, lê rêkxistinên civata sîvîl bixwe êdî her ku diçe bêtir di dilê hevwelatîyan de ciyê xwe çêdikin. Çi li Kosovayê, yan jî li Bosna-Hersekê bin, ev rêkxistinên ku bi awayekî berfireh –weke li hemî welatên herêmê – ji alîyê fon û bernameyên ewropî ve tên fînanse kirin, bixwe jî ferqa di navbera gotin û kirinên misyonên ewropî de dîsa jî baş rexne dikin.

Ji zîrveya ewropî ya li Selanîkê ku di hezîrana 2003yê de çêbû û bi vir de, hemî welatên Balkanên rojava bi awayekî fermî endamên "muhtemel"in, ku wê rojekê, beşdarî YEyê bibin, eger ew hindik be jî "nexşeriya" sal bi sal ji alîyê Komisyona Ewropî ve nû dibe, taqîb bikin, Yekîtî jî pêşketina wan li gor "Pîvanên Kopenhagê" dinirxîne. Ev pîvanên ku di dema zîrweya li paytextê Danimarkayê, di 1993yê de, hatibûn dest nîşan kirin, bi awayekî giştî pêkanîna "sazîyên berdewam ên ku dewleta hiqûqî, mafên mirovî, rêzgirtina hindikayîyan û parastina mafên wan misoger bikin", her wiha jî "aborîyeke bazarê ya ku bikaribe bijî, pêk bînin" li ser endaman ferz dike.

Vegera dewseke "derdora bindest" ?

Di Ewropayeke ku bi krîzê diheje de, hevwelatîyên Balkanên rojava bi tenê dikarin li ser hêza tesîra van pîvanan û li ser rastîya "nirxên ewropî" pirsan ji xwe bikin. Rayên giştî bi tirs bûyerên ku li Yewnanistanê pêk tên, taqîb kirin, tevî ku wan demeke dirêj întegrebûna bi Ewropayê re weke ketina "klûbeke dewlemendan" û misogerîya îstiqrara aborî didît. Her bi vî awayî, ji her ku YEyê, di 2007ê de, welatên weke Bulgaristan an Romanya, ku tim di bin bandora gendelîyeke bi hêz de ne, entegre kirine, şik û guman her bê rawestan pir dibin û xwiya ye ku ew jî nikare li hemberî pirbûna nijadperestên Macaristanê tev bigere. (10)

Raya giştî her ku diçe bi şûn de vedikişe. Li Sirbistanê, li gor anketên hevwext, nîvîyê hindik ê hevwelatîyan bi tenê hîn jê piştgirîya nêrîna entegrekirinê dike û ev rêjeya beşdarbûnê bê rawestan ji hev belav dibe. Lê bijarteyên siyasî bi awayekî berfireh her weke alîgirên Ewropayê dimînin.

Ev lihevkirin ji alîyekî ve jî rê li ber gotûbêjeke rastîn digire. "Di mentiqê ewropî de, êdî ne mimkun e ku mirov awayê civata ku dixwaze tê de bijî, modêlên aborî û civatî yên ku hêvî dike minaqeşe bike. Pirsa bi tenê ya ku vekirî dimîne ew e ku mirov bizanibe aya birêvebirên me xwendekarên baş, an ne baş in, û gelo dikarin çareserî û modêlên li Brukselê hatine dest nîşan kirin, rast tedbîq bikin an na, Zaimi îsyan dike û dibêje. Ne ku bi tenê her alternatîf ne mimkun e, lê minaqeşeya siyasî bixwe dev jê berdide ku wateyeke wê hebe. Ew xwe bi gotûbêjeke teknîk a li ser awayê herî baş ê tedbîqkirina pîvanên binavûdeng ên YEyê xulase dike, ku ne mimkun e mirov li hember derkeve".

Mislav Zitko, aborînasekî ciwan ê xirwatî ye, ew balê dikşîne ser ku li Ewropaya ku ew bixwe sînorên xwe dîyar dike, welatên Balkanan ji pozîsyoneke "derdora bindest" -"weke ya ku berê di bin hukmê Împeretorîya Osmanî, yan jî yê komunîzmê de bû" pê ve tiştekî din nikare bixwaze, Zaimi bi kurtî dibêje:.

"Erêya bi şermokî" ku Xirwatistanê, di 22yê çileya paşîn de, pê entegrekirina welatê xwe ya bi Yekîtîyê re qebûl kir, ji alîyê birêveberên ewropî û her wiha jî ji alîyê desthilatên welatên din ên herêmê ku şika wan û "na"yekê hebû ve, bikêfxweşî hate pêşwazî kirin. Tevî vê jî, beşdarîya Xirvatistanê ya bi salan hatiye soz dayin, bêyî ku mirov li ser ji nû ve destpêkirina pêvajoyeke firehbûnê bikeve bahsê, dê piştî demekê pêk bê. Bersiva "westiyana ji ber firehbûnê" ya Ewropaya ku di nav krîzekê de ye, bêhêvîmaneke li welatên endam bû.

Ev jî tê maneya ku divê êdî projeya ewropî ji nû ve bê tarîf kirin.

* Gerînendeyê giştî yê Courrier des Balkans (http://balkans.courriers.info). Berhema wî ya dawîn: Voyage au pays des Gorani (Balkans, début du XXIe siècle) / Gerîyanek li Welatê Goranîyan (Balkan, di Destpêka Sedsala XXIê de), bi Laurent Geslin re, Parîs, Cartouche, 2010.

1 Jelena Simac, "Croatie: "Bienvenue dans l'Europe bureaucratique, impérialiste et néolibérale / *Xirwatistan: Bi xêr bê nav Ewropaya Burokratîk, Emperyalîst û Neoliberal*"", Le Courrier des Balkans, 13yê çileya paşîn a 2011ê

2 "La Bosnie-Herzégovine étouffe dans le carcan de Dayton/ *Bosna-Hersek di Xeleka Dayton de Difetise*" *bixwîne,* Le Monde diplomatique, îlona 2008ê

3 Interview au quotidien Danas/*Hevpeyvînên di rojnameya Danasê de*, Belgrad, 8ê çileya paşîn a 2012yê

4 "Prodiges et vertiges de la diplomatie serbe/ *Mûcîze û Sergêjîyên Dîplomasîya Sirbî*" bixwîne, Le Monde diplomatique, îlona 2010ê

5 Ji navê birêveberê komunîst ê arnawid Enwer Xoce (1908-1985) ku sadiqê xeteke stalînîst bû

6 Serbeze Haxhiaj, "Au temps béni de la colonie: le Kosovo et ses protecteurs internationaux /*Di Dema Pîroz a Kolonîyê de: Kosova û Berevanên Wê yên Navneteweyî* " bixwîne, Le Courrier des Balkans, 14ê çileya pêşîn a 2011ê

7 Maria Todorova, Les Balkans imaginaires/*Balkanên Xeyalî,* bixwîne, wergera ji îngilîzî ya fransî Rachel Boyssou, Editions de l'EHESS, Paris, 2010

8 Dominique Thierry, "Boris Tadić plaide à Paris pour la "débalkanisation des Balkans" /*Borîs Tadîç li Parîsê "Nebalkanîzekirina Balkanan" diparêze",* Le Courrier des Balkans, 7ê nîsana 2011ê

9 Bedrudin Brljavac, "Europeanisation process of Bosnia and Herzegovina: responsibility of the European Union?/*Pêvajoya Entegrekirina Bosna û Hersekê bi Ewropayê re: Berpirsîyarîya Yekîtîya Ewropayê?",* Balkanologie, vol.XIII, 1-2, çileya pêşîn 2011, http://balkanologie.revues.org.

10 G. M. Tamas, "Hongrie, laboratoire d'une nouvelle droite/*Macaristan, Laboratuara Rastekî Nû*" bixwîne, Le Monde diplomatique, sibata 2012ê

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Maoîstên Nepalê tebaxa 2011ê vegerîyan ser hikum û bi pey pênc salên dudilîyên li ser tevlîkirina şervanên wan a di artêşa neteweyî de, pêvajoya aştîyê dîsa dest pê kir. Di komareke federal a nû de ya ku sînorên wê yên sazûmanîyê ne dîyar in, ew mecbûr in ku bi hêzên siyasî yên din re li hev werin da ku destûreke bingehîn berîya dawîya meha gulanê pesind bikin. Bi vî rengî, ew dixwazin nîşan bidin ku ew dikarin civakeke ji ber bertîlxurî û gendelîyê têra xwe pêşneketî biguherînin.

Meşa dirêj a parlemanîyê ya maoîstên Nepalî

Piştî şerê navxweyî, ji nû ve sazkirina pergaleke siyasî

Philippe Descamps *

Rupak li ser motosîkleteke hindistanî ya piçûk li nav erebe û kamyonan bi lez diajo. Trafîk rê nade wî ku li hilatina heyvê ya li ser lûtkeyên berfîn ên **Langtanga**yê, di dûrahîya esmanekî bi barana *mûson*ê şûştî binêre. Li ser *Ring Road* (riya derdorê) a **Katmandû**yê, divê hayê mirov ji otomobîlên ji alîyê berovajî tên, kortal, peya, bîsîkletajoyan hebe... û heta mangeyan jî. **Rupak** diçe hevalê xwe **Ajay** bibîne, ew ê çayekê vexwin û çend cixareyan jî bikişînin. Di nav du sohbetên telefonî re, ev herdu mîlîtanên ciwanên maoîst behsa xeyalên xwe dikin. Ew 20 salî ne, dixwazin di sedsala 21ê de bijîn û weha bawer in ku komunîzm dikare dinyayê rizgar bike.

Ajay rave dike: *"Di paşxana welatê me de, şerê navxweyî pêwîst bû. Em di vî şerî de bi ser ketin. Lê em hîn ne serbixwe û bixwebawer in. Bi nêrîna me, komunîzm têk neçû, lê ji rê hat derxistin. Em ne pergala sovyetî û ne jî pergala çînî dixwazin. Em di sedsala xwe de, li gel* ***Facebook*** *û* ***Înternet****ê dijîn. Ji bo guherandina civakê, divê em di pergala parlemanî de cih bigirin. Em guherîneke gav bi gav dixwazin. Berî ku bigihîjin sosyalîzmê, divê em bi rêya sermayedarîyeke pêşverû ji feodalîzmê derkevin û mafên hemûyan biparêzin, nemaze mafên xelkên niştecih wekî me Tamangan".*

Di sî salan de, nifûsa Nepalê du qat zêde bû û gihîşt bîst û heft mîlyon niştecihan. Nifûsa paytextê jî, di dehsala dawîyê de, % 60 zêde bû. Tevî bacên li 2008ê ji hêla hikûmeta pêşî ya maoîstan ve ferzkirî, nifûsa otomobîlan jî di zêdebûnê de ye. Bê guman, awayê herî baş ê rêlibergirtina qezayan, tamîrkirina riyan e... Li nav ticarên seyyar, sîklopûs (taksîyên bîsîkletî) û tûk-tûk (trîsîkletên bimotor) ên umûmî, mirov bê navber li kornayê bixe jî, serê seatê ji sî kîlometre bêhtir rê çûyîn serkeftineke mezin e. Bi pasîfbûnê re, folklora bajarî ya li metropolên asyayî ji holê radibe, li vir, gihîşt noqteya xwe ya herî bilind. Bi wesayîtê, bedêla çûyina navenda bajêr tenê 15 santîm e. Di erebeyeke ku li Ewropayê wek "neh cihan" ê bihata îlan kirin, kursîyên panzdeh kesan hene û rêwî jî pir caran du qatên vê hejmarê ne... Tûrîstên ku dawîyê xwe dewlemend hîs dikin, bi piranî taksîyên japonî yên piçûk, lê fiyeta wan bîst caran bilindtir tercih dikin. Herçi nepalîyên di ticaret, an tûrîzmê de serkeftî, erebeyên erazîyan dajon, yên ku tevî bacan, sê car û nîv ji yên rojavayî bihatir in.

"Em di hilbijartinan de bi ser ketin... lê ne bi temamî"

Kolan yek ji van zemînên kêmdîtî yên ku hemû sinifên nepalî tê de tên cem hev û kesên bi lez diçin li hember yên ku hêdî hêdî diherin qet bi dîqet tev nagerin. **Henrî Sîgayret** ê fêrî vê derê bûyî, rewşê bi gotineke weha şirove dike: *"Nepalî çawa tev digerin, wisa jî diajon".* Piştî ku li 1979ê cara pêşî li serê çîyayekî 8 000 metre –çîyayê Annapurna– bi skîyan hilkişîya, dilê vî muhendîsê grenoblî ket van çîyayan û gelê li ser wan dijî. Berî bîst salan li Nepalê bicihbûyî, ew bi wextê re bûye maobadî, yanî parêzvanê maoîstan. Ew bi kêfxweşî wan weke şoreşvanên 1789ê nîşan dide: *"Gelê herî perîşan ê Asyayê serî hildaye û li dij mîrnişînekê, arîstokrasîyeke sinifî û burokrasîyeke feodal şer kiriye".* (1) Herçi çîyahilkiş, gerok an tûrîstên ku hezkirina xwe ya ji bo Nepalê îlan dikin û pir bi zû parêzvanîya doza Tîbetê dikin, **Henrî**yê 76 salî ji ber rûnedana wan a li hemberî rastîya Nepalê ya civakî û siyasî, ji bilî çend çalakîyên weqfên hîbekar, hêrs dibe.

Hit Bahadurê kevnewezîr û endamê komîteya navendî ya ***Partîya Komunîst a Yekgirtî ya Nepala maoîst*** (PKYN-M) nermtir derdibire: "Em di şer de bi ser ketin... lê ne bi temamî. Em di hilbijartinan de bi ser ketin... lê, dîsa jî, ne bi temamî. Mijdara 2006ê, di dema îmzekirina peymanên aştîyê de, sê çarêkên welêt di destên maoîstan de bûn. Rewşa wan weha xurt xuya bû û dida pêşdîtin ku ew ê bikaribin vederkirina key, devjêberdana xusûsiyeta hindûyîst a dewlet û hilbijartina meclîseke destûrnivîs ferz bikin. Lê belê, leşkerên serîhildêr ne bes bûn ku bajarên mezin vegirtin û li hember artêşeke ku doza tevahîya desthilatê bikin ku Dewletên Yekbûyî, Keyatîya Yekgirtî, Hindistan û Çîn piştgirîya wê dikin. Roja 28ê nîsana 2008ê, maoîstan hemû pêşdîtin pûç derxistin; wan di hilbijartinan de serkeftineke pir mezin bi dest xist û ji 601 kursîyan 229 wergirtin (% 30 dengan û % 38 hilbijartîyan bi saya dengdana nîv-rêjeyî). (2) Wan ***Partîya Kongreya Nepalî*** (119 kursî), ***Partîya Komunîst a Nepala Marksîst-lenînîst a Yekgirtî*** (PKN-MLY, 109) û ***Foruma Mafên Gelê Madhesî*** (83) li dû xwe hiştin. Lê belê, piştî bidestxistina komarê, ji bo berdewamîya pêvajoya aştîyê lihevhatineke zehmetir diviya. Divê destûra bingehîn a bê, ji hêla du sêyêkên wekîlan ve were pesind kirin. Leyistikên parlemanî dîsa dest pê kir û pêleke nû ya rêgirtin, çavtirsandin, xwepêşandan, qutbûn û hemêzan bi xwe re anî.

Li gor dîrok û axaftinên wan, dibe ku hemû partîyên nepalî yên xwedî nûner ji hêla çavdêrên rojavayî ve li çepê bên hesibandin. ***Partîya Kongreya Nepalî*** ya demeke dirêj serkêşî dikir, weha hîn xwe wek partîyeke sosyalîst dide xuyan. Li ser navê têkoşîna ji bo demokrasîyê, mîlîtanên wê di salên 1950yê de çûn serê çîyê. Lê belê dema ku hat ser kar, ew wek partîyeke muhafezekar tev gerîya, xizmeta kesên xwedî îmtiyaz kir û ferdîkirin parastin. Li hember vê jirêderketinê, komunîzm xelkê bi alîyê xwe ve dikişîne. Bêhtirî bîst partî xwe komunîst nîşan didin. Ji wan partîyan, PKN-MLY bi pey şoreşa gelêrî ya 1990ê pêşî roleke girîng leyist û di pratîkê de, pir "navînî" bû. Tevî reqabeta wê ya di gel Partîya Kongreyê, ew hê jî li ser pirsên kilît pir nêzîkî wê ye. Nivîsarên nepenî yên balyozê amerîkî li Katmandûyê, yên ku berîya demekê ***Wikileaks***ê ew weşandin, têkilîyên nêzîk ên serokên Partîyê li gel wî îspat dikin, heta hin ji wan jî, weke **Khadga Prasad Sharma Olî**, agahdêrên rasterast ên Amerîkayê ne. (3)

Komunîstên ku xwe "maoîst" nîşan didin, li ser pankart, an kartên ziyaretê yên hilbijartîyan li cem bikaranîna nîgarên **Karl Marx, Friedrich Engels** û **Lenîn,** timî wêneyên **Joseph Staline** û **Mao Zedong** jî bi kar tînin. Lê belê, tercihên wan ên siyasî yên konkret ne dûrî yên sosyal-demokratên ewropî ne. Tevî ku neteweyîkirin, yan aborîya plankirî, yan tenzîm di axaftinên wan de derbas nabe, têra xwe jî behsa hevkarîya umûmî-ferdî (3P, yanî "public-private partnership [hevkarîya di navbera dewletî-taybetî de]") tê kirin.

Wekî din, ev partî meyl, heta fraksîyonan jî dihewînin ku, pirî caran, bi şexsekê ve girêdayî ne. Li nav maoîstan, meyla **Baburam Bhattari** yê kevneîdeologê partîyê û serokwezîrê heyî yê pir pragmatîk heye, ku bi hevkarîya meyla serokê dîrokî **Pushpa Kamal Dahal** ê bi laqabê "Praşanda" tê nasîn, li hemberî îsyana hevalên cîgirê serokê partîyê, **Mohan Baidya** yan "Kiran" têdikoşin, ku wan bi her fersendê "berjewendîperest" û heta "xayîn" jî îlan dikin, lê belê timî beşdarî sohbet û dengdanên Meclîsê dibin.

Komîserê siyasî yê ***Nuwakot***ê di dema şer de, Bahadur li 2004 û 2005ê sêzdeh meh li zîndaneke hindistanî derbas kirin. Ew ji 14 salîya xwe ve siyasetê dike û dizane ku rêya "demokrasîya nû" hîn dûr e. Ew dibêje: *"Komara laîk serkeftineke mezin bû. Lê ji bo welatîyan, xizanî hîn xizanîya berê ye; zehmetkêşî jî neguherî. Ji bo çarekirina pirsgirêkan, divê em di serî de pêvajoya aştîyê bi tevlîkirina şervanan teva bikin û destûreke bingehîn a demokratîk pesind bikin. Tiştê zehmet ev e ku reqîbên dîyar tunene. Ew bi dizî dixebitin".*

Desentralîzasyon ji bo şkandina serdestîya kastên serdest

Şerê navxweyî yê bi şideta nizim dîsa jî di deh salan de bû sedema sêzdeh hezar kuştî, du sêyêk ji wan jî endamên hêzên hikûmetê. (4) 2006ê, nozdeh hezar û pênc sed şervanên ***Arteşa Gelêrî ya Rizgarîyê*** bi serpereştîya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) di baregehên li welêt belavbûyî de hatin kom kirin. Ji wê demê û vir de, pirsa tevlîkirina wan a li ser artêşa fermî, jîyana siyasî asteng dike. Tebaxa 2009ê, ev bû sedema îstîfaya pir bi deng a serokwezîr **Dahal**. Serokê maoîstan xwest serfermandarê artêşê, **Rookmangud Katawal** ê li dij tevlîbûna Neteweyên Yekbûyî jî diparêzin, ji wezîfeyê dûr bixe. Serokkomar desthilata xwe derbas kir û bi piştgirîya partîyên din, biryara serokwezîr pûç kir. Maoîstên ku xwe spartin muxelîfbûnê bi pey re hewl da ku bi riya kolanê bi ser kevin. Lê

Ayub Raoof Mahmood: **Bênav 11**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 40 x 40 cm

Hindistan, cîraneke nerihetker e

Li nav Hindistan û Çînê asêmayî, Nepal li hember van herdu hûtên ku nifûsa wan çil carî li hêla wê ye, xwedîyê hêzeke kêm e. Tevî ku, li bakur, barîyera Hîmalayayê tucarî sînoreke nayê derbaskirin nebû, bandora Hindistanê ji deştên başûr ji ya Çînê ya di ber Tîbetê re hatî berbiçav û kûrtir e.

Serdestîya Hindistanê di çanda irf û adetî ya nepalî de li gel girîngîya dînê hindû (% 80 nifûsê), pergala kastan a hîn pir bi mane û zimanekî resmî yê xizmê hindî yê ji hêla malbata keyî ve ferzkirî tê pîvan. Van demên dawî, vê serdestîyê bi fêrkarîya elîtan di heman dibistanan de û têkilîyên nêz ku bi taybetî li nav Partîya Kongreyê û hevnava wî ya nepalî hatin danîn rû daye. Ev bandor bi peymana aştî û dostanîyê ya 30ê tîrmeha 1950î li nav herdu welatan îmzekirî rê û resmî bûbû.

Tevî naskirina serxwebûna Nepalê, New Delhîyê her weha li ser hikûmeta wê ferz kir ku li ser çi têwerdan an nakokîya dikare têkilîyên cîrantîya baş xira bike agahîyan bidiyê. Ji bo nifûsên herdu welatan, peymana – ku hîn li ser kar e – nebûna vîze û heta sînorên rasteqîn jî, li gel azadîyeke teva ya cihdanîn û xwedîtîyê pêş dibîne. Hindistan hîn xwedîyê mafê îtîrazê ye li ser siyaseta derve û parastinê ya cîranê wê yê piçûk û herweha çavê xwe berdaye serêkanîyên wê, bi taybetî yên avî. Li 1989ê, dema ku Nepalê xwest karnameyeke ji bo Hindistanîyan çêke û çekên çînî bikire, abluqayeke pir xirab ew vegerand ser riya rast.

Pekîna ku pir girîngîyê dide naskirina "Çîneke tenê" û bêdengkirina koçberên tîbetî li başûrê sînorê xwe, her weha li hember îqtîdara heyî li Katmandûyê bi awayekî lihevker tev gerîya û di riyên ber çîyayan re pareyekî mezin razand. Tevî referansa îsyankeran a ji bo **Mao Zedûng**, hikûmeta çînî ji ber hatina wan a ser kar pir meraqdar bû û alîkarîyeke leşkerî jî da key Gyanendra. Hatinên çekên çînî, her weke têwerdana Dewletên Yekbûyî, bê guman bûye sedema biryara New Delhîyê ya devjêberdana key û ji 2005ê ve, leyistina karta pêvajoya aştîyê, (1) tevî endîşeyên wan li hember îsyankerên ku, di warê îdeolojîk de, nêzîkî gerîlaya naksalît a li Hindistanê bûn. (2) Sekna Hindistanê li ser du esasan bû: mîrnişîna destûrî û pirpartîyî. Hêza raperîna nepalî û jirêderketina key weha kir ku ew dev ji esasa pêşî berde û bawerîya xwe ya bi leyistika siyasî biparêze.

Hindistan cîranekî nerihetker e û bi rihetî wek gunehkarê bijartî tê bikaranîn. Mebestên ku ji vî "birayê mezin" re tên dayîn yek ji çîmentoyên hindik ên netewparêzîya nepalî ne. Di ber îsyanê de û dema ku nûnerên muxalefetê bûn, Maoîstan bi giranî retorîkeke dij-hindistanî bi kar anî. Du meh bi ser tayîna wî li dewsa serokwezîr re derbas nebûbûn ku **Baburam Bhattarai** yê maoîst dîsa jî çû New Delhîyê, 23yê cotmeha bihorî, da ku peymaneke girîng a veberanîna dualî îmze bike. Dîroknasan rola biryardêr a Hindistanê di kêlîyên girîng ên jîyana siyasî ya nepalî de, ji serxwebûnê ve, îspat kir. Peymana dawî ya li ser pêvajoya aştîyê jî li gorî vê qaydeya nenivîsî diçe.

PH. D.

1 Bishnu Raj Upreti, " External engagement in Nepal's armed conflict ", di Mahendra Lawoti û Anup Kumar Pahari (brv.), *The Maoist Insurgency in Nepal,* Routledge, New York, 2009

2 Nicolas Jaoul û Naïké Desquesnes, " Les intellectuels, le défi maoïste et la répression en Inde / Întellektuel, pirsgirêka maoîst û zilm û zor li Hindistanê", *Le Monde diplomatique*, cotmeh 2011

belê, rabûna ser piyan a civakî ya xurt a payîza 2009ê têrê nekir.

Dhruba Raj Adhikariyê kevnefermandarê lîwayeke serîhilder a sê sed mêran, bi feylesofane dibêje: *"Ji bilî serketfina pêvajoya aştîyê çareyeke din tuneye. Jineke ducanî divê di serî de zaroka xwe bîne dinyayê berî ku li ducanîbûnên din bifikire"*. Ew li qata jêrîn a xanîyekî piçûk ê kevîya bajêr dijî; li paş yek ji kargehên Pepsi Cola yên kêmhejmar ên Nepalê. Jina wî, **Sunita Regmî**, kevneserhildêr e. Wê di şer de nigê xwe yê çepê û mêrê xwe yê pêşî, fermandarê ***Basanta***yê, winda kirin: *"Ez li tevlîbûna şer ne poşman im. Min bixwe pir tişt ji dest dan. Lê belê, qurbanîya me pir tişt jî ji welêt re misoger kirin"*. Bes, **Adhikarî** dibêje, *"Eger têkoşerên guherînê bên ji bîr kirin, guherîn nikare bidome"*.

Peymana ku 1ê mijdara 2011ê li nav çar partîyên sereke (5) hat îmze kirin, tevlîkirina şeş hezar û pênc sed şervanan di rêvebirineke taybet a artêşê de pêş dibîne, ya ku % 35ê maoîstan vedihewîne û ji bo ewlehîya projeyên binesazî, daristan, an operasyonên rizgarîyê dixebitin. Ji şanzdeh hezar û pênc sed şervanên ku kanûna 2011ê di wargehan de qeydkirî bûn, zêdetirî neh hezaran dixwazin tevlî bibin. Hindek ji wan fêrkarîyek qebûl kir, lê belê nêzî heft hezar û çar sedan malnişîneke vîndar bi tazmînateke ji 5 000 ta 8 000 euro (meaşê asgarî 62 euro serê mehê ye) tercih kir.

Tezmînkirina mexdûran jî tê pêş dîtin, her weke sazkirina komîsyoneke rastî û lihevhatinê û komîsyoneke lêpirsînê li ser kesên winda. Yek ji noqteyên hesas ku sozên rabihorî li ser wan bê encam man, jihevkirina sazîyên paramîlîter ên ciwanên maoîst (Lîga Komunîst a Ciwanên Maoîst) û vegerandina erdên di ber şer de zeftkirî ye. Partîya Kongreyê ku xwe wek parêzvana xwedîerdan îlan kir, şeş hezar malbatên eleqedar hejmartin. Li çileya bihurî, hikûmetê firehîya vegerandinan bi sînor kir û pêşnîyara naskirina hemû danûstandinên fînansî yên di herêmên bin destê gerîlayê de û ji hêla wê ve qebûlkirî, derxist pêş.

Dadgeha Bilind jî berdewamîyeke "dawî" ya şeşmehî ya nûnerîya Meclîsa Destûrnivîs pejirandiye û ji bo pesindkirina Destûra Bingehîn hejmartina bi paş ve da dest pê kirin. Tarîxa dawî ya ku li dawîya gulana 2012ê hat îlan kirin, ji xwe rê daye partîyên mezin ku li ser piranîya noqteyên piçûk li hev bên. Lê belê, raxistina federalî û awayê hilbijartina desthilatê hîn mijarên nîqaşê ne. Piştî bernameyeke televîzyonî, **Arjun Narsingha** yê mezinekî Partîya Kongreyê û **Dinanath Sharma**yê berdevkê Maoîstan û wezîrê nû yê perwerdeyê, van nêrînên cuda minaqeşe dikin. Tevî ku herdu tevger van salên dawîyê li hemberî hev bin û tundî tev geriyabin jî, herdu kes kubarîyê li hev dikin. Sohbeta ji ber çûna ceyranê hatî birîn (di demsala ziha de, ceyran rojê heta şanzdeh seatan tê birîn) bi laqirdî û nîşanên dostane derbas dibe. *"Em pergaleke serokkomarî, yan raxistineke federalî ya li ser bingehên nijadî naxwazin"*, **Narsingha** dibêje. *"Ji bo dawî li dudilî û neistiqrarîya parlemanî bê anîn, em dixwazin ku serokkomar ji hêla xelkê ve bê hilbijartin,* ***Sharma*** *bersivê dide. Her weha, wexta qebûlkirina daxwaza birêvebirina xweser a gelên pirhejmar ên Nepalê hatiye. Divê îmkanên tunekirina xizanî û bertîlxwarîyê, zêdekirina mafên jinan û yên kastên jêrîn di destê me de bin"*.

Dibe ku ew li ser rejîmeke tevlihev li hev werin, li gel serokkomar an serokwezîreke/î rasterast tê hilbijartin, lê desthilata wî bi îqtîdarên parlemanî yên xurt sînorkirî ye. Pirsa federalîzmê – daxwazeke Maoîstan ku di prensîbê de ji hêla herkesî ve tê qebûlkirin– birîske. *"Em dewleta xwe ya şerpa dixwazin, li gel rêzgirtina ji hindikahîyan"*, **Kripa Sur**ê kevneserokê ***Komeleya Şerpa ya Nepalê*** dibêje. Ev gelê newalên bilind ku ji ber xizmetkarîya xwe ya çîyahilkişên rojavayî baş tê nasîn, hindiktir ji % 0.5 nifûsê ye. Di welatekî weha de ku nod û du zimanên neteweyî lê hene û nepalî zimanê zikmakî yê kêmtir ji nîvê nişteciyan e, ku her gelek dewleta xwe ya xweser bixwaze, ew ê bibe sedema jihevketina welêt. Lê belê, veguhastina hin hêzan li civatên gundî, dikare birêvebirineke baştir a serêkanîyên umûmî bi xwe re bîne. Desentralîzasyon dê herweha rê li ber şikandina serdestîya kastên jorîn li ser civakê veke. Hîn divê hevsengîyeke navherêmî ya lihevhatî bê dîtin, tevî ku piranîya zengînîyê ji paytext û newalên boş û bi bereket ên Terayê tê, ku nîvê nepalîyan lê dijîn. Piranîya Komîsyona Nûsazkirina Dewletê dawîya çileyê raxistineke bi yanzdeh herêman pêşkêş kir û di her herêmeke de, serdestîya nijadekê nas kir. Lê sê endamên wê bi tenê şeş herêmên xwerû cografîk pêşnîyar kirin. Meclîs wê biryarê bide.

Hatina serê şexs ji *Bangladeş* an *Afganistan*ê kêmtir e û Nepal bi vî rengî welatê herî xizan ê Asyayê ye. (6) Di warê "pêşketina mirovî" de, RNY wê li nav dewletên afrîqî yên dawîyê rêz dike: 157em ji 193 welatan. Tevî ku perîşanî bi qasî dehsaleke berê ne berbiçav (7) û şokdêr e, dewlemendîya hindik bi awayekî xirab jî tê parve kirin. 2010ê, çarêka nifûsê li bin sînorê xizanîyê ya serê salê 180 euro dijîya. (7) Kêmbûna gihîştina ava vexwarinê, avdestxane, mamosteyên perwerdekirî yan bijîşkan hîn dîyar e.

Her sal, du sed û pêncî hezar ciwan ji welêt derdikevin. Herî kêm sê milyon ciwan jî li Hindistan, an Rojhilatê Nêzîk dixebitin. Ev hêza xebatê ya lawaz pir caran dibe mexdûra muameleyên xirab, wek mesela xizmetkara serokwezîrê îsraîlî **Benyamîn Netanyahû** demeke berê nîşan da. (8) Ev salên dawî, pereyê ku nepalîyên derveyî welêt bi rê dikin, li gor îstatîstîkên resmî % 20ê hatina neteweyî bû (9) û bê guman, ev reqem di rastîyê de zêdetir e. Ev hatina sereke ya welêt e û ji tûrîzma ku hîn serê salê pênc sed hezar kes dikêşe pir zêdetir e. Çîyayên ji 8 000 metreyan bilindtir, serêkanîya xwezayî ya yekem in. Lê belê, potansîyela hîdroelektrîk a bi heybet qet nayê şixulandin.

Nebûna veberanînê di beşeke weha qezencker de ze'îfîyeke herêmî binxêz dike: Reva ji teserrufê, karên nelirê û neewlehîyeke hiqûqî ya mezin ji bo veberhênan an hîbedaran. Pirsgirêkên van salên dawîn şidet ferî xelkê kir û bêcezamana hema hema bi temamî vê yekê jî xurt dike. *"Hîn tu kes ji bo binpêkirinên mafên mirovan ên di şer de û piştî şer nehat pêşberî dadgehekê"*, RNY dide zanîn. (10)

Lê belê, sedema herî xirabker ji bêhêzîya adetî ya îqtîdarê tê û *International Crisis Group* ev yek weha xuya dike: *"Dewlet derbasî şer bûye bê ku ziyan bigihê û reforme bibe. Sedemeke wê jî ev e ku karê wê ne xizmetkarîya welatîyan, lê xizmetkarîya şebeke û xebitandina bertîlxurîyê ye"*. (11) Her para ji desthilatê berî her tiştî riya zengînbûn û alîkarîya malbat û piştevanan vedike. Li gor rapora 2011ê ya komeleya *Transparency International*, Nepal li pey Afganistanê welatê herî bertîlxur e.

Nebûna dewleta adîl, domandina serdestîya kastên jorîn bahûn (brahman) û ***şhetrî*** (*kşatrîya*) rave dike, tevî mekanîzmayên rizgarbûnê yên bicihkirî. **Michelle Kergoat** a lêkolîner dibêje: *"Li derve pirsgirêka sifata monopolîstîk û tevlîneker a vê elîtê, çand û pratîkên van kastên jorîn bi demokrasîyê naguncin; ew herweha ziyanê didin civaka nepalî û îmkanên wê yên pêşketinê"*. (12)

Tebatbûna partîyên adetî dibe sedema piştgirîya Maoîstan, li derve piştevanên wan ên zeftkirî yên çolên xizan. Xuyanîya wan a durustî vê pêbawerîyê xurt dike û ew hêvî dikin ku bi dû pesindkirina Destûra Bingehîn, ew ê bigihîjin piranîyeke hilbijartî ya dîyar, tevî ku pêşketinên civakî yên konkret kêm dimînin (meaşê asgarî, piştgirîya ji bo berhemên pêwîstîya sereke hwd.). *"Azadî rê dide ku gul bibişkivin. Ez hêvîyên mezin ji siberojê dikim"*, **Jyoti Adhikarî** patronê otela ***Annapurna*** û dezgeha ***Eco Trek*** dibêje. Ku serokşirketekî ciwan ê wekî wî, serokê berê ye *Komeleya operatorên trek*, piştgirîyê bide "şoreşgêran" da ku civakê biguherînin, nîşana vê yekê ye ku nepalî jî rêyeke dûr hatine.

Heta niha, Maoîstan pêşdarazên li ser xwe pûç kirin. Hîn ji hêla Amerîkayê ve wek rêxistineke terorîst hesibandî (13), ew pir dûr in ji "Khmerên Sor", tevî ku hinan ew weha nîşan dabûn. Ji bo lihevhatinê vekirî, divê ew niha îsbat bikin ku ew ê nekevin dû meylên adetî yên îqtîdara nepalî.

* Rojnamevan.

1 Henri Sigayret, *Népal, 10 ans de guerre civile, pourquoi ?/Nepal, 10 salan şerê navxweyî ji bo çi?*, Vajra Publications, Gainesville (Dewletên Yekbûyî), 2011

2 Marie Lecomte-Tilouine, "De la guérilla à la démocratie au Népal / Li Nepalê ji gerîla ber bi demokrasîyê ve", *Le Monde diplomatique*, gulan 2008

3 *Bnr.* bi taybetî nivîsên nepenî, 3 sibat 2003, 19 gulan 2008 û 20 mijdar 2009

4 Li gor rêxistina ne hikûmetî ya nepalî Informal Sector Service Center (Insec), heşt hezar û çar sed kes ji hêla hêzên hikûmetî û nêzî pênc hezar kes ji hêla Maoîstan ve di nav 1996 û 2006ê de hatin kuştin

5 Peymana heftnoqteyî ya ku di 01-11-2011ê de ji hêla serokên PKYN-M, PKN-MLY, Partîya Kongreyê û Foruma Mafên Gelê Madhesî ve hat îmze kirin

6 "Rapora li ser pêşketina mirovî 2011", Bernameya Neteweyên Yekbûyî ji bo Pêşketinê (BNYP), New York, 2011

7 "Poverty in Nepal", di "Nepal living standard survey 2010-11", Central Bureau of Statistics, Katmandû

8 "Former caregiver in Netanyahu's home: "I was forced to work 24 hours a day" / Kevnexizmetkara li mala Netanyahu: Li ser min hat ferz kirin ez rojê 24 saetan bixebitim", *Haaretz*, Tel Avîv, 1 îlon 2011

9 "Economic survey", sala bacî ya 2010-2011, hikûmeta Nepalê, Wezareta Fînansê, tîrmeh 2011

10 "Peace-building strategy for Nepal 2011-12", Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, hezîran 2011

11 "Nepal's political rites of passage", *Asia Report,* hjm. 194, Katmandû-Bruksel, 29 îlon 2010

12 Michelle Kergoat, *Histoire politique du Népal. Aux origines de l'insurrection maoïste / Dîroka siyasî ya Nepalê. Kokên serhildana maoîst,* Karthala, Parîs, 2008

13 Lîsteya 1ê sibata 2012ê hê jî PKYN-M û Artêşa Gelêrî ya Rizgarîyê vedihewand, www.treasury.gov/ofac.

Wergera ji fransî: Simko Destan

Şêst salên şoreşê

Sibat 1959. Destûra Bingehîn a yekemîn mîrnişîneke parlemanî bi cih kir. Partîya Kongreyê di hilbijartinên meclisê de bi ser ket.

Kanûn 1961. Jihevxistina Meclisê û Mîrnişîna Monarşîya mutleq.

08-04-1990. Şoreşa gel a pêşî, yan *jana andolan*. Key Bîrendra destûra vekirina partîyên siyasî dide.

13-02-1996. Partîya Komunîst a Nepala Maoîst (PKN-M) "şerekî gelêrî" li dij desthilata navendî dide dest pê kirin.

01-06- 2001. Kuştina key Bîrendra û mehkûmkirina mîrê warîs Dîpendra. Tacîdarkirina Gyanendrayê birayê key.

24-11-2001. Rewşa awarte.

01-02-2005. Key Gyanendra hikûmetê ji kar diavêje û peywira Meclisê disekinîne.

21-11-2005. Peymana donzdehnoqteyî li Delhîya Nû di navbera heft partîyên sereke û Maoîstan, li dij mutleqperestîya key.

2006. Şoreşa gelêrî ya duyem, yan *jana andolan 2*, roja 6ê nîsanê dest pê dike. 24ê nîsanê, key ji ya xwe dadikeve û Meclisê dîsa dixe kar.

21-11-2006. Peymanên aştîyê. Hikûmeta yekîtîya neteweyî.

Nîsan 2008. Hilbijartinên Meclisa Destûrnivîs. PKN-M partîya yekem e.

28-05-2008. Betalkirina mîrnişînê û îlankirina Komara Demokratîk û Federal a Nepalê.

15-08-2008. Pushpa Kamal Dahalê bi laqabê "Praşanda" tê nasîn û serokê PKN-Mê ye, dibe serokwezîrê hevkarîyeke şeş partîyan, bê Partîya Kongreyê.

04-05-2009. Maoîstên Partîya Komunîst a Yekgirtî ya Nepala Maoîst (PKYN-M), ji PKN-Mê derketî, ji hikûmetê vediqetin.

07-12-2010. Peymana li nav Maoîst, hikûmet û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li ser şervanên bin 18 salî û dawîya blokaja Meclisê.

28-08-2011. Serokê PKYN-M, Baburam Bhattarai, dibe serokwezîr.

01-11-2011. Her çar partîyên sereke yên Nepalê peymaneke heftnoqteyî li ser tevlîkirina şervanên maoîst di artêşa fermî de îmze dikin.

25-11-2011. Dadgeha Bilind destûrê dide berdewamîyeke nû ya şeşmehî ya nûnerîya Meclisa Destûrnivîs.

Tevî ku hikûmeta îsraîlî tehdîda bombebarandina Îranê dike, Yekîtîya Ewropayê û Dewletên Yekbûyî cezayên xwe li dijî Komara Îslamî tund kirin –lê belê guman li ser gihîştina armanca îlankirî heye (nivîsara Gary Sick bixwînin). Di demeke weha de ku Amerîkaya ji ber krîz û têkçûna Iraq û Afgansstanê zayîfbûyî, dixwaze berê acilîyên xwe bide Pasîfîkê, Waşington hê jî bêhtir meraqdara vê rewşê ye.

ACILÎYÊN LEŞKERÎ PÊWÎSTÎYÊN BUDÇEYÎ

Pentagon berê xwe dide Pasîfîkê

MICHAEL KLARE *

Di 5ê rêbendanê de Serok Barack Obama bi van gotinan stratejîya nû ya berevanîya neteweyî ragihand: "Neteweya me di serdemeke veguherînê de ye", "li derveyî welat bi gefên nû re, li nav welêt jî bi krîza budçeyê re rû bi rû ye." Li gor vê stratejîyê artêşa Dewletên Yekgirtî dê were piçûktir kirin û hin mîsyonên şerî- nemaze yên hêzên zirhî yên bejayî yên li Ewropa û hêzên kontrgerîla yên Asyayêwerin kêmtir kirin. Hevdem, girîngî dê bidin herêmên din ên cîhanê, bi taybetî Asya û Pasîfîk, û mîsyonên din ku şerê sîber, operasyonên taybet û kontrola deryayan jî tê de ne. Wezîrê Berevanîyê Leon E. Panetta dema ku behsa siyaseta nû dikir, weha got: "Hêzên hevpar ên DYê dê piçûktir û kêmtir bibin. Lê belê... dê çalaktir, guherbartir, xwenûker û di warê teknolojîyê pêşketî bin û dê bikaribin leşkerkêşîyeke bileztir li dar bixin". (1)

Obama û Panetta dîyar kir ku stratejîyeke nû hewce bû da ku rewşa guhertî ya him li nav, him jî li derveyî welêt were nîşan dan. Li nav welêt, Dewletên Yekgirtî ji ber sekna aborî û nepixîna deynên neteweyî, ku hîna jî berdewam in, qels ket. Li derveyî welêt jî, herçend ji Iraqê hat vekişîn û di talîyê de ji Afganistanê hat revîn jî, di fişara leşkerî de kêmbûnek nayê dîtin -gefên ji Îran û Koreya Bakur ji her demê bêhtir zorê didin û tirsa ji ber Çînê ku pêş dikeve, her ku diçe mezintir dibe. Bi ser van pirsgirên re divê Wezareta Berevanîyê di deh salên pêşîya me de 487 mîlyar dolaran tasarufê bike da ku bikaribe bi ya Qanûna Kontrola Budçeyê ya 2011ê bi cih bîne -û heger Kongre di mehên pêşîya me de hin tedbîrên lêzêde yên rizgarkirina budçeyê nestîne dê bivê ku bêhtir tasaruf werin kirin.

Reqîbên meyldar

Di nihêrîna pêşîn de, polîtîkaya nû ya berevanîyê li hember mercên xerab bûyî yên darayî û jeopolîtîk bersiveke pragmatîst e, ku mebesta wê ew e ku bi hêzên kêmhejmar ên xwedî zerengîyeke mezin li hember gefên potensîyel ên paşerojê rabe. Di 5ê rêbendanê de Panetta dîyar kir ku "heger operasyonên me yên berfireh ên leşkerî paş kevin jî, Dewletên Yekgirtî dê li seranserî cîhanê bi berdewamî çendîn dijwarîyên ewlekarîyê re rû bi rû bimîne ku di nav wan de hêzên li seranserî Asyayê jî hene, ku nû radibin. Ji ber vê yekê divê wezaret bêyî ku li rewşa darayî ya welêt binihêre, guhertineke stratejîk bike".

Lê belê heger ji nêz ve lê were nihertin, niyeteke mezintir a stratejîk dikare were dîtin: Heger erozyona bivênevê ya statuya wê ya tenha hêza super û herweha rabûna reqîbên azwer ên li Asyayê li ber çavan were ragirtin, Dewletên Yekgirtî bi rêya berdewam kirina serdestîya xwe ya li cihên girîng ên cîhanê û teşeyên krîtîk ên pevçûnan hewlê dide ku bandora xwe ya gerdûnî her bimeşîne. Bi taybetî jî, mebesta wê ew e ku li ser deryayên li kêleka Asyayê hukim bike, ji Kendava Faris û Okyanûsa Hindî heta Deryaya Çîna Başûr û Pasîfîka bakurê rojava çembera bandora xwe firehtir bike. Bi dorê de ev yek dê pêwîst bike ku Amerîka serdestîya xwe ya di şerên asmanî û deryayî de biparêze herweha serdestîya xwe ya di şerê sîber, teknolojîya fezayî û hin qadên din ên taybet de berdewam bike. Şerê li dij terorê dê wekî peywireke girîng a Pentagonê bimîne, lê belê dê bêhtir bi destên Hêzên Taybet were kirin, ku baş perwerde kirî ne û xwedî firokeyên bêfirokevan û alavên din ên teknolojîya bilind in. Bi bicihanîna van hemûyan rayedarên Pentagonê bawer dikin ku Dewletên Yekgirtî dê li Asya-Pasîfîk de serdest bimîne, ku Çîn jî tê de ye, û statuya xwe ya hêza domînant a cîhanê berdewam bike.

Obama û serokên din şaşîya stratejîk ya berê dubare nakin

Serî pê derxistina paşdeçûna berjewendî û sozdarîyê li derveyî welêt -yan jî wekî ku li cem hinekan heye, serî pê derxistina li ketin împaratorîyê- ne karekî hêsan e. Hêzên din ên mezin ku dê di çend dehsalên çûyî de naçar man ku hewldanên weha li dar bixin -Brîtanya û Fransa piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê, Rûsya piştî hilweşîna Yekîtîya Sovyetan- lê belê ev yek ji bo wan qet ne hêsan bû. Pir caran, qebûl nekirina bivênevêyîya ketina împaratorîya bû sedema macerayên leşkerî yên bi şêwrên şaş. Wekî mînak di sala 1956ê de dagîrkirina Misirê ji alîyê Anglo-Fransizan, di sala 1979ê de dagîrkirina Afganistanê ya ji alîyê Sovyetan ve. Van bûyeran hilweşîna împaratorîyan dereng nexist, berevajî wê bileztir kir. Dema ku Dewletên Yekgirtî di 2003ê de Iraq dagîr kir, ew di asta herî bilind a hêza xwe de bû; lê belê serhildanan gelek dirêj ajoy û pir buha bûn -heger hemû lêçûn werin hesibandin dora 3 trîlyon dolar- û Amerîkayê vîna xwe (herweha piranîya zerengîya xwe) wenda kir ku li Asyayê şerên nû yên bejayî bide dest pê kirin. Ji niha û pê ve ne guncan e ku Obama, yan jî serokekî din ê amerîkî, ne xem e demokrat yan komarperwer be, destûrê bide operasyonên mezin ên wekî mudaxeleya amerîkî ya li dij Iraq û Afganistanê. (2)

Serok Obama û şêwirmendên wî yên sereke ji vê dîrokê haydar in û biryardar in ku xeletîyên stratejîk ên serokên berê dubare nekin, him yên amerîkîyan, him jî yên din. Ji alîyekî ve, ew ehmeqîya hewldana bidestxistina hemû berjewendî û sozên derwelêt fam dikin û dizanin ku heger weha be, netewe dê têk biçe û bêhtir serpêhatîyên qelsker ên derveyî welêt rû bidin. Hevdem, nîyeta wan nîne ku berjewendîyên li derveyî welêt bi peymanekê kontrol bikin, ji ber ku ew dizanin ku ev yek dê alozî û ketinê bi xwe re bîne. Di şûna wê de ew li rêyeke naverastê digerin û girêdanên amerîkî yên li hin herêman kêmtir bikin - nemaze li Ewropayê – lê serdestmayîna li herêman ji bo berdewamîya serdestîya gerdûnî ya Amerîkayê wekî tiştê herî girîng tê dîtin.

Amerîka xwe amadeyî rê lê tengkirina Çînê dike

Wekî ku Obama û şêwirmendên wî yên sereke di mehên çûyî de aşkere kir ku ev yek tê wateya hukimkirina li ser rojavayê Pasîfîkê û hêza Çînê. Cîgirê Wezîrê Navxweyî William J. Burns di sermaweza bihurî de li Washingtonê got ku "ji gelek alîyan ve, Pasîfîka firehtir dê di çendîn dehsalên pêşîya me de ji bo berjewendîya Amerîkayê bibe para herî dînamîk û girîng. Ew, zêdeyî nîvê gelheya cîhanê dihewîne, herweha piranîya aborîyên herî girîng, hevgirên sereke û hêzên ku nû radibin." Burns dest nîşan dike ku da ku Amerîka hêzdar û muferreh bimîne, ew divê hemû hêza xwe li vê herêmê konsantre bike û ji xwe re garantî bike ku Çîn di beramber Amerîkayê nebe xwedî hêz û bandorê. Wî weha dîyar kir: "Wekî ku li Asyayê guhertinên bingehîn pêk tên, divê em jî mîmarîyeke dîplomatîk, aborî û ewlekarîyê bi pêş bixin da ku li paş nemînin". (3)

Wekî ku Burns dest nîşan dike, ev "mîmarîya nû" xwedî gelek alîyan e, him leşkerî, him jî ne leşkerî. Di enîya dîplomatîk de, Washingtonê hewl da ku têkilîyên xwe yên digel Endonezya, Fîlîpînan û Vîetnamê bi pêş xe û piştî tecrîdeke demdirêj peywendîyên fermî yên digel Myanmar/Burmayê dîsa dest pê kir. (4) Qesra Spî wekî din hewlê dide ku bazirganîya amerîkî ya li herêmê zindî bike û ji bo peymaneke herêmî ya bazirganîyê zorê dide, Hevparîya Trans-Pasîfîk. Mebesta van bi awayekî aşkere li dij rabûna Çîn ranaweste, lê peyama negotî ew e ku Çîn ji macerayên nebaş ên Amerîkayê yên li Iraq û Afganistanê xêr dît da ku li rojhilata başûr a Asyayê bandora xwe berfireh bike û da ku ev rewş were guhertin gaveke hêzdar hewce ye. Wekî mînak bi dubare avakirina peywendîyan a digel Burmayê, Dewletên Yekgirtî li welatekî, ku heta niha bi tenê çend reqîbên Çînê lê bûn, dibe xwedî mafê gotinê; Hevparîya Trans-Pasîfîk ku tê pêşnîyar kirin ji ber sedemên teknîkî dê Çînê li derve bihêle.

Lê belê, digel van pêngavên aborî û dîplomatîk, înîsîyatîfên girîng ên leşkerî jî hene. Stratejîstên amerîkî bawer dikin ku ji bo dewletên asyayî, da ku mezin û xwedî refahê bin, divê ew bikaribin xwe bê asteng bigihînin Pasîfîk û Oksyanûsa Hindî -herweha hin rêyên avî yên girêdêr ên wekî qeraxa Malacca û Deryaya Başûrê Çînê- da ku bikaribin madeyên xam (bi taybetî jî neft) û berhemên hilberandî îthal bikin. Wekî ku cîgirê wezîr Burns di sermawezê de dîyar kir: "Bilindbûna Asyayê ewqas mezin bû ku ew bi tenê bajar û aborîyên Asyayê ava nake, herweha nexşeya jeostratejîk jî nû ve dikişîne. Heger em mînakekê bidin, nîvê tonaja bazirganîyê ya cîhanê di Deryaya Başûrê Çînê re derbaz dibe".

Kontrola deryayan gava bingehîn e

An ku bi hukimkirina li ser Deryaya Başûrê Çînê û li ser hin rêyên avî yên nêzîk Dewletên Yekgirtî dikare li ser Çîn û dewletên din ên herêmê teşeyeke hêzeke mezin bisepîne, wekî ku Hêzên Deryayî yên Brîtanî berê him li vê herêmê û him jî li herêmên bi roleke weha rabûbû. Stratejîstên deryayî yên amerîkî ji mêj ve li ser vê helwêstê gotûbêjê dikin û îdîa dikin ku tenha avantaja Amerîkayê di kontrol kirina wê ya rêyên sereke yên deryayên cîhanê de ye -ku tu hêzeke din xwedî vê avantajê nîne- û niha weha xuya dike ku îdareya Obama ev nihêrîn pejirandîye. (5) Di dilê mîmarîya nû ya stratejîk de, serdestîya deryayî ya amerîkî ya li ser Deryaya Başûrê Çînê û rêyên avî yên herêmê heye.

Helbet, ev yek bi dengekî bilind nayên gotin, lê belê ji wan hemleyan, ku di meha sermawezê de di dumahîya seredana wî ya bo herêmê de Obama bixwe dîyar kiribûn. Wî li Canberrayê gotibû: "Wekî ku em ji bo dahatûyê budçe û bername çêdikin, em dê çavkanîyên hewce terxan bikin da ku hebûna xwe ya hêzdar a leşkerî ya li herêmê berdewam bikin". Wî herweha lê zêdekir: "Em bi tenê hebûna xwe ya hêzdar a li bakurê rojava ya Pasîfîkê berdewam nekin, lê herweha hebûna xwe ya li Asyaya Başûrê rojhilat hêzdartir bikin". Ev yek tê wateya zêdetir leşkerkeşîya amerîkî ya li herêmê, pirtir keştîyên cengî û operasyonên leşkerî yên digel hêzên deryayî yên welatên hevalbend, ên wekî Vîetnam û Fîlîpînan. Obama bi ser de jî, avakirina bingeheke leşkerî ya amerîkî ya li Darwinê, li beravên bakur ên Awistralyayê, û zêdekirina alîkarîya leşkerî ya Endonezyayê ragihand. (6)

Pêkanîna vê vîzyona mezin a jeopolîtîk di warê pêşxistina polîtîkaya leşkerî de xwedî girîngîyeke berbiçav e û ev yek di wê stratejîya leşkerî de, ku di 5ê sibatê de ji alîyê Messrs Obama and Panetta bi awayekî aşkere tê nîşan dan. Obama li Pentagonê got ku: "Wekî ku min li Awistralyayê jî zelal kiribû, em dê hebûna xwe ya li Asya-Pasîfîk hêzdartir bikin û ji bo wê herêma krîtîk tasarufên budçeyî nabin mijara gotinê'.' Paşê Panetta lê zêde kir: "Artêşa DY dê li ser hebûna hêzdarkirî, nîşandana hêz û biryardarîya li Asya-Pasîfîk giranî û fokusa xwe ya sazgehî bilindtir bike. (7)

Herçend, belgeyên siyasetê bi tena serê xwe dîyar nake ka wê kîjan unsurên leşkerî li gor vê polîtîkayê xêrê bibîne, ji nivîsarê xuya ye ku hêzên deryayî tên binxêz kirin -nemaze keştîyên cengî yên ku dikarin firokeyan bikişînin- û herweha firokeyên pêşketî û mûşek. Bi vî awayî, herçend hêza artêşa DY di dehsala pêşîya me de ji 570 000 yekîneyan dakeve 490.000 jî, serok Obama planên kêmkirina fîloyên hêzên deryayî veto kirin. Herweha di warê pêşxistina çekên "dij-gihîştin/redkirina herêman" a A2/AD yên li dij zerengîyên hêzên raqîb de perexistineke mezin jî were kirin- firoke, mûşek û keştîyên ku ji bo pêşdexistina qabîlîyeta hêzên êrişkirinê yên amerîkî hatine dîzayn kirin, nemaze jî keştîyên firokekêş. (8) Ji ber ku Çîn tê payîn ku zerengîya xwe ya êrişa ser hêzên deryayî yên amerîkayê yên li Deryaya Başûrê Çîn û li herêmên derûdora xwe bi pêş bixîne, hêzên DY jî li dij çekên A2/AD bi berevanîyeke mezintir were hêzdartir kirin.

Bernameya nû ya Pentagonê weha ye: "Da ku dijberên potansîyel bi awayekî bandorker werin bêbandor kirin û pêşî lê were girtin ku ew bigihîjin mebesta xwe, DY divê berdewam bike ku li wan herêman, ku gihîştin û serbestîya me ya tevgerînê dikeve xeterê, hêza xwe nîşan bide" -an ku Deryayên

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav 10**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 25 x 25 cm

Rojhilat û Başûrê Çîn, herweha deryayên dora Îran û Koreya Bakur. Tê îdîa kirin ku li van deran, dijberên potansîyel "ên wekî Çînê" da ku hêzên amerîkî têk bibin, yan tevgerîna wan asê bikin, dê "rêbazên asîmetrîk" bi kar bîne- binderya, mûşekên dij keştîyan, şerê sîber û gelekên din. Li gor wê "artêşa DY dê pere bixe da ku bikaribe li herêmên A2/AD çalak bibe". (9) Wateya vê yekê weha ye, Dewletên Yekgirtî dê pêştirîyeke mezin bide hukimkirina li ser deryayên Asyayê, ne xem e heger Çîn û hêzên din ku nû radibin, li dij derkevin jî.

Gelek stratejîstên amerîkî nekarîn konseptên jeostratejîk dest nîşan bikin, ku bernameya stratejîya nû ya Pentagonê bin xêz dikin. Di şûna wê de wan ew wekî mafdar derxistina tedbîrên tasarûdê dîtin. Lê belê aşkere ye ku Serok Obama û şêwirmendên wî di vê lehzeya tenha de serê xwe li bernameyên stratejîk ên Amerîkayê êşandine û ji bo berdewamkirina serdestîya gerdûnî ya Amerîkayê xwedî bernameyeke xweragir in. Lê belê ne dîyar e ka komarperwerên di Kongreyê de dê piştgirîyeke dimdirêj bidin vê planê, yan jî plan dikare ji bo demeke dirêj bimeşe yan na. Herweha ne guncan e ku were guman kirin heger Çîn da ku pêşîyê li gavên DY yên li Asyayê bigire, hin gavan biavêje çi bibe. Bawer nakim ku tiştekî curetkar yan provokatîv bikin, lê dîsa jî bawer nakim bêyî ku hin dij-gavan biavêjin bihêlin ku Dewletên Yekgirtî li ser rêyên deryayên derdora wê hukim bike. Her çi dibe bila bibe, pir bi lez dîyar dibe ku Deryaya Başûrê Çîn û rêyên avî yên dora wê dibin mebesta nû ya pêşbirka jeopolîtîk a gerdûnî.

* Michael Klare li Amherst, Massachusettsê di Hampshire College de profesorê lêkolînên aştî û ewlekarîya cîhanê ye. Herweha nivîskarê *Pêşbirka ji bo tiştê mayî: Têkoşîna Gerdûnî li ser Çavkanîyên Dawî yên Cîhanê* (Metropolitan Books, 2012).

1 Leon E. Panetta, "Daxuyanîya li ser Rêberîya Berevanîya Stratejîk," The Pentagon, Washington, D.C., 5 rêbendan 2012, http://www.defense.gov/speeches/speech.aspx?speechid=1643

2 Binihêrin Stephen M. Walt, "Dawîya Serdema Amerîkî," *The National Interest*, sermawez/berfanbar 2011, rûpel. 6-16

3 William J. Burns, "Asya, (Başûrê) Amerika û ji bo sedsaleke nû stratejîya Dewletên Yekgirtî," Axaftina di Konseya Meseleyên Cîhanî ya Kongreya Neteweyî ya Amerîkî , D.C., 4 sermawez 2011, http://www.state.gov/s/d/2011/176667.htm. Ji bo nihêrîneke wekhev Hillary Clinton, "Sedala Pasîfîk a Amerîkayê," *Foreign Policy*, sermawez 2011, http://www.foreignpolicy.com/articles/2011/10/11/americas_pacific_century

4 Bixwînin Xavier Monthéard, "Retrouvailles des Etats- Unis et du Vietnam" ("Vedîtina Dewletên Yekbûyî û Viyetnam"), Le Monde diplomatique, xezîran 2011

5 Binihêrin Ronald O'Rourke, "Tayber – DY Stratejîya Mezin û Hêzên Deryayî" *U.S. Naval Institute Proceedings*, rêbendan 2012, http://www.usni.org/magazines/proceedings/2012-01/special-us-grand-strategy-and-maritime-power

6 "Axaftina Serok Obama ya li Parlamentoya Awistralyayê" Parliament House, Canberra, Australia, 17 sermawez 2011, http://www.whitehouse.gov/the-press-office/2011/11/17/remarks-president-obama-australian-parliament . Herweha binihêrin Jackie Calmes, "Obama dibêje DY dê li Awistralyayê baregehan ava bike *The New York Times*, 17 sermawez 2011

7 Wezareta Berevanîyê ya Amerîkî: "Brîfînga li ser Rêberîya Berevanîya Stratejîk" 5 rêbendan 2012, http://www.defense.gov/transcripts/transcript.aspx?transcriptid=4953

8 Anti-access/area denial, yan A2/AD, stratejîya çînî ye ji bo rêlibergirtina ketina hêzên amerîkî di deverên zincîra yekem û duyem a giravan. (Zincîra yekem a ku jê ra "xeta şîn" tê gotin, deryayên Çîna rojhilatî û başûrî di xwe de dihewîne, Taywan û Parasel jî di nav de; zincîra duyem jî, ku jê re "xeta şîn" tê gotin, diçe dûrahîya Fîlîpînan.) Bixwînin Olivier Zajec, "La Chine affirme ses ambitions navales" ("Çîn meylên xwe yên deryayî nîşan dide"), Le Monde diplomatique, îlon 2008

9 US Department of Defense, "Sustaining US global leadership: Priorities for 21st century defense" ("Domandina rêberîya dinyayî ya DYê: Acilî ji bo parastina sedsala 21ê"), Waşîngton, DC, çile 2012

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Li Çînê wek li herderî, romanên polîsî nepenîyên civakeke weha nîşan didin ku li dij bertîlxurî, zarokrevandin, diz û durûtîyê têdikoşe... Lê belê, ne wek li welatên rojavayî, tawan ji nexweşîyeke ferdî bêhtir wek nedurustîyeke civakî tê dîtin. Ev cureyê edebiyatê ku piştî Şoreşa Çandî bi temamî winda bû, dîsa bala xwendevanan dikişîne.

Romana polîsî ya çînî û Mao û Tao

MICHEL IMBERT *

Herçiqasî berhemên bi etîketa "made in China" gelek berbelav bibin jî, wergerandinên wêjeya çînî hîn kêm in. Ev yek alikarîyê nade ku klîşeyên fikra kolektîf li ser Împaratorîya Navîn ji holê werin rakirin. Ev klîşe bi saya wêjeya gelerî ya ewropî demekê dirêj di bîra mirovan de man. Tehlukeya zer [ya ji alîyê xelkê Asyayê ve tê; nota wergêr], raza rojhilatî: Heyranîyeke ku tê de piçûkxistin û tirs tevlîhev in. Stereotîpê ku demekê dirêj xisleta wêjeya çînî bû, bêguman yê ku ruh bi doktorê şeytanî Fu Manchu anî, ku dahîyê xirabîyê û qehremanê nivîskarê îngilîz Sax Rohmer di sala 1992ê de afirandî ye. Fîgura asyayîyê bêrehm û tirsnak ku bisporê raza wêjeyeke berî û piştî şerî ku bêrîya egzotîzmê dike, sembolê xayintîyeke aqilane ye ku di dawîyê de di romanên xetûxêzan û rêzefîlman de cîh girt. Di wan de, di *Secret de l'Espadon (Raza Masîyê bi Navê Espadonê)* yê Edgar P. Jacobs heta bi *Lotus bleu* (Gîyayê bi Navê Lotus yê Şîn) yê Hergé, ew weke asta herî bilind a Yê din temsîl dikir.

Beyî ku ev îmaj ji bîra mirov biçe, ew dê biguherîya û xwe bikira îmaja zaneyekî mîstîk , bisporê hêzeke efsûnî. Gelo ji ber nermbûna têkilîyên di navbera Amerîka û Çînê de? -ku rêzefîlmê amerîkî bi navê *Kun Fu* ev îmaja dawî piştî 1972yê belav kir. Qehremanê wî budistek e ku şidetê bi kar nayîne, lê di şer de gelekî jêhatî ye û diya wî çînî ye, lê belê bavê wî amerîkî ye. Li Honkongê sînemaya hunerê şer ku di salên 1960 û 1970yê de fîlmên li ser hev weke berên mîtralyozekê diafirandin, versîyona xwe ya ruhanîyeteke reqas ava kir. Vî qehremanî ku yekser ji romanên şerên şûr û mertalan, *wuxia xiaoshuo* tê, fîgura şovalyeyê heqparêz bi saya pêşengên mezin ên weke Bruce Lee û piştre Jacky Chan ji nû ve rojane kir. Rast e ku koreografîyên şerî gelekî tesîr li ser sînemaya rojavayî kir -ku mirov li *Matrix*a brayên Wachowsk a sala 1999ê bifikre bes e,- heta bi asteke ku êdî ew bûne parçeyekî dîmenên ku em fêr bûne li wan meyze bikin. Ev yek jî bi saya felsefeya rojhilatî û nivîsê pêk hat, ji ber ku fîgurên şer bi tenê îdeogramên ku dilivin in. Divê em bibêjin ku eger mirov wan ji koka xwe qut bike, wê taybetmendîya wan winda bibe. Belkî bi analîzkirina cureyekî din ê gelerî, yê polarê [romanên polîsî] em ê bikaribin taybetmendîya çînî derxin holê.

Gelekî berîya wergerandina berhemên Arthur Conan Doyle, Maurice Leblanc yan jî Edgar Poe, di navbera dawîya sedsala XIXê û destpêka sedsala XXê de, ev cureyê wêjeyê bi pêş ketibû û romanên navdar yên gelerî di navbera sedsala XVIê û XIXê de hatin nivîsandin.

Bi saya wan Robert Van Gulik, dîplomat û sînologekî zana, karîbû ji romaneke polîsî ya sedsala XVIIê îlhamê bigire ku behsa dadgerekî navdar yê bi navê Ti dikir, yê ku di sedsala VIIê de dijî, û rêzefîlmê xwe yê navdar çêbike. Piştre heta îro jî nivîskarên din ew roman dewam kirin (Frédéric Lenormand di weşanxaneya Fayard yek ji wan e). (1) Di wan de nasnameya sûcdar di destpêkê de dihate dîyar kirin, ev yek bi awayekî balkêş rêzefîlmê bi navê *Colombo* tîne bîra mirovan ku tê de aktor Peter Falk ji bo bigihîje armanca xwe gelekî li ber herkesî digere…

Di dema Maoîzmê de, guneh weke fikrekî "burjuwa" dihat nirxandin û dadger jî weke "bermahîyên feodalîzmê", lewre romana polîsî ji holê rabû, heta ku di dema Deng Xiaoping (1978-1992) ji nû ve derketin holê. Di salên 1980yê de nivîskarên Komara Gel a Çîn (KGÇ) kurteçîrokên bi rengê Sherlock Holmes di kovarên fîksîyonê de diweşandin, piştî bûyerên Tiananmen ev kurteçîrok veguherîn rêzefîlmên ku îmajeke pozîtîf ya polîsan nîşan dida. Bi vî rengî, Wan Shuo ku di sala 1958ê de ji dayik bû, romanên polisî di romaneke ji îngilîzî wergerandî, lêkola (2) û pêşî bû nivîskarê senaryoya 'sitcom'an. Hinên din yên weke Lü Haiyan ku notirvanê hepsê bû û ku piştre bû nivîskarê romanan û nivîskarê senaryoya rêzefîlmekî sala 1980ê bi navê "Jingsha bianyi" ("Polîsê Sîvîl") bixwe li derveyî sînorê welêt navdar nînin.

Lê romana polîsî ya ji alîyê welatîyên Komara Gel a Çînê ve nivisî, cureyekî romanê ye ku têra xwe nayê temsîl kirin. Bi îhtîmaleke mezin jî ev yek dibe ku girêdayî rewşa siyasî be. He Jiahong, huquqnas û xwendekarê zanîngehekî Pekînê ku yek ji kêm nivîskarên romanên polîsî yê li Komara Gel a Çînê dijî û pirtûkên xwe li Fransayê çap dike. Ew li gor lêkolînên parêzerekî li Welatên Yekbûyî yên Amerîkayê perwerde bûyî, (bi dîqet) li birînên ji alîyê şoreşa çandî û dogma nû ya kapîtalîzme ve hat kirin, dikole. (3) Hin nivîskarên din ku li derveyî welêt dijin, heman tiştî dikin, weke Qiu Xiaolong (4) yan jî Diane Weiliang (5) ku piştî bûyerên Tienanmen bar kirin welatên din. Lê belê divê mirov çanda çînî bi Komara Gel a Çînê sînordar neke: Divê mirov ji Çînê bêhtir behsa Çînan bike û dîasporaya wê li ber çavan bigre. Wisa xuya ye ku li Çînê, weke li deverên din jî, romanê polîsî amûrek e ji bo xistina ber lêpirsînê a civakê; tiştek maye ku mirov hîn mereq dike, gelo romanê polîsî, ji bûyeran û klîşeyan wêdetir çi di bin tesîra kumên weke kovikan (sembola Tao), yan jî di bin tesîra çakêtên Mao de bin, li gor perspektîfeke bingehîn ya çînî tên nivîsandin?

Konsepta valahî û tijehîyê avahîya fikra çînîyan pêk tîne. Wextê em li firaxekê binêrin, em şiklê wê, maddeya wê û rengê wê dibînin; lê mêjîyê gelerî yê çînî wê weke korta ew pêk tîne, dibîne. Surehîyê avê tenê ji ber ku tiştekî vala ye, heye. (6) Ev valahîya taoîst, cihanê weke ku mekanê di resma klasîk a çînî de organîze bike, diafirîne; di erdê bêserûbinî de û di bin esmanê bêdawî de mirov bi tenê libeke genim e. Di vê cihanê de mirov neçar e serê xwe li hember qaîdeyên xwezayê û yên mirovan bitewîne. Divê mirov di li gor ahenga civakî tevbigere. Çîn dergûşa vê çandê ye, û dewsên vê fikrê wê di dema komunîst ya herî hişk de jî xwe bidana der.

Herçiqasî ji Partîya Komunîst hat ku ji vê demê û vir ve gelî ji vê îdeolojîyê dûr bixe jî, di hilberînên wêjeyî û sînematografîk de dewsa vê rêzgirtina li hember qaîdeyên û sazîyên ku kêm û zêde dişibin yên ku avakêrê mêjîyê çînî hêja didît: Doktrîna Konfuçyus ku li gor wê divê mirov bi ya dê û bavan bike û divê rêzê ji hîyeraşîyê re bigre, bi sedsalan di mêjîyê çînîyan de weke ola dewletê hat niqirandin.

Polîsekî ku di dema Mao de pirs jê hatibû kirin, wisa bersiv dabû: *"Diz? Na bîsîkletên ku mirov bikaribe bidize tunene, û eger yek bi bîsîkleteke nû bê dîtin, em yekser dizanin ka çi qewimî!".* Di romana bi navê *Ronde de flics à Pekin* (Dewrîya Polîsan li Pekînê) gelek serpêhatîyên bi vî rengî hene ku li ber çavên mirovên weke me yên ku bi saya fîlm û pirtûkên serketî alimîyê hîper-şidetê ne, safik xuya dikin. Tê de derhênerê fîlman û nivîskar Ning Ying, ku di sala 1959ê de ji dayik bûye, romana xwe vediguherîne fîlmekî ku civakeke nîzama wê ji ber hin alozîyan xirakirî nîşan dide: Kuçikekî bêxwedî ku di kolanan de herkesê di ber re derbas dibe gez dike, diz -ku jî dema guhertinên civakî yên piştî devjêberdana aborîya sosyalîst qewimîn û vir ve hene- û mirovên nû dewlemendbûyî. Herçiqasî rexne li vê romanê tê girtin jî, di çîroka wê de ku di qerekoleke heremî de derbas dibe, timî weke misogerkerên nîzama civakî ku demeke hatiye xirab kirin, behsa polîsan tê kirin û di berdêla vê yekê de jî şidetekê, rêveberîyeke hişk û çavdêrîyekê giştî ku heta detayên herî biçûk yên jîyana civakî tên ferz kirin.

Di romana xweşnivîsî bi navê *Ripoux à Zhengzhou* [Detektîf li Zhenghûyê], (7) nivîskar Zhang Yu behsa polîsekî qurnaz ku ji bo girtina dizên biçûk û li dijî bazirganîya narkotîkê ya biçûk tu kesî bi qasî wî jêhatî û kerhatî nîne. Timî ji nû ve birêkûpêkkirina nîzama civakê li gor sîstemeke ji alîyê Partîyê ve hatî dîyar kirin, Partî bi xwe temsîla morovî ya Tao ye ku fermandarê her tiştê li ser rûyê erdê ye. Li alîyê din jî, slogana maoîst "xizmeta gel kirin!" ya li ser dîwarên qerekolan nivîsî ye, bi tenê di teorîyê de be jî hîna rast e; roman û fîlmên Komara Gel ya Çînê bi dilşikestî vê fikirê çi kêm û çi zêde tînîn ziman.

Li cîhana rojava mijarên pirdîtî yên heyfgir û rêzekujêrî, yên ku sûcdar weke îmajeke xirabîya "xwezayî" nîşan didin. Ew vîzyona ku mirovî weke xwedîyê gunehê cewherî dibînin, piştrast dikin. Ev jî xisleta mêjîyê rastgir e. Lê belê çîrokên ku behsa şert û mercên civakî weke sedemê jirêderketinan dike jî, hene. Herçî romana polîsî ya çînî ye, ew hebûna sûcê weke xirabûneke nîzama civakî dibîne ku divê bê rast kirin, da ku mirov bikaribe ahenga civakê pêk bîne. Ew hebûna sûc weke kiryara takekesên dilxirab ku divê ji holê werin rakirin, nanirxîne. "Thriller" [roman û fîlmên li ser rêzekujêran; nota wergêr] ku li Hong Kong û Taiwanê yên herî biserketî ne, li Komara Gel a Çînê jî hene, lê ew hê jî kêm in û tesîra sînemaya amerîkî li ser wan e.

Aborîya bazarê ku destûrê dide konsepta takekesî di nav vê civakê de li ser jîyana kolektîf avabûyî, xwe bide pêş, wê bêgûman şiklên nedîtî yên romana reş derxe holê; yên ku aîdîyeta wan a di nav komeke civakî de wan xurt dike. Weke di berhema Liu Qingbang a bi navê *Le Puits* (Bîr) (8) ku tê de nivîskar bi awayekî xav û sar behsa vê civaka şîzofren dike, tê de sûc tê ceza kirin, lê kûjer çiqasî sûcdar bin ewqasî bêguneh in jî.

* Nivîskarê pênc romanan e ku bi navê Mi Jianxiu di weşanên l'Aube de derdiçin. Romana wî ya (bi navê xwe) dawî çapkirî: *les disparus du laogaï* (Wendayên Laogaï'ê), weşanên Rouergue, Parîs, 2000.

1 Weke nimûne Binêre *Trois affaires criminelles résolues par le Juge Ti* (Sê Dosyayên Sucê Kuştinê ku Dadgerê Ti Ew Çareser Kirin.) romaneke çînî ya kevin ya polîsî ye ku ji alîyê Robert Van Gulik hat wergerandin, piştnivîs û pêşnivîs kirin, 10/18, Paris, 1988

2 *Leyîstin ji bo Thrills* (sernavê original: *Wan de jiu shi xintiao,* Pékin, 1989), Penguin Books, London, 1997. Herwiha binêre li *Feu et glace/Agir û Qeşa,* weşanên Philippe Picquier, Arles, 1992 (sernavê orîjînal: *Yi ban shi huo yan, yi ban shi hai shui,* Pékin, 1989)

3 He Jiahong, *Secrets et délits à la Bourse de Pékin / Raz û Sûc li Borsaya Pekînê,* L'Aube, La Tour-d'Aigues, 2006

4 Qiu Xialong, *La Bonne Fortune de Monsieur Ma / Serweta Mezin a Rêzdar Ma,* Liana Lévi, Parîs, 2010

5 Diane Weiliang, *Le Papillon de papier/Pirpirînka ji Kaxetê,* Nil, Parîs, 2010

6 Voir François Cheng, *Vide et plein. Le langage pictural chinois/Vala û Tijî. Zimanê bi resman ê çînîyan,* Seuil, Parîs, 1979

7 Zhang Yu, *Ripoux à Zhengzhou/Dedektîfê li Zhengzhou,* Philippe Picquier, Arles, 2002 (sernavê orjînal: *Ruan ruo,* Pekîn, 2000)

8 Liu Qingbang, *Le Puits/Bîr,* Bleu de Chine, Paris, 2003 (sernavê orjînal: *Shenmu,* Pekîn, 2000), Li Yang bi navê *Blind Shaft/Çala Kor* adapteyî sînemayê kir

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Stratejîyeke têkçûyî li dij Îranê

Gary Sick *

Heger şerek li dij Îranê rû bide, herkes dê wenda bike. Hin alî, dîyar e difikirin ku ew dikarin xwe ji bandorên demkurt ên kujer biparêzin û dibe ku ev yek rast be. Lê belê di dema dûr û dirêj de wê ji bo hemû cîhanê berdêlên mezin yên siyasî, aborî û stratejîk hebin û pêşî li wan girtin wê ne mumkin be.

Bawer im, dê gelek hindik kes li dij wê nihêrînê derkevin ku Îraneke bê çekên *navokî* baştir e ji Îraneke xwedîya çekên weha. Hetta Îran bi xwe jî. Ji *bilî* teftîşên tesîsên sereke yên nukleerî yên ji alîyên Rêxistina Navneteweyî ya Enerjîya Navokî (IAEA) û serokên wê bi awayekî rûtîn dibêjin ku xwedîbûn, hilberandin û bikaranîna çekên navokî bi Îslamê re bi hev nakin, Îran hîna jî endameke Peymana Pêşîlêgirtina Belavbûna Nukleerî (NPT) ye. Ji dema Şah û vir ve Îran li Rojhilatê Navîn herêmên bê çekên navokî pêşnîyar dike.

Gerînendeyên Rêxistina Neteweyî ya Îstîxbaratê ya Dewletên Yekgirtî dîyar dike ku Îranê biryara avakirina bombeyekê nedaye lê sedem hene ku mirov bawer bike ku biryareke weha derkeve holê. (1) Lê belê di dîroka navokî ya Îranê de qul hene û lihevnegirtin rê li pê nebawerbûnê vedikin. Û axaftinên provokatîf ên serekên şoreşa îslamî ya Îranê vê gumanbarîyê zêdetir dikin. Pirsgirêk ew e ka çi dê were kirin.

Pêkirin veguherîn şerekî

Ekoleke berfireh a hizran heye ku israr dike ku bi tenê zext û fişarê li ser Îranê dike ku wê ji bo guhertina helwêsta xwe îqna bike. Di vê rewşê de fişar di teşeya pêkirinên dualî û navneteweyî de meşîyan. Vê siyasetê di naverasta salên 1990ê de bi rêvebirîya **Bill Clinton** re dest pê kir ji alîyê hikûmetên **George W. Bush** û **Barack Obama** ve bi awayekî azwer hat şopandin. (2) Di destpêkê de, dewletên ewropî nexwest tê de cih bigirin, lê belê di van salên dawîyê de Fransa û Brîtanya bûn serokên cîhanê ku piştgirîya siyaseta tund a mueyîdeyan dikin.

Dema ku pêkirinan dest pê kir, Îran bi tenê xwedî bernameyeke seretayî ya navokî bû ku yek santrifujeke wê ya çalak jî tunebû. Îro, piştî 16 salên bi pêkirinên hişktir, IAEA radigihîne ku Îran xwedî bernameyeke pêşketî ya navokî ye û li du tesîsên mezin 8000 santrifujên wê yên çalak hene û di stokên wê de 5 ton uranyûma zexmkirî ya nizim heye. Ev yek siyaseteke şaş radixe ber çavan.

Wekî bersiv, pêkirin hatin hişktir kirin û gihîştin wê radeyê ku pêşî li firotina berhemên neftî yên Îranê bê girtin û bi vî awayî Îran ji zêdeyî 50 dersedê jêhatina xwe bêpar hat hiştin. Bloke kirina keştîgehên Îranê ya ji bo neftê tê wateya bizaveke şer. Pêkirinên bi vî rengî, ku divîyabû li hember şer bibûna alternatîvek, bi demê re gihîşt merheleyekê, ku veguherîn şerekî aborî yê berbiçav.

Heger fişara aborî weha berdewam bike, dê heta naverasta 2012ê şerê aborî bigihîje lûtkeya xwe û Dewletên Yekgirtî û Yekîtîya Ewropî bankayên îranî û nefta iranî hema bi giştî bi awayekî fermî boykot bikin. Tu kes nikare guman bike ka Îran dê bersiveke çawa bide vê êrişê, lê belê dijwar e ku mirov pê bawer bike îranî bi henûnî teslîm bibin, yan jî dest û lingên xwe girêdin û tiştekî nekin.

Stratejîya zextê ya li dij Îranê li ser wê bawerîya negotî bilind dibe ku Îran li dij wan dewletan, ku di destê xwe de şiva pêkirinan kil dike, zirareke cidî bide. Weha xuya dike ku heman fikir di nav wan kesên nenavkirî de jî serdest e, ku li dij Îranê bi kuştina zanyarên îranî, bi êrişên sîber ên wekî kurmevîrusa *Stuxnet*, bi hewla mudaxeleya ser çalakbûna santrifujên îranê, şerekî dimeşînin. (3) Niha jî hat piştrast kirin ku Dewletên Yekgirtî li ser Îranê firokeyeke bênav difirîne, ku herî kêm dudu ji wan hatin xistin û ya sêyemîn jî bi xisareke hindik hat desteser kirin. Hin îddîayên hêjayî bawer kirinê jî hene ku ji bo tevgerên cudaxwaz ên Belucistan, Xuzistan, Kurdistan û Azerbaycanê jî ji derve tên piştgirî kirin. Hat ragihandin ku Îsraîlê li Belucistanê hin sîxur girtine kar, ku xwe wekî endamên CIAyê didan nas kirin. (4)

Ev hemû bi çavekî kêfxweş tê dîtin û Îsraîl, Dewletên Yekgirtî û hin kapîtalîstên ewropî pê tatmîn dibin. Herçend bi awayekî perîyodîk tê îddîa kirin ku Îran li dij aştî û seqemgîrîya navneteweyî gefek e jî, siyaseta rojavayî li ser wê gumankirinê hatiye ava kirin ku Îran di rastîyê de nikare li dij pêkirinên aborî û xeterên veşartî yên ji bo ewlekarîya xwe bersivekê bide. Tu alîyên ku di vê stratejîya tund de cih digirin li hember tevgerên bi vî rengî yên li ser axa xwe musamaha nîşan nade. Îca, gelo bersiveke Îranê heye?

Îran gefeke mezin a leşkerî nîne, heta li dij cîranên xwe jî. Budçeya leşkerî ya Îranê ne bi tenê li hember budçeyên Dewletên Yekgirtî û NATOyê, lê herweha li hember lêçûnên Konseya Hevkarîyê ya Welatên Kendavê, ku tê de şeş cîranên wê yên ereb ên li Kendava Fars jî hene, gelek piçûk e. (5) Îran ji alîyê DY û hêzên NATOyê ve hatiye dorpêç kirin, ku tê de çendîn baregeh û hêzên deryayî jî hene. Îran pir baş pê dizanê ku ew di vî warî de qels e û hewlê dide ku ji rûbirûhatineke leşkerî dûr bimîne.

Di şûna wê de Îran perê xwe xist pergaleke berewavîyê ya zexm, lê nebuha, ku ji bo dagîrkerên potansîyel dê gelek buha be. Îranê herweha bi salan teknîkên asîmetrîk ên şer pêş xistin, ên wekî şerê gerîla û komên botan li deryayê ku serê yên din li hev bixe û belbî keştîyên hêzên deryayî noqî avê bike. Îranê bataryayên mûşekên gerok jî ava kirin, ku basît in, lê belê dema ku li dij hedefê bi hejmareke zêde werin bi kar anîn, dikarin efektîv bibin.

Reqabeta di qada sîber de

Şerê sîber beşeke din a bisporîya Îranê ye. Li sîstemên mezin ên leşkerî cudatir, Înternet qadeke weha ye ku hemû yeksan in û Îranê ji zû de hostetîya xwe ya di vî warî de nîşan da. Îranê, piştî hilbijartinên protestokirî yên sala 2009ê bi şarezabûna xwe ya di warê Înternetê de nikarî gelê xwe bitepisîne. Ji gelek dewletên ereb cudatir, ku sala çûyî şahidîya xwepêşandanên girseyî kirin, Îranê rêjeyeke hilbijartî ya Înternetê asê kir da ku pê rê li bikaranîna Facebook, Twitter û SMSê bigire, bêyî ku zirarekê bide aborîya xwe. Îranê herweha karî bi awayekî serkeftî bikeve torên civakî û nav bikarhêneran da ku serekên potensîyel ên muxalefetê dîyar bike û gotin û bizavên wan bi kar anî ku wan bidarizîne.

Li Îranê gelek endazyarên ciwan ên jêhatî yên ITê hene ku di nav artêşeke sîber a nîv-veşartî de cih digirin. Heta îro, ev hêz bêhtir di warê pêkutîya nav welêt de dîyar bû. Lê belê, ew dikarin pir bi hêsanî wekî çekekî li dij neyarên Îranê jî werin bi kar anîn. Di van demên dawîyê de, hackerekî, ku dihat îddîa kirin ku suûdî ye, êriş bir ser bankeyeke îsraîlî; bi hezaran hesabên karta kredîyê yên îsraîlîyan hatin weşandin. Paşê êrişên din li dij borsaya qîmetên menkul û şirketa *El Al Airlines* pêk hatin. Gelo **OxOmar** (hacker) bi rastî jî suûdî bû? Gelo Îran jî dikare heman tiştî bike? Gelo mirov bi rastî jî dikare emîn bibe ka li ser Înternetê kî êriş dike, yan çima?

Şarezayên ewlekarîya Înternetê bi xemgînî pê dizanin ku hema hema hemû sîstemên nûjen, ku ji bendavan heta palûkeyan, ji îmhakirina zivilan heta şebekeya elektrîkê re mijûl dibin, bi kompîturê tên kontrol kirin û ev sîstem gelek caran dibin armanca êrişên li ser Înternetê. Herweha programên niyetxerab dikarin ji derve ve bixin nav sîstemê, wekî kurmevîrusa ***Stuxnet***, ku li dij Îranê hatibû bi kar anîn. Jixwe wekî ***Stuxnet***, gelek caran ne mumkin e ku were dîyar kirin ka êriş ji alîyê kê ve hatiye li dar xistin. Înternet bi tenê ji bo muxalîfên zîrek û azwer re vekirî nîne, lê belê li xwe şopa tilîyan jî dihêle.

Çekên komkujîyê yên Îranê

Çekê herî girîng ê Îranê, ne keştîyên wê yên bilez, yan jî artêşa wê ya sîber e, lê belê çekên nukleer in, ku belkî jî nînin. Çekên îmhakirina girseyî ya Îranê aborî ne, nemaze jî di warê buhayên neftê de. Û da ku vî çekî bi kar bîne, Îran ne hewce ye ku Tengava Hurmizê bigire.

Heger hemû pêkirinên navneteweyî bi awayekî serkeftî werin sepandin, wê heta naverasta 2012ê di rojê de dora 2 mîlyon varîlên nefta Îranê ji bazarê kêm bibe. Erebistana Suûdîyê dîyar kir ku da ku vê kêmbûnê bertaraf bike, ew dê bêhtir petrolê hiberîne û Dewletên Yekgirtî û yên din dikarin rezervên xwe yên stratejîk vekin da ku pêşî li lihevderneketinê bigirin. Jixwe niha berhemên Lîbyayê dîsa tên bazarê û ew jî dê bi kêr were. Gelek welat xwedî rezervên stratejîk in, ku dikare vê valahîyê dagire.

Lê belê Ewropa divê bi tenê serê rojê şûna 600.000 varîlan, ku ji Îranê tên, dagire. Piranîya wê jî li sê welatên ewropî tê bi kar anîn, ku xwedî aborîyeke hesas in: Yûnanistan, Îtalya û Îspanya. Îthala wan a ji Îranê îro bêhtir li ser peymanên pevguhertinê ne û peymanên dirêj ên erzan in, û dê zehmet be ku ev valahî bi heman buha û heman kalîteyê were dagirtin. Peymanên nû divê werin muzakere kirin, tedarîkvanên nû divê werin dîtin û zerengîya rafinerîyan divê ji nû de were eyar kirin.

Gelo ev pêvajoya derbasbûnê dê bê pirsgirêk bimeşe, bêyî ku di buhayê neftê de zêdebûneke berbiçav pêk were? Di destpêka meha çileyê de, dema ku Îranê û Dewletên Yekgirtî li ser Tengava Hurmizê gef li hev du xwarin, buhayê neftê bi zêdeyî 6 dersedan bilind bû û ji wê demê vir ve jî di wê asta bilind de ma. Ev yek, bêyî ku guleyek were teqandin û bêyî ku pêkirinên nû werin sepandin, pêk hatin. Wekî ku herkes pê dizane buhayên neftê bilind dibin û bandorê ne bi tenê li ser benzînê dikin, ku buhayên wê rasterast bi siyasetê re girêdayî ye, lê herweha hema hema li ser her tiştê din dikin ku tên hilberandin û kişandin.

Ayub Raoof Mahmood: **Bênav 3**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 80 x 80 cm

Li senaryoya çend mehên pêşîya me bifikirin. Wekî ku cîhan hewlê dide ku şûna nefta Îranê dabigire û wekî ku Îran di nav zehmetîyê de ku derameda xwe ya neteweyî berdewam bike, buhayê neftê jî dê her bilindtir dibe. Heger li başûrê Iraqê li ser xetên lûleya neftê û binkeyên lêbarkirina neftê de çend teqîn pêk werin, ku berpirsîyarên wan nayên zanîn, hingê wê di rojê de yek mîlyon varîl neft ji bazarê kêm bibe. Di heman demê de, heger li rafînerîyên suûdî û kuweytî de arize derkevin û barkirina neftê ya li Mîrîtîyên Yekgirtî yên Ereb ji ber pirsgirêkên teknîkî asê bibin, ku ji ber kontrolkirina kompîturî yan sabotajê pêk werin, wê demê çendîn mîlyon varîlên neftê ji bo demekê ji bazarê radibin.

Ev hemû pirsgirêkên demborî ne ku dikarin werin çareser kirin, lê belê kes nikare guman bike ka buhayê neftê çiqas bilind bibe û çend wext weha bimîne, nemaze jî heger çendîn bûyerên negumankirî rû bidin û vê dîmenê tevlihevtir bikin. Bandorên wê yên li ser aborîya cîhanê dê gelek cidî bibin, nexasme di demeke weha de ku aborîya cîhanê hîna nû xwe ji Krîza Mezin rizgar dike.

Nirxandina lêçûn û jêhatan

Mebesta vê spekulasyona min bin-xêzkirina wê yekê ye ku pêkirinên ku 'fercî dikin' bi tenê li ser Îranê bandorê nakin, lê dibe ku li ser cîhanê bi giştî hin encamên giran bîne. Rîzîkoyeke weha dibe ku ji bo pêkanîna armanceke siyasî ya xurt û domdar hêja be.

Lê belê di vir de armanc çi ye? Heger mebest ew e ku Îran teslîm bibe û dawî li bernameya xwe ya zexmkirina uranyûmê bîne, her kesek ku bi kêmî ve Îranê nas dike, dikare bibêje ku Îran ejderhayek e. Ne xem e ka kî li Tehranê hikûm dike, ev yek pêk nayê.

Heger mebest ew e ku Îran vegere ser maseya muzakereyan, ev zêdeyî salek e ku Îran sînyalan dide ku *bêyî pêş-şertan* ew amade ye ku muzakere bike, lê belê pêşîn qebûl nake ku tenha encama maqûl a muzakereyan ew be ku Îran bi giştî dawî li bernameya xwe ya navokî bîne. Biryara Civata Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekgirtî vê yekê daxwaz dike û ev yek di nameya **Catherine Ashton** a ji bo Îranê de bi awayekî aşkere hat nivîsandin. Ev yek di stratejîya Rojava de mezintirîn asteng bû û her ji ber vê yekê em îro di nav lehzeyeke weha xeternak de ne. (6)

Lê belê heger mebesta van pêkirinan, bi awayekî gelek xwerû, cezakirina Îranê be, ku di encamê de zorê bidin wê ku bikeve şerekî, wê demê ev yek dikare pêk were. Lê belê ev yek gefa navokî ya potensîyel a Îranê naqedîne. Berevajîya wê, ev yek nikare wê xerabtir bike, ku niha şik û gumanên xwe yên derbarê raya giştî ya cîhanê ya hikûmeta tundrew a Îranê zêde dibin û lewma daxwazên wan red dike.

Rastî ew e ku şerê aborî ji zû de dest pê kir; encamên wê yên giran hene û pêşî ne. Ji ber ku di dahatûyê de Îran *dikare* biryarekê bide ku zanista xwe ya navokî ji bo avakirina çekekî bi kar bîne. Tiştê ku pir caran tê paşguh kirin ew e ku şerekî dîrekt an îndîrekt ê li dij Îranê biryardarîya wê ya zexmkirina uranyûmê zêdetir dike, ku ev yek dikare bigihîje çêkirina çekekî nukleerî.

Kesên ku di vê siyaseta bêencam de cih digirin, divê dawî lê bînin, bêhna xwe vedin û bi hilma fireh li ser encamên wê bifikirin. Gelo tiştê ku sibêrojê pêk were ew e ku ev pêkirinên ultra Îranê bînin li ber hilweşînê? Ev pirsgirêkek e ku piştî ku krîzê dest pê kir, dê hemû hevwelatîyên li her derê ji serokên xwe bipirsin. Serokên me divê zane bin û vê yekê ji niha de bibînin.

* Şewirmenê berê yê Serok Jimmy Carter, nivîskarê pirtûka *Suprîza Cotmehê: Rehîneyên Amerîkî li Îranê û Hilbijartina Ronald Reagan*, IB Tauris & Co Ltd, Londra, 1991.

1 "Tofanek li ser Îranê," Kovara Way to see, No. 93, hezîran-tîrmeh 2007

2 Bixwînin *Manière de voir,* hjm. 93, "Tempête sur l'Iran" ("Tofana li ser Îranê"), hezîran-tîrmeh 2007

3 Philippe Rivière, "Êrişên Sîber li dijî Tehranê", Le Monde Diplomatique, adar, cotmeh

4 Alain Gresh, "Dema ku Îsraîl Êrişî Îranê Bike? Du sal berê..." Blog News from the East, 17 rêbendan 2012

5 Budçeya leşkerî ya Erebistana Suûdîyê 45 mîlyar, ya Kuweytê 4.6 û ya Îranê jî 9 mîlyar in

6 Peter Jenkins, "Tiştê herî dawî ku di muzakereyên nukleerî de pêşnîyarî Îranê were kirin: Hilma xwe negire", www.lobelog.com/, 30 rêbendan 2012

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Peyvên Pasternak û bêdengîya Stalîn

DOMINIQUE AUTRAND

Gava bahsa "Pasternak" dibe, mirov zexteke tûj a kêfxweşîyê di navdilê xwe de his dike". Bi vê hevoka balkêş bîyografîya şahane (1) ya ku rojnamevan, helbestvan û romannivîsê rûs **Dmîtrî Bykov** li ser nivîskarê *Doktor Jîvago* nivîsiye û li Fransayê bi sernavê *La justification/ Piştrastkirinê* (Denoël, 2005) tê nasîn, dest pê dike. Bexteweriyeke din a ku ev ceribandina Bykov, bi alîkarîya wergera zelal û rewan a Hélène Henry, dide mirov û bi hêsanî ji giştî ber bi taybetî ve diguhere, heftê salên dîroka çand û siyasetê ya Rûsyaya sovyetî bi şirovekirineke stîlîstî gelek helbestên, ku bidilbijokî cîh dide wan û wan rave dike, li ber çavên mirov radixe.

Li gor Bykov, helbesta rûsî a sedsala XXê kursîya xwe li serê civata helbesta cîhanî danîye û Pasternak jî nûnerê wê yê herî serketî ye, ku ew dinyayê weke *"muzîkeke ku divê mirov jê re peyvan peyda bike"* dibîne. Di 1917ê de, bi saya helbesteke ronîdar a ku dewlemendîya jîyanê pîroz dike, ev xortê 27 salî felsefeya şoreşê rave dike. Di 1922yê de, ew evîndar e, heyam bi mezinayîya xwe ve derdikeve holê: Bi *Xwişka min jîyanê* re, zîrekîya wî ya lîrîk diteqe, deng vedide û yên li dorê dibin heyranên wî. Piştî wê zûbizû bi hatina ser desthilatê ya **Jozef Stalîn** re xeyalşikestî û bêhêvî dibe. Lê, bi awayekî balkêş, Pasternak dê salên 1930ê û şerî, bêyî zîyaneke mezin derbas bike û li pey xwe bihêle.

Hinek dê wî bi xwedî helwesteke xapînokî tawanbar bikin: Şik tê tuneye ku ji bo wî, huner dê her nirxê herî berz ê jîyanê be, ev jî destûrê dide ku heta dereceyekê karibe bê qebûl kirin ku mêjîyê mirov li derveyî exlaq tev bigere. **Bykov** ji bo vê pêvajoya tevlîhev şirove bike, hawara xwe dibe zindîbûna îstisnayî ya **Pasternak** û kapasîteya wî ya zindîkirinê ya nexwezayî û herwiha hawara xwe dibe ya ku **Anna Ahmedova**, helbestvana mezin weke *daneke zaroktîyê ya herheyî"* bi nav dike. Lê Pasternak her wiha jî şadetîyeke cûre *"jîrîtîya wendakirinê kapasîteyeke jê hêz û wateyên nû derxistinê"* jî dike. Weke ku azmûnên jîyanê heta bi felaketên wê ,ku weke rastiya nedîyar a jîyanê tên hesibandin, bingeha jîyanê eşkere bikin. Weke ku ew deriyê wateya kûr ya jîyandinê û ya xweşikayiya dinyayê ku nivîskar pîroz dike vebike.

Nivîsa wî dê têra xwe li gor talîmata ji nû ve vegerîyana realîzmê bûya,; wî dê bi vî awayî xwe ji êrişên rasterast ên li ser Stalîn biparasta û ew dê ji tasfîyebûnê rizgar bûbûya. Ew dê neçarî qedera trajîk a heval û hogirên xwe yên kû hîn bêtir di bereyê pêş de cîh digirtin, nebûna: **Vladimir Mayakovskî**, di 1930ê de xwe kuşt, **Marina Tsvétayeva**ya ku wî dozde salan têkilîya xwe pê re bi name nivîsandinê domand, di 1941ê de xwe kuşt, **Ossip Mandelstam**, ji serman û helakbûna li ber derîyên Kolymayê (Sîbîrya) di 1938ê de mir, an jî **Isaac Babel** nivîskarê ku li ser çend "qehremanê erênî" yên *Siwarên Sor* rawestîya, di 1940ê de hate gulebaran kirin, ku çapkirina berhemên wî yên giştî ya bi fransî jî piştrast dike ku ew çi bûyernivîsekî heyama xwe ya bêperwa yê bêhempa bûye. (2)

Çawa ku **Pûşkîn** li dijî **Nîkolayê I**ê derket, Bîkov vedibêje, Pasternak jî bi rola xwe ya "helbestvanê serekî" yê di bin nîrê desthilateke despot de radibe û li dijî Stalîn *"rikeberîya desthilatê dike"*, lê *"desthilat bi hêz dibe û ew jî di navbera xwe û wê de mêzênekê çêdike"*. Di 1934ê de, dema ku **Mandelstam** bi sedema nivîsandina rexneyekî tûj li dijî Stalîn, tê girtin, "Hûtê Osetyayî", Pasternak, bixwe, weke endamê Yekîtîya Nipînû ya Nivîskaran ku "hemî kesên dixwazin di avakirina sosyalîzmê de cih bigirin" digire nav xwe tê qebûl kirin û ev yekîtî statuya nivîskarê/a profesyonel jî dide wan: Her wiha dibe endamê birêveberîyê û heta 1945ê jî wiha dimîne. Heta piştî vê jî, tevî ku helbestên wî nedihatin weşandin, ew neçar dima ku bi zehmetî debara xwe bi tenê bi saya mûçeyê kêm yê xanenişînîyê ku li bajarê Peredelkino distand û bi saya wergêrîyê bike. Wî herwiha hewl dida biçe hawara hevalên xwe yên di bin zexta rejîmê de û Stalîn bi tirseke mezin û pîroz li hemberî fîgura ku ji wî wa ye Pasternak sembolîze dike, rawestiyaye.

Yê ku zora wî dibe, ne Stalîn e, lê **Nîkîta Krûşçev** e. Weke ku Bykov jî rave dike, divê mirov ji demên lîberalbûnê ku tê de "desthilatdarî ji hêza xwe bêhtir sînorên xwe nîşan dide" gumanbar bibe. Şaş têgihîştineke trajîk –û qebe– bû: Gava ku Xelata Nobelê di çirîya pêşîn a 1958ê de dan nivîskarekî rûs, "Rojava"yê bêguman xwest têkîliyên navbera Rusya û Amerîkayê nerm bike; karbidestên sovyetî jî ev yek weke provakasyonekê dîtin. *Doktor Jîvago*, salek berê li Îtalyayê derket û di maweya şeş mehan de ji bo bîst û sê zimanan hate wergerandin; ev pirtûk behsa qehremanekî bi tenê dike, ku mafê xwe yê beşdarnebûna şaşîyên dema xwe bi kar tîne. Pasternakê ku di bin fişareke mezin de ma, mecbûr bû ku xelatê red bike û di 1960ê de mir. *Doktor Jîvago* dê li YKSSê heta sala 1988ê neyê çap kirin. Piştî ku çap bû jî, bi tenê li dibistanan hate xwendin, bû *"beşek ji hêmanên resmî yên nirxên rûsî-sovyetî; di rêza "Xavyar, kosmos, Pûşkîn û textebûkikên rûsî yên di nav hev de"*.

1 Dmitri Bykov, *Boris Pasternak*, wergera fransî ya ji rûsî û têbinî Hélène Henry, Fayard, Parîs

2 Isaac Babel, *Œuvres complètes/Berhemên Giştî*, wergera fransî ya ji rûsî Sophie Benech, Le Bruit du Temps, Paris

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

AYUB RAOOF MAHMOOD: **Bênav**, li ser kaxizê boyaxa avî, 21 x 29 cm

Vebîner û Fatîh

MAURICE LEMOINE

Doktor Livingstone, ma ez melheze dikim? di 1871ê de, li ser peravên gola Tanganykayê, hevdîtina sembolîk a rojnamevanê îngilîz-emrîkî **Henry Stanley** û mîsyonerê skoçî **David Livingstone** ku bi salan e haya me ji wan nemabû, bi têra xwe alîkarîya populerkirina îmaja vebîneran kir; wê ji wan di dema wan de lehengên navdar ên rastî çêkirin. **Gilbert Grellet** ji bo ku bide ser şopa efsaneyên wan yên li ser sînorên dinyaya tê zanîn, pişta xwe dide nivîsên ku li *Le Tour du Monde (Gera Cîhanê)* hatine weşandin. (1)

Ji bo maceraperestan, rastîya mutleq nîne: *"Îmaja reşikê qirêj, serxweş û ehmeq, yê ku jinên obez û zarokên zikmezin li dora wî ye, ji ruhê xwe bikin"*, dinivîse Stanley, gava bi awayekî pesnokî portreya gundîyê ûgandayî xêz dike; lê dîsa ew e ku di berfanbara 1875ê de ji bo ku "serpêhatîyek"ê pêk bîne, ji Kongoyê heya Atlantîkê tê xwar, dema vê dike jî rêya xwe bi derbên tivingan vedike. Herçî **Livingstone** e, ew çavdêrek e ku pêşhukmên wî li hemberî civakên di nav wan re derbas dibe, nînin û xwe wekî dijminê sûndxwarî yê mîsaqê dide nîşan, wî yê bi awayekî dilrehet di dema keşfên xwe de ji "erebên" nêçîrvanên koleyan alîkarî bistanda.

Mirov wisa bawer dike ku şef û qralên herêmî ne timî dilovan in û heta qet ne dilovan in, xwînrêj in, mirovxwer an jî zordest in. Lê ji Zambèzeyê heta bi Mékongé, ji Sumatrayê heta bi "Rojhilatê tevlihev", çermspî jî bi komî dikujin. Serpêhatîya destanwarî, an jî trajîk ku bi cesaret, hingofî û dînîtîyê re tevlihev bûye; tevgera vebîneran bi vî awayî rê li ber ên ku paşê wê bersiv bidana vê pirsê, vedikir : *"Hûn hatin ba me, bêyî ku me bang li we kiribe. Hûn ji bo çi hatin?"* -di dawîya salên 1880yê de xwecihîyek ji başûra Annamê li ser navên hemûyên din ji kaptanê fransî **Pierre Paul Cupet** vê pirsê dipirse. Dê qral **Léopold II** berîya desteserkirina du milyon kîlometre kareyan li Kongoyê, neyekser bersiveke hişk wekî *"ji Belçîkayê re kolonîyek divê!"* bidaya.

Li gel vê yekê, di berhema xwe ya balkêş a li ser "globalbûna îberîkê", **Serge Gruzinski** hin fikrên hatine qebûl kirin ser û bin dike: *"Şaş e mirov bawer bike ku destpêkê fikreke emperyalîst a dagîrkerîyê hebû. (...) Firehbûna Ewropayê çi qasî li asta jor bûyera polîtîk be, ewqasî jî bûyereke qederên ferdî ye"*. (2) Mînak : Di sala 1511ê de, gava portekîzî li "biharat"an digerin, pere û hêza xwe didin ser li Malacca (Malezya)yê û kastîlyayî [spanî] neçar dimînin Kubayê bi dest bixin. Ji bidestxistina vê giravê û pê ve, **Hernán Cortes** maceraperestek e ku xwe ji zehmetîyan xilas kiriye, dijberê Textê Qiraltîyê ye û Mexico-Tenochtitlânê bi dest dixe. Wêrekîya wî ya ecêb û parçebûna polîtîk a cîhana navenda Amerîkayê dê çarenûsa herêmê dîyar bikira û piştre jî wê bikira ku "metropol" jî di vê dagîrkerîyê de cihê xwe bigire. Portekîzî jî li hemberî xweragirîya mandarînên çînî (memurên bilind ên Çînê) têk diçin; heya avabûna Macaoyê wan dê modela nû ya "kolonyal" fam nekiraya.

Ji dema dagîrkirina Amerîkayê ve, spanîyên ku li wir bi cih dibin, berê xwe didin Okyanûsa Pasîfîkê, Fîlîpînê bi dest dixin û di heman demê de fikra êrişa Împaratorîya Osmanî jî diewirînin, ev hê înîsîyatîfeke herêmî ye: *"Berevajî klîşeyên ku ne li gor dîrokê ne, ên ku metropoleke spanî dinexşînin ku pê mijûl in li dinyayê belav bibe, ya ku ber bi súc û guneh ve dajoye hawirdor e, ya ku wê dide sekinandin nîvgirav e"*. "Baz"ên ku ji ber bêtevgerîya "dayîkniştimanê" pir zivêr dibin, nîqaşê dikin… pir nûjen e. Bi vî awayî, li ber bêderfetîya birêvebirina weazeke "pasîfîk", radigihînin ku *"peywira qebûlkirina gotinên Îsa 'mudaxaleyê'* rewa dike" û berjewendîya *"lêdana rêgir"* derdixin pêş. Di 1538ê de fransîskanên Jaliscoyê (Meksîka) dibêjin ku sedema zehmetîyên kişandine ew e ku *"bi leşkeran re digerin"*. Wisa dixuye ku organîzasyonên me yên mirovî tiştekî nû venedîtine.

1 Gilbert Grellet, *Aux frontières du monde / Li Sînorê Cîhanê,* Jean Picollec, Paris, 2011

2 Serge Gruzinski, *L'Aigle et le dragon /Eylo û Ejderha*, Fayard, Paris, 2012

Wergera ji fransî: Sevda Orak

"Veger"a Ciwan Haco

"Piştî vî temenî ez nabim koleyê kesekî"

Yado Ciwan *

Hunermend Ciwan Haco bi albuma xwe ya "Veger" bû demeke di rojevê de ye. Haco, di albuma xwe ya navborî de stranek Aşik Daimi vegerandiye kurdî û distire. Ji hêla din ve bo stranek din bi Hülya Avşarê re duetek çêkiriye. Herdu hunermendên resenkurd ku bi tirkî disitirin vegerandine ser kanî û bingeha xwe. Ji ber vê yekê dibêje Haco, "Jixwe sedem ew e ku me navê albuma xwe danîye "Veger". Gellek maneyên wê hene. Veger, vegera zaroktîyê ye, vegera zimên, vegera rihê muzîka kurdî ye…"

Dema min di 3yê adarê de li Berlînê konsera Ciwan Haco û Şivan Perwer a ji bo piştgirîya kurdên Sûrîyê û bîranîna Mîşel Temo temaşe dikir, careke din bala min kişand ku Ciwan Haco di dilê hezkirîyên muzîka kurdî de evîneke xurt ji xwe re çêkiriye. Dema derket ser sehnê, gel rabû ser pîyan jê re li çepikan da, rêzdarî û xoşewîstîya xwe ji bo hunermend nîşan da. Bêguman Haco, ji bilî hunerê xwe, bi dilnizmî, xwîngermî, xwezayîbûn û bi sempatîkbûna xwe jî li ser gel bandoreke mafdar çêkiriye.

Bi Haco re me li ser albuma wî ya nû, destpêka têkilîya wî û muzîkê, pêwendîya huner û siyasetê û hwd hevpeyvînek ji bo xwendevanên Le Monde diplomatique kurdî saz kir. Me pirsî, ewî bersivand:

Têkilîya te û muzîkê çawa dest pê kir? Yekem car kengê û çawa te xwe li stranbêjîyê sor kir û çi tiştî tesîr li ser te kir ku tu dest bi muzîkê bikî?

Di destpêka salên 80ê de bû, wextê ez hatim Almanyayê gelek rêxistinên kurdî yên bakurê Kurdistanê jî berê xwe dabûn derveyî welêt. Min jî wê demê li tembûrê dida, min li mal distira. Dema ez hatim Almanyayê telebe bûm, ketim nav wan, şevên wan çêdibûn. Hingê kesek nebû bi rastî. Kesê hebû Şivan Perwer bû. Min wilo dest pê kir. Êdî min dît, ez jîyana xwe, debara xwe ji muzîkê dikim. Biryareke ku berê min dabû tunebû. Min berê ji xwe re distira, ji malbatê re distira. Wilo hêdî hêdî bêyî ku bi xwe jî pê bihesim min dest pê kir. Jixwe wê demê ne alîkarîyeke mezin hebû, ne jî tiştek didan. Min wilo radihiştê tembûra xwe diçûm. Wê demê min ji xwe re got, 'bi xwedê ev dikare ji min re bibe kar'. Û min dît kêfa alemê ji dengê min re, ji tembûra min re tê, min go çima na!

Te albumeke nû ya 15em bi navê "Veger" di rojên derbasbûyî de ji şirketa muzîkê, ji Pelrecordsê derxist. Tu ji encam û reaksîyonan memnûn mayî?

Erê, bawer bike heta niha ez memnûn im. Ji bo kesên ku nû guhdarîyê dikin tiştekî nû bû; lê ew bi xwe ji bo min ne tiştekî nû bû. Wextê emrê min 14-15 salî bû; min Radyoya Diyarbekirê guhdarî dikir û xwîşka min Dîlberê jî gotinên stranan ji min re dinivisand. Ji hêla din ve, Pelrecords, ew jî tiştekî gelekî baş e, hêja ye, pîroz e û nû çêbûye. Muzîk, îro wijdana gelê me ye, rihê wê ye, hestên wî ne. Nexasim, miletê kurd, însanên me, gelek derd û êş û ezabatên xwe di riya muzîkê de ji hertiştî bêtir didin der. Loma jî dema ez dibînim qedirekî halo tu bidî muzîka kurdî tiştekî hêja ye. Pelrecords jî hêvîdar im di siberojê de karên baş bike; muzîka kurdî jî bigihîne pileyeke baş, weke ya cîhanê temam. Ne kêm ne zêde. Serkeftinê ji wan re jî dixwazim.

Wê demê Radyoya Erîwanê hebû, ya Bexdayê hebû, hunermend li Kurdistana Sûrîyê hebûn. Tu di bin tesîra wan de nemayî, di ya Radyoya Diyarbekirê de mayî? Tu di danasîna albûma xwe de jî dibêjî, dema ku min dest bi tembûrê kir, min gelekî li Radyoya Diyarbekirê guhdarî dikir…

Ez behsa wan stranan dikim. Bi rastî radyoya tirkî ya Diyarbekirê destpêk bû. Lê ew mesele rast e. Jixwe ziman tirkî bû û min fêm nedikir, lê rih kurdî bû. Ew stran di dinya xwe de kurd bûn, bi tirkî dihatin gotin, lê di bingeha xwe de kurdî bûn. Ma heger wilo bûna, min di xortanîya xwe de li Beatles jî guhdarî dikir, diviyabû hingê tesîra Beatles jî li min bikiraya. Di wî emrî de Beatles li min tesîr nekir, lê muzîka Radyoya Diyarbekirê ji ber ku bingeha wê û hestên wê kurdî bûn, tesîreke yekser li muzîka min kir. Min ji wan stranan hez kir. Lê sedîsed min li Radyoya Erîwanê jî guhdarî dikir, me li Mihemed Şêxo guhdarî dikir, min li Miradko guhdarî dikir. Ev bûn ku bi rastî min lê guhdarî dikirin. Zêdeyî wan, min li tiştekî din guhdarî nedikir. Lê dema em vegerin dîrokê, niha kurd û tirk bi hev re jîyane. Malbata me jî li Radyoya Diyarbekirê guhdarî dikir. Apên min, ji xwe 35-40 salî bûn, mezin bûn, dema binxet bûn. Dema hîn li Midyadê bûn, li wê radyoyê guhdarî dikirin. Ne ku tiştekî nû bû ji bo me. Tişteki malbatî bû, bi xwe re anîbûn binîya xetê li ser hidûd. Ji xwe em li ser hidûd bûn.

Malbata te, dê û bavê te li dij bûn ku tu muzîkê bikî? Ji ber ku muzîk berê wek mijûlîyeteke qatên bindest dihate dîtin. Li cem we çawa bû ev mesele?

Li herêma Torê û gundên wê ku malbata min jî tê de bû, hem êzidî hebûn, hem jî suryanî hebûn. Dûre fermana wan rabû. Di jîyana êzîdîyan de tembûr tiştekî pîroz e. Piştî ku kurd bûne misilman, ji qîmeta wê hinek hate xwar. Loma qedireke wilo mezin nedidan tembûrê. Ez behsa kurdên sunî dikim. Suryanî û kurdên êzîdî ku em di nav wan de mezin bûn, bawerîyek û qedireke pir mezin didan tembûrê. Di mala her kurdekî êzîdî de te tembûr didît. Di malbata me hemûyan de jî , di mala me hemûyan de jî tembûr hebû. Ez dibêjim, ev yek ji tesîra wê tê. Ji xwe wek malbat jî, ji bo me tê gotin ku, ev bûye 300 sal ku em bûne misilman. Em êzîdî bûn, bûne misilman. Ev ne bi tenê li ser me tê hesibandin. Kurd bi giştî êzidî bûn. Ev rastîyeke civaka kurda ye. Ji ber van, dîya min bavê min, hîç ebeden ne xerîb bû ku ji bo wan ez li tembûrê bidim. Bilakîs tembûr tembûr e. Lê tiştek tenê nedibû ku ez herim dawetên alemê û lê bidim. Qebûl nedikirin. Dema min dixwest ez rahêjim tembûra xwe û herim li dawetekê lêdim, ewan qebûl nedikir. Lê wekî din, min li mal û li cem hevalên xwe distira. Tu radihêjî tembûra xwe û tu diçî malbateke din ji wan re li tembûra xwe didî. Yanî tu qedir didî wan û tu qedir didî xwe.

Te di axaftina xwe de qala fermana wê demê kir. Li cem malbata te ev yek çawa qewimî, hûn çawa bûn binxetî?

Piştî rabûna Şêx Seîd bû. Di sala 1925ê de. Fermana malbata me di sala 1926ê de rabû. Helbet ne ku malbata me tenê, gelek malbat hebûn. Ji wan malbatan, mesela, wek mala Elîyê Ûnis, ji Diyarbekirê malbata Cemîl Paşa, mala Bozan û Bedirxanî hebûn. Gelek malbat bûn. Yek jê jî malbata me bû. Dîya min botî bû, ew jî ji Kurdistana Bakur bû, ji mala Resûl. Hingê dîya min digot, wê demê wextê kurdekî cilê wî spehî bûna dibirin, dikuştin, winda dikirin. Demek wisa bû ku dema kesek xwedî malbat be, an cilên xweşik li xwe kiribe, yan dihat kuştin yan jî fermana wî radibû. Ev gotina heta berîya du salan bû ku dîya min ji min re behs dikir.

Navbera te û xwendinê çawa ye. Tu kîjan nivîskarên kurd dixwînî? Pirtûkên ku tu jê hez dikî hene?

Çawa, belê. Mesela nivîskar Mehmed Uzun, hema bêje axlebê kitêbên wî min xwendine. Mehmed Uzun, Firat Ceweri, yên ez jê hez dikim. Ez vêga bi kurdî dixwînim. Ji ber ku ez bi gelek zimanan dizanim û zimanekî baş baş jî nizanim, ez dibêjim li ser wê jîyana min dimîne. Di malbatê de ziman kurdî bû, dema 7-8 salî bûm diçûm mektebê, wê demê jî bi erebî bû. Dûre em bûn 20 salî hatin Almanyayê, bû almanî. Piştre em çûne Norwêcê li wir di destpêkê de bû îngilîzî. Ji ber ku ji Sûrîyeyê bingeheke min î îngilîzî hebû. Dûvre êdî bû norwêcî. Lê çawa, nivîskarên kurd gelek tiştên baş kirine û layiq in. Layiqê miletê me ne û layiqê dinyayê ne jî.

Di vê çarçoveyê de te Le Monde diplomatique kurdî xwendiye, çawa dinirxînî?

Erê çawa, erê. Baş dibînim serkeftinê ji wê re dixwazim, Tiştekî pîroz e bi rastî. Yanî, bi wan mîratên ku welatê me parçe parçe kirine, xistine bin destê xwe û kirine milkê xwe. Em îro bi însanên xwe 40 mîlyon in û erdeke, coxrafyayeke ewqas mezin. Tu ji Entabê dest pê bikî, heta Dêrsim, Efrîn, Qamîşlo, Hewlêr, Mehabad û Silêmanîyê û bi çavekî kêm li me mêzandin, bi çavekî wilo ku ev kes gundî ne, hîç kêrî medeniyetê nayên. Loma jî ez dibînim, wextê ku Le Monde diplomatique bi kurdî derdikeve, yanî bi rastî tişteke pîroz e, tiştekî hêja ye. Ez spasîya wan kesên ku di Le Monde diplomatique kurdî de kar dikin dikim û herweha spasîya wan qelemên ku tê de dinivîsin, dikim. Ew kesên ku alîkarîya Le Monde diplomatique kurdî dikin daku derkeve spasîya wan jî dikim.

Gelek hunermendên kurd îro hene ku nava wan û beşek siyaseta kurdî ne xweş e, her bi polemîkan di rojevê de ne. Lê ji rêxistin û dezgehên kurdî bigire heta kesên ji rêzê, di navbera te û tu kesî de nîqaşên bi vî rengî nînin. Sirrên vê yekê çî ne gelo?

Belê, sirra wê, ez însanekî bi enîn im (hişk), tiştan ji bîr nakim. Tiştên ku kûr bin. Û di alîyekî de jî ez gelekî nerm im. Herdu alî bi min re hene. Her daîm min hişt ku di navbera min û wan de balansek çêbibe. Îro niha rastîyeke me heye, kurdên me, ev partî, ev rêxistin…. Lê min xwe kêm nedît û ez nebûme kolê kesekî heta niha. Piştî vî emrî jî ez nabim kolê kesekî. Yanî herkes vêna dizane. Min li ser rêxistineke siyasî nestira, lê min li ser her bûyereke kurdistanî stira. Li ser her zilm û tadeyeke ku li miletê min bû, li her çar parçên Kurdistanê min stira. Min bêtir qedir da karê xwe. Û karê xwe jî min bi xwe kir. Bê alîkarîya partîyeke siyasî, organîzasyoneke siyasî. Bilakis perê min xwarin. Yanî deynê min li partî û organîzasyonên kurdan hene, lê deynê wan li min nîne. Deyndarên min in. Ez bi vêna serfiraz im, elhemdulîlah. Ez dibêjim, ev terbîyeteke malbatî ye ez pê rabûm û ez dibêjim li vir ez spasîya dîya xwe dikim, bavê xwe dikim. Wan ev terbîye da min. Loma jî dema tu van tiştan ji min re dibêjî, ez pê serfiraz dibim, pê kêfxweş dibim.

Têkilîya di navbera huner, hunermend û siyasetê de divê çawa be? Divê çiqas nêzîkî hev, an dûrî hev bin. Li vê derê balanseke çawa pêwîst e?

Niha ez ne siyasetmedar im. Wextê ku ez siyasetmedar bim, ez ê bêjim ez siyasetmedar im û ez ê siyasetê bikim. Lê ez nikarim xwe dûrî siyasetê jî bikim, wekî her însanî. Her însan siyasetekê dike, lê ez wek însanekî siyasî li xwe nameyzînim. Ew hunermendên ku wek însanên siyasî li xwe dinêrin, ew di wir de şaşîyê dikin. Ew şaşîyeke mezin e. Tu hunermend î, tu dengbêj î, tu stranbêj î, tu muzîkvan î, tu wijdan û rihê gelê xwe yî û ev besî te ye. Çima tu yê bibî siyasetmedar. Li hêla din, partîyên kurdan organîzasyonên kurdan jî di vir de şaşîyeke mezin dikin. Dixwazin yek bibe kolê wan. Dixwazin yek ji bo wan kar bike. 24 saetan di xizmeta wan de be. Lê ez wek hunermendekî kurd nikarim xwe bi rêxistineke siyasî ve girê bidim. Tê bîra min, wextê ez hatim Almanyayê, ez xort bûm, pora min dirêj bû, pantorê jeans li min bû, hatin ji min re gotin, "welle nabe tu pantorê jeans li xwe bikî". Kuro min got, here îşekî xwe yî din bike, te fêm kir.! Ev pantorê min e, ez ji pantorê xwe hez dikim. Here bêje birayekî xwe, xwîşkeke xwe, bê halo nekin". Dixwestin tesîr li ser jîyana yekî bikin, di wir de şaşîyê dikin. Loma min meyizand, hîn di wê demê de min got, ev partî û organîzasyonên kurdan êdî dûr dûr. Min êdî huner ji xwe re kir armanc. Û bi tena xwe, bê alîkarîya kesekî, wellehî billehî carinan jê wextê ez vedigerime paş, ez dibêm evqas stran çawa çêbûn, evqas kasêt û bi tena xwe min kir. Ez dibêm spas bo xweda bo wilo çêbû.

Di cîhana hunerî ya Tirkîyeyê de gelek hunermendên kurd hene, lê berhemên xwe bi tirkî didin. Li ser van kesan dixwazî tiştekî bêjî?

Niha însan serbest e, çi dike dike. Li vir bi rastî ez nikarim ji kesekî re bêjim halo halo bike. Lê hunera te çi be, tu ew î. Wextê ku te bi tirkî stira, an bi erebî stira, tu ereb î û tirk î. Ez halo li meselê dimêyzînim. Têrê nake tu bêjî welle eslê min halo ye. Hunera te diyar dike tu kî yî û tu çî yî. Ew qerar di destê wan de ye. Ez dixwazim bibine kurd, ne ereb, yan faris. Helbet berpirsîyarîyeke wan a li hember gelê wan heye. Lê bi sedî sed ez weke însan, nikarim ji kesekî re bêjim, welle divê tu bi tirkî bistirê, bi kurdî bistirê, yan jî bi erebî,

* Rojnamevan

ÇAND Û HUNER

Matmayînên Ronyayê: Lal Laleş

KEJO BAJAR



Di pirtûka ***Matmayinên Ronyayê*** de Lal Laleş bi helbestê di nav mijê de li bêhna şemamokan digere. Di vê rêwîtîya nav mijê de helbestkar tê li ser "Bîra Helbestkar" disekine. Di pirtûka navê wê "Romana Helbestkar" a **Murathan Mungan** de beşek li ser "Bîra helbestkar" e. Di axir zemanan de yên helbestan dinivîsin, diçin ser "Bîra Helbestkar", daqulî bîrê dibin û ji bîrê re helbestên xwe dixwînin. Ev bîra ku kevirên dora devê wê bi kilsê spîkirî, bersivê dide helbestkaran. Helbestkarên ku dengê xwe zevt kiribe, bîr olana dengê wan li wan vedigerîne û bî wî awayî fahm dikin ku helbestên xwe ji dil dinivîsin û dengê di helbestê de bi kar tînin, dengê nav dilê wan e. Helbestkarên ku olana dengê wan li wan venagere jî, fahm dikin ku bi dengê hundirê xwe nanivîsin û helbestên wan jî qelp in. Bi gotineke din ew helbest dengketî ne. ***Matmayînên Ronyayê*** jî bi heman şêwazê devê xwe dixe devê bîrê û helbestên xwe diqîre. Ev deng jê derdikevin.

"*Li bin dara gûzê bîr nayê kolan,*
Jixwe çalê eşqê ne siya wan
Li siye daqulî neyên,
Hûn ê bibînin sûrete xwe û sûretê yên dera han."

Lê herwext wê helbest hemû ji bîrê derneyên. Ji ber ku bîr ristên hibra wan tîr vedigerîne û wê yên bi pênûsa hibra ron hatine nivîsandin, jê bibe. Bîr, karê xwe dike. Hew peyva heqîqî li xwedîyan vedigerîne. Bîr, ristên ku wê sibe du sibe li qahfikan bimîne bi ruh dike:

"*Şûarno; destê xwe li pişta dîrokê xin. Kurdistan di qirika mirinê de maye.*"

Taybetmendîyên ***Matmayinên Ronyayê*** ji alîye kinbûnê ve dişibe rêbaza bêrîka berdilkan. Ev bêrîk, bêrîka **Emily Dickinsonê** ye. Weke tê zanîn **Emily Dickinson** di nav karê rojane de wexta peyv tên bîra wê zû zûka pênûsa xwe derdixîne, wan li ser kaxizên bejnbiçûk qeyd dike û dixe bêrîka berdilka xwe da ku êvaran li malê li ser wan bixebite. Lal Laleş nîşeyên xwe girtine; ew nîşe carna ji bêrîka berdilkan derdikevin û li ser maseya bi qendîl, dibin dil: "*û hey dibuhurîn bi ba re, telebeyên qemer telebeyên biqirar.* " Lê carna jî berdilk ji ristan re mezin tê. Çawa ku zarokekî nû dest bi dibistanê bike û malbata wî jê re berdilkeke nû nekire û rabin berdilka birayê wî yê mezin lêbikin, wisa. Hinek rist weke zarokê ku di qamkirina avê de êdi bi ser avê nakeve û meytê wî çend rojên din li rex çem tê dîtin. Weke van ristan: "*Evîn vîn viyan/ kevan vejan/ Tîrcan can canan.*"

Û matmayîneke din: Lal Laleş gelek xweda û xwedawendên mîtolojîya grekî vexwendîye welatê Kurdistanê. Lê mîtolojî be jî, divê hêzeke xwedayan hebe. Qet nebe divê ristên li bin navên wan nivîsandî, bi qasî ayetan xurt bin da ku em bizanin xweda û xwedawend bi kêrî tiştekî tên. Di van hêzên olîmposî de hêza remzê tuneye. Remzên ku li ser navên hêza wan hatine lêkirin, ji bilî klîşeyên mitolojîyê pê ve ne tiştek in. Ev ristên han dê bêtir mijarê zelaltir bikin. "*Mirov bi dû kulîlkan keve bi tenê dimîne/ Nêrgiz jî carinan dibe sedema mirina mirov*". Di van ristan de çîroka ***Narkîsos*** hatiye dubare kirin û hew. Ne tiştek lê hatiye zêde kirin û ne jî jê hatiye kêm kirin.

Matmayînên Ronyayê silavek e li kanona helbesta kurdî. "*Ji sê riyên deşta bîşengên dûr venegerin.*" Çav li **Kawa Nemir** tê kirin. Di "*Ez ê çi bikim ji Dara Hênê, dargula şilanê*" de xatir ji **Arjen Arî** tê xwestin. Û "*Rêhevalên cewrikê cêwî*" ho vedanek e li Janyayê.

Ceyrana xwe bitemirînin û şevçiraxa xwe pêxînin. Ji ber ku Matmayînên Ronyayê bi têra xwe ronkayê li dora xwe belav dike.

Navê pirtûkê: Matmayînên Ronyayê
Helbestkar: Lal LALEŞ
Weşanxane: Lîs
Buha: 8 TL
ISBN: 978-605-4497-19-5

Jineke Xinanî: Çîroka "zilamê biçûk"

ŞENGUL OGUR *

Freûd li ser mît û efsaneyên neteweyan wiha dibêje: "*Gelek pêkan e ku efsaneyên hemû neteweyan bermahîyên berovajîkirî ên xewneroşkên daxwazên wan bin, xewneroşkên dinyayî ên mirovahîya ciwan bin*".

Belê, ji mît û efsaneyên neteweyan mirov dikare xwe bigihîne daxwaz û tirsên herî kûr ên wan neteweyan; mirov dikare di derbarê paradîgmaya wan neteweyan de xwe bigihîne agahîyên berfireh.

Ango efsane kodên gîyanî ên neteweyan; DNAyên wan in. Her çiqasî Adorno bi avakirina pireke domdar a di navbera serdema efsaneyî û modern, şopên efsaneyê di serdema modern de bigere û bibîne jî, serdema efsaneyan qediya. Lê efsane; xwevegotina daxwaz û xewnroşkên takekes û neteweyan, bi formeke guherî, di wêjeya ewropî de bi zimanê "*langues romanes*" pêşî di "*romans*" û piştre bi guherteya romansê di "*roman*"ê de berdewam dike.

Ji hêla teşe û naveroka xwe ve vegotin herçiqasî guherîbe jî, heman çespandina Freûd a li ser mît û efsaneyên neteweyan bi rehetî em dikarin nêzîkatîyê li romanê jî bikin.

Roman jî ji hêla teşe û naveroka xwe ve pala xwe dide bingehên sosyo-polîtîk û îdeolojîya wê neteweyê. Hişmendîya modern berhemên edebî ku bi tenê wekî hilberîneke "tikûtenê" û "yekane" vedibêje û bi vêya re jî hewl dide ku têkilîyên wê ji bingehên civakî, îdeolojîk qut bike jî, di berhemên edebî de em tirs û daxwazên civakî jî dibînin.

Ango her berhemeke edebî di xwe de îdeolojîya afirînerê/a berhemê vedihewîne û ev îdeolojî herwiha îdeolojîya beşek ji wê civakê ye jî.

Di nav vê çarçoweyê de heke em li berhema bi navê ***Jineke Xinanî*** ya **Şêrzad Hesen** binerin, di temsîlîyeta karekterê bi navê Memo; Kalemêrê Qesab de em ê daxwaz û xewneroşk û tirsa beşek ji civakê jî bibînin. Ango di kareketerê Kalemêrê Qesab de em ê îdeolojî û tevgerên mirovên bindest ku rêya rizgarîyê; rêya "xwe-pêkanîn"ê tenê di ji-xwe-dûrketinê de, di ji hezkirina kesên dijî xwe de dibînin, rast werin.

Jineke Xinanî ku li ser maseya vexwarina bîrayê, li ser vegotina serbûrên Qesabê Kalemêr ava bûye, herwiha serbûra "zilamê biçûk" ê ku xwe-pêkanîna xwe a netewî, etîkî û evînî di karekterekî dijberê xwe ya bi navê Leylayê de dibîne û bi hezkirina ji Leylaya ereb, Leylaya bijîşk, Qesabê Kalemêr bi awayekî derhişî dixwaze xwe ji kurdbûn û qesabbûna xwe rizgar bike û bi vî awayî jî xwe pêk bîne.

Em dikarin bibêjin ku jîyana Qesabê Kalemêr di navbera berîya Leyla û piştî Leylayê de dibe du beş. Qesabê berîya Leylaya ereb û bijîşk û yê piştî Leylayê ne heman kes e. Bi rasthatina Leylayê re êdî Qesab dikeve metamorfozeke kesayetîyê. Berîya Leylayê nêrîna wî ya li ser jinan (jinên kurd) bi tenê di nav çarçoveya objeyeke zayendî de ye. Qesabê ku ji ber pîşeya xwe tim bi goşt dide û distîne, jinan wekî "goşt" bi nav dike; jinan dişîbîne gelek cure heywanan, bêhna wan jî dişibîne bêhna heywanan. Bi dehan jinan re dikeve têkilîyê. Lê dilê Qesab nakeve yekê ji van jî. Dema xwe bi wan re derbas dike û hew.

Lê dema ku rastî Leylaya ereb, bijîşk tê, Qesabê Kalemêr bi carekê re diguhere; dibe kubar, dibe hestiyar, dibe aşiq.

Qesab, Leylaya ereb, bijîşk naşibîne heywanan, bêhna wê jî naşibîne bêhna heywanan û wê weke "goşt" nabîne:

"Sibehê ji nişka ve jineke bi heybet û xweşik hate ber dikana min. Xanimeke modern bû, pirça xwe ya belav û perîşan berdabû ser milê xwe."

Belê, Leylaya ereb, "xanimeke modern" e û Qesab dikare di hezkirina vê "xanima modern" de xwe ji qesabtîyê rizgar bike.

Jina ku Qesab tim li bendê ye ne bi tenê Leylaya bijîşk e, lê herwiha Leylaya ereb e (ne kurd). Ew encax di jineke ne kurd, (ereb) de dikare xwe pêk bîne. Tim li benda yeka wilo ye. Dema ku behsa wê dema ku nû pêrgî Leylaya ereb bûyî, dike, Qesabê Kalêmer wiha dibêje: *"Te digot sed sal in bendewarê xanimeke wisa giran û nazdar im"*.

Piştre ji berdilka xwe, ji bêhna xwe şerm dike. Ji bo ku Leylayê bibîne, diçe ba Leylayê û bi derewan dibêje diranên min diêşe û diranê xwe jî li ser hezkirina xwe dike.

Lê Leyla zewicî ye. Dema ku Qesab vê yekê dizane, xeyalşikestî dibe û Qesabê Kalemêrê ku bi gihiştina Leylaya ereb û bijişîk re, xwe ji kurdbûn û qesabtîyê rizgar bike, ango xwe pêk bîne, xwe pêk nayîne û bi wê xemê di jîyanê de têk diçe.

Bi kurtebirî ***Jineke Xinanî*** di ambalaja "evîneke pak" de çîroka "zilamê biçûk" ê têkçûyî ye.

* Wêjevan, nivîskar

Jînenîgarîya Cegerxwîn û berhemên wî

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Yusuf Kaynak berîya ku Yekitîya Sovyetê hilweşe, berîya1991ê, li Beşa Zimanên Rojhilatê Navîn a Fakulteya Edebiyatê ya Zanîngeha Leidena Hollandayê şagird e û li ser "Wêjeya Kurdî ya li Tirkîye û Sûrîyeyê” tezekê amade dike. Ji bo vê yekê jî helbestvanê mezin yê kurdan ji xwe re dike mijara tezê: Cegerxwîn.

Kaynak orîjînala teza xwe bi hollandî amade kiriye û pêşkêşî zanîngehê kiriye. Piştî ku fikra wergerandina tezê lê peyda dibe, radibe bo kurdî werdigerîne. Teza bo kurdî hatiye wergerandin, di sala 1994ê de bi awayekî berfirehkirî amade dibe. Nivîskar di pêşgotina ku di gelawêja 1994ê nivîsandiye de, berhema di destê xwe de yadî Cegerxwîn dike û dibêje: *"Jîyana Cegerxwîn ji bo tevgera gelê kurd, di sedsala me de belgeyeke jîndar e. Ji ber vê belgenebûnê min pêwîstî pê dît ku ez teza xwe ji bo xwendevanên kurd bikim kurdî. Jixwe îsal 10 salîya wefatkirina mamoste Cegerxwîn e. Vê pirtûkê yadî mamoste dikim”.*

Li gor nivîskar di wergera ku kiriye de, ji hêla termînolojîyê ve rastî gelek dijwarîyan hatiye, lê wî piranîya caran têgeh wernegerandine û orijînala wan di nav kevanekê de nîşan daye. Paşê di dema xebatê de, behsa dijwarîyeke din dike: *"Wexta min ev kar dikir, pêdivîya min bi materyalan hebû. Lê mixabin materyalên li ser Cegerxwîn hem kêm bûn, hem jî ji zanistîyê dûr bûn. Tevahîya wan çend pirtûkên wekî broşur û çend nivîsarên kurt ên klîşe û sloganî bûn. Ev jî kêmasîyek e ji bo helbestvanekî ku hewqas jê tê hez kirin. Çend gotarên li ser wî jî, bi navên mexles hatibûn nivîsandin. Heke mirov li van navan bigere, mirov tu kesî bi navê wan ên rast nabîne. Ev yek ji bo lêkolîneran asteng e”.*

Kaynak wan navên mexles jî di pirtûkê de dide: Rohat, Hawar, Gundî, Kurdox, Ferhat Can.

Teza li ser Cegerxwîn, piştî amadekirin û wergerandina bo kurdî bi 20 salan, li Stenbolê ji hêla ***Weşanxaneya Do***yê ve bi navê ***Jînenîgarîya Cegerxwîn û Berhemên Wî*** hate çap kirin. Nivîskar di axaftineke xwe de sedema vê derengmayînê rave dike û di serî de xwe, paşê jî berpirsên dezgehên kurd û rewşenbîrên wan rexne dike.

Yusuf Kaynak di berhema xwe de behsa 16 berhemên Cegerxwîn ên ku hatine weşandin dike. *Cim û Gulperî* û *Reşoyê Darê* ji wan berheman dudu ne ku her du jî ji 44 rûpelan pêkhatî ne û li Şamê hatine weşandin. Ya yekem di sala 1947ê de, ya duyem di sala 1956ê de hatiye çap kirin. **Kaynak** navê 23 berhemên Cegerxwîn dane ku heta niha nehatine weşandin.

Yusuf Kaynak helbestên Cegerxwîn li gor naverokê di bin şeş beşan de dabeş dike: Helbestên welatevînî û azadîyê, helbestên li dijî feodalî û kapîtalîzmê, helbestên şoreşgerî û navneteweyî, helbestên fabl û mîtolojîk, helbestên evîna sembolîk û evîna rastî û helbestên felsefî. Di parvekirina van temayan de, nivîskar hin beş ji dîwanên seyda rapêşî dêhn û bala me kirine. Wî li hin deveran helbest bi tevahî, li hin deveran jî beşek ji helbestê daye da ku şiroveya xwe bibe serî, lewre jî rave dike ku hewce nedîtiye tevahîya helbestan di kitêba xwe de biweşîne.

Kaynak di berhema xwe de her wiha Cegerxwîn, Nazim Hîkmet û Ebdulla Goran dide ber hev, analîza şêwaza wan dike. Nivîskar sedema hevrûkirina van her sê helbestvanan wiha şirove dike: *"Mebesta hevrûkirina Cegerxwîn, Nazim û Goran cudahîya jîyan, mercên ku tê de jîyane û di wan çax û deman de afirandina berhemên wan bixwe ye. Min ev tişt ji bo xwendevanên kurd û tirk li ber çavan raxistin”.*

Şayanê gotinê ye ku di berhema lêkolînî de, ji Celadet Bedirxan bigire heta Ordîxanê Celîl, ji Qanatê Kurdo bigire heta Hisênê Emîn, Ji Seydayê Keleş bigire heta Rojen Barnas bi dehan navan li ser berhem, gelperwerî û jîyana Seydayê Cegerxwîn bîr û boçûnên xwe anîne ziman. Yek ji wan Celadet Bedirxan e û di nivîsareke xwe de wiha dibêje: *"Cegerxwîn doktorê civaka kurd e ku tev nexweşîyên gel dinase û bê tirs û xof li dijî axa, mîr, beg û şêxan têdikoşe. Lewre ji xwe re dijminên xurt û dijwar peyda dikir. Lê seyda bê perwa şûrê xwe di ser serê wan re vedikişand û eşkere digote wan: ‘Ezê serê we bi vî şûrî jê bikim’ ”.*

Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî, Yusuf Kaynak, Weşanên Do, Lêkolîn, 199 Rûpel

Newroz bangewazîya welatekî azad e!

Newroz Pîroz Be!

HASAN HÜSEYIN DEVECI: **Newroz**, dijîtal û teknîka tevlîhev, 75 x 90 cm

Ji bo ku

HELEBÇE

û

'ENFAL'

neyên ji bîr kirin û tawanên li dij mirovahîyê neyên dubare kirin



divê mafên kurdan bên ewle kirin û parastin

SERHAD BAPÎR: **Helebçe**, grafîka li ser linoleum, 16 x 20,5 cm

NAVEROK

ADAR 2012

Helwêsta kurdan û şoreşgerîya li Sûrîyeyê
PROF. DR. FERHAD ÎBRAHÎM
▶ R. 1

Pirsa kurdî û raperîna sîvîl
VAHAP COŞKUN
▶ R. 1

Cezanebirîna li Suûdîyê
SERGE HALIMI
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Pîşesazî, bingeha hêzê
LAURENT CARROUÉ
▶ R. 6

Heyranîya nûbicîhbûnan ji ber çi ye?
GÉRARD DUMÉNIL Û DOMINIQUE LÉVY
▶ R. 8

Statuyek ji bo heywanan
PABLO JENSEN
▶ R. 9

Piştî Fukuşîmayê
CHRISTINE BERGÉ
▶ R. 9

Aborîzanên bi pereyan tên girtin dibin armanca êrişan
RENAUD LAMBERT
▶ R. 10

Êrişa bêperwa ya li ser Kurdistanê
KENDAL NEZAN
▶ R. 12

Di navbera Iraq û Îranê de heştsed hezar rehîne
ROLAND-PIERRE PARINGAUX
▶ R. 13

Balkan û dawîya xeyala ewropî
JEAN-ARNAULT DÉRENS
▶ R. 14

Piştî şerê navxweyî, ji nû ve sazkirina pergaleke siyasî
PHILIPPE DESCAMPS
▶ R. 16

Pentagon berê xwe dide Pasîfîkê
MICHAEL KLARE
▶ R. 18

Romana polîsî ya çînî û Mao û Tao
MICHEL IMBERT
▶ R. 19

Stratejîyeke têkçûyî li dij Îranê
GARY SICK
▶ R. 20

Peyvên Pasternak û bêdengîya Stalîn
DOMINIQUE AUTRAND
▶ R. 21

Vebîner û Fatîh
MAURICE LEMOIN
▶ R. 21

"Piştî vî temenî ez nabim koleyê kesekî"
YADO CIWAN
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

Forma Abonetîyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetîya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB